



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê  
Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê  
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Lîsansa Bilind

## HELBESTVANÊN JIN DI EDEBIYATA YARSANAN DE

Sevda ORAK REŞİTOĞLU  
13711014

Şêwirmend  
Alk. Doç. Shahab VALI

Mêrdîn 2016



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê  
Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê  
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Lîsansa Bilind

**HELBESTVANÊN JIN DI EDEBIYATA YARSANAN DE**

Sevda ORAK REŞİTOĞLU  
13711014

Şêwirmend  
Alk. Doç. Shahab VALI

Mêrdîn 2016

## TAAHHÜTNAME

### TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Helbestvanên Jin Di Edebiyata Yarsanan De” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

03/06/2016

Sevda ORAK REŞİTOĞLU

**JI BO RÊVEBERIYA ENSTITÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI  
TIRKIYEYÊ**

Ev xebat ji aliyê juriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çandê de wekî  
Teza Lîsansa Bilind hatiye pejirandin.

(îmze)

Serok:.....

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)

Endam:.....

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)

Endam:.....

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)

Endam:.....

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku îmzeyên jorîn ên endamên hîdekariyê yên navborî ne.

Îmze

Yrd. Doc. Mustafa Aslan

Wekîlê Rêveber Enstitûyê

(Mor)

## NAVEROK

PÊŞGOTIN .....	III
KURTE.....	V
ÖZET.....	VI
ABSTRACT .....	VII
KURTEBÊJE.....	VIII
DESTPÊK .....	IX

## BEŞA YEKEM

### YARSAN Ê BÎR Ê BAWERIYA YARSANAN

1.1. YARSAN KÎ NE? .....	1
1.2. BÎR Ê BAWERİYÊN YARSANAN .....	3
1.2.1. Cewherê Îlahî .....	4
1.2.2. Dûnadûn (Reenkarnasyon).....	5
1.2.3. Tecellî (Teofanî).....	7
1.2.3.1. Behlûl .....	9
1.2.3.2. Şah Fezl Velî .....	11
1.2.3.3. Baba Serhengê Dewdanî .....	12
1.2.3.4. Şah Xoşîn .....	13
1.2.3.5. Baba Nawis .....	13
1.2.3.6. Sultan Sehak .....	13
1.2.4. Ferîštenasî.....	15
1.2.4.1. Pîr Binyamîn .....	18
1.2.4.2. Dawud Dewdanî .....	18
1.2.4.3. Pîr Mûsî .....	19

1.2.4.4. Mistefa Dawudan .....	19
1.2.4.5. Xatûn Dayrak (Xatûn Remzbar).....	19
1.2.4.6. Baba Yadîgar .....	19
1.3. EDEBIYATA PÎROZ A YARSANAN .....	20
1.3.1. Serdemên Edebiyata Yarsanî.....	23
1.4. LI CEM YARSANAN GIRÎNGIYA MUZÎKÊ Û TENBÛRVANÊN JIN ..	25

## **BEŞA DUYEM**

### **HELBESTVANÊN JIN ÊN YARSANÎ**

2.1. STATUYA JINÊN YARSANÎ .....	29
2.2. JINÊN YARSAN ÊN XWEDÎ KELAM .....	39
2.2.1. Dayê Tebrîzê Hewramî .....	39
2.2.2. Celale Xatûn Loristanî (Mama Celale) .....	41
2.2.3. Reyhan Xanim Loristanî .....	48
2.2.4. Fatime Loreyê Goran.....	50
2.2.5. Liza Xanim Caf .....	52
2.2.6. Xatûn Meyzerd .....	54
2.2.7. Dayê Xezan Sergetî .....	55
2.2.8. Xatûn Dayrak (Remzbar an jî Rezbar).....	58
2.2.8.1. Kelamên Yarsanî yên li ser Remzbar û Girîngiya Wê.....	88
2.2.9. Pîr Nazdar Xatûnê Şîrazî.....	105
2.2.10. Nêrgiz Xanim Şahrizûrî.....	106
2.2.11. Xatûn Zer Banû Derziyanî .....	116
2.2.12. Semen Xanimê Dewdanî .....	117
<b>ENCAM.....</b>	<b>119</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>121</b>

## PÊŞGOTIN

Edebiyata yarsanan xwedî cihekî pir girîng e di nav edebiyata kurdî de. Girîngiya wê ji ber vê ye ku hem pir kevn e, hem pir dewlemend e hem jî ji aliyê baweriyê ve pir kûr e. Bingeha edebiyata yarsanan edebiyata devkî ye. Helbestên yarsanan ku wek "kelam" têne binavkirin, ji gotinên pîroz pêk hatine. Lewra bawerî mijara herî girîng e di kelaman de. Kesên ku kelam gotine bê guman bawerîya xwe, hezkirina xwe ya dîne yarsan, girêdana xwe ya li hemberî Sultan Sehak anîne zimên.

Her çiqas edebiyata yarsanan ew qas kûr û dewlemend jî be, heta niha xebateke zêde li ser nehatiye kirin mixabin, qedr û qîmeta ku heq dike nedîtiye. Yek ji sedemên vê ev e ku yarsan di nav xwe de, xwedî çandê veşartî ne. Kesên ku mensûbî vê çandê ne, nexwestine çanda wan li derve belav bibe. Ev jî ji ber vê sedemê pêk tê ku tirseke wan a mezin hebûye li hemberî kesên ku ne yarsan in, yanî em dikarin bêjin ku li hemberî misilmanan. Yarsan û misilmanan li hev nedikir, ji ber ku yarsan ne misilman bûn, bi çavê kafîran li wan dihat nêrîn. Ji ber van sedeman, ev çand di nav xwe de veşartî maye heta ku oryantalistên curbicur ên wek Comte de Gobineau û Vladimir Minorsky hatine û bi wan hesiyane. Comte de Gobineau yarsan li derve wek Ehl-î Heqq dane nasîn. Ji xeynê van oryantalistan, van salên dawî nivîskarên wek Mohammed Mokri, Martin van Bruinessen, M. Reza Hamzeh'ee û Shahab Vali derketine ku li ser çand, bawerî, jiyana civakî û doktrînen yarsanan xebitîne. Dikare bê gotin ku di nav van nivîskaran de kesên ku li ser kelamên yarsanan xebitîne Mohammed Mokri û Shahab Vali ne. Her wiha Hamzeh'ee jî bi awayekî berfireh li ser sosyolojiya yarsanan xebitiye. Lê belê li ser jinên yarsan ên xwedî kelam, heta niha, xebateke serbixwe nehatiye kirin. Heta, di nav lêkolînên kurdî de jî xebatek li ser yarsanan nehatiye kirin û ev hem kêmasiyeke pir mezin e hem jî qadeke girîng e ku vala maye. Ji ber van sedeman, me xwest ku em bi vê xebata xwe ya ku bi gelemperî li ser jiyana bawerîya yarsanan e û bi taybetî jî li ser jinên yarsan ên xwediyê kelaman in, rêyekê li ber vê qadê vekin û gavek jî be ber bi wê riyê ve bimeşin. Her wiha yek ji armancên me yê sereke jî ew bû ku em beşeke edebiyata yarsanan bi kurdên ku tîpên erebî nizanin bidin nasîn. Helbet ev ji bo me jî zehmet bû, lewre kelamên yarsanan bi piranî destxet in û çap nebûne. Me jî hewl da

ku em têkevin nav van destxetan û kelimên ku bi tîpên erebî hatine nivîsîn hem latînzê bikin hem jî kurmanciya wan binivîsin.

Di vê xebatê de rola şewirmendê min Shahab Vali pir mezin e. Hem ez teşwîqî vê xebatê kirim hem jî pirsên min ên bêdawî, bi sebr bersivandin ku min bersiva wan pirsan di çavkaniyên xwe de jî nedidîtin. Her wiha bê rawestan nîşandana wî ya rê û rêbazan, peydakirina çavkaniyan, xwendina kelaman û sohbetên wî yê li ser vê çanda nû ku ez ketimê her carê heyecanek nû bi min re çêkir. Ji ber keda wî ya bê hempa spasdar im. Dost û hevjinê min Hamdullah Reşitoğlu ku di her asta tezê de piştgirî da min, di bêhtengiyên min de çi jê hat teksîr nekir bo derûniya min û bû şîrîkê stresa min, spasdarî wî me. Spasiya hevala xwe Özlem Salmış dikim ku her daîm ji aliyê moraldayînê ve li cem min bû. Bi muzîkên xwe, xwişka min Zozan Orak hestên min germ û nerm dikir, dîsa ji bo wê spasdar im. Ji bo xwendina dawî û sererastkirina ji aliyê hevoksaziyê ve spasiya hevalê xwe Kenan Örmek dikim.

Sevda ORAK REŞİTOĞLU

Mêrdîn 2016



## KURTE

Kurdên yarsan xwedî edebiyateke pir kûr û berfireh in û ev edebiyat parçeyeke girîng a edebiyata kurdî ye. Lê ji ber çanda xwe ya veşartî di nav kurdan de pir nayê zanîn, ji ber vê, xebatên berfireh li ser nehatine kirin. Edebiyata pîroz a yarsanan di destpêkê de devkî bûye û wek kelimango gotinên pîroz hatine gotin. Di van kelaman de mijarên wek bawerî, yanî tecellî, dînadûn, ayîn, hwd. û jiyana civakî wek hêma cih girtine. Ev kelimango bi piranî nehatine çapkirin, ji ber ku wek me li jor got yarsan xwedî çandê veşartî ne û naxwazin çand û baweriyaya wan li derve bê zanîn. Ev yek heta sedsala 15mîn wiha berdewam kiriye û li gorî yarsanan, di sedsala 15mîn de, di serdema Sultan Şehak de ev kelimango ji aliyê Pîr Mûsî ve di *defterê* de hatine tomarkirin.

Di edebiyata yarsanan de yê ku xwediyê kelimango in ne tenê mêr in. Jin jî xwedî cihê girîng in. Ev girîngî, wan jî jinên çandên din ên wek misilman vediqetîne. Ev taybetiya jinên yarsan jî baweriyaya wan pêk tê. Li gorî bawerî û kevneşopiyaya yarsanan her zindî piştî mirina xwe serdemeke din di bedena kesekî din de careke din tê dinyayê. Di vê baweriyê de zayend ne girîng e, lewre kesa/ê ku dimire wexta carek din tê dinyayê dikare bi zayendeke din bê. Ji ber vê jî jinên ku xwedî kelimango in wek zayend dibin ku di jiyana xwe ya berê de wek mêr hatibin dinyayê. Wexta ku em bi vî çavî lê dinêrin em dibînin ku tu girîngiya zayendê tune ye li ba yarsanan, yanî jin û mêr wekhev hatine dîtin û jinan bi kelimango xwe dengê din li edebiyata yarsanan zêde kirine, her wiha bi vî awayî ev edebiyat dewlemendtir bûye.

**Bêjeyên sereke:** yarsan, edebiyata pîroz, jin, kelimango, Sultan Şehak

## ÖZET

Yarsan Kürtleri köklü ve geniş bir edebiyata sahiptirler ve bu edebiyat Kürt edebiyatının önemli bir parçasıdır. Fakat gizli kültürlerinden dolayı, Yarsan edebiyatı Kürtler arasında fazla bilinmemektedir ve bu yüzden üzerine çok fazla çalışma yapılmamıştır. Kutsal Yarsan edebiyatı sözlü olarak başlamıştır ve *kelam* yani kutsal sözler olarak söylenmiştir. Bu *kelamlarda* sosyal hayat ve inanç, yani tecelli, *dûnadûn* (reenkarnasyon), ayin gibi temalar ağırlıklı olarak yer almıştır. Bu *kelamlar* çoğunlukla basılmamıştır, çünkü yukarıda da bahsettiğimiz gibi, Yarsanlar gizli bir kültüre sahiptirler, bu nedenle kültür ve inançlarının dışarıda yayılmasını istememişlerdir. Bu sebeple Yarsan edebiyatı uzun bir süre sözlü olarak kullanılmıştır. Fakat Yarsanlara göre, 15. yy.da Sultan Sehak döneminde bu *kelamlar* Pîr Mûsî tarafından *defter* diye adlandırılan bir kitapçıkta kaydedilmiştir.

Yarsan edebiyatında bu *kelamları* söyleyen sadece erkekler değildir, kadınlar da bu edebiyatın oluşumunda önemli bir rol oynamaktadır. Bu, bize Yarsan kadınlarının Müslüman kültüründeki kadınlardan farklı olduğunu gösteriyor. Kadınların bu konumu Yarsanların sahip olduğu inançtan kaynaklanmaktadır. Yarsanların inanç ve geleneklerine göre, her canlı ölümden sonra başka bir dönemde, bir başkasının bedeninde tekrar doğmaktadır. Bu inança göre cinsiyetin bir önemi yoktur, çünkü ölen kişi başka bir bedende tekrar dirildiğinde, karşı cinsiyette doğabilir. Bu nedenle, *kelam* söyleyen kadınlar önceki hayatlarında erkek olarak yaşamış olabilirler. Bu reenkarnasyon durumundan kaynaklı Yarsan geleneklerinde kadın ve erkek eşit görülmektedir.

**Anahtar kelimeler:** yarsan, kutsal edebiyat, kadın, kelam, Sultan Sehak

## ABSTRACT

Yarsan Kurds have a rich literature that constitutes an important part of the Kurdish literature. Due to concealment for outsiders it has not been exposed to any serious investigation. The Yarsan sacred literature has been orally transmitted through religious *kalām* (divine discourse) from generation to generation. Alongside narratives on social life, the *kalām* collections also contain religious beliefs such as *tajalli* (divine self-manifestation) and *dunadun* (karma). The secretive nature of the Yarsan belief constitutes a major obstacle why the religious manifestations of Yarsanis haven't been published. It was not until the era of Sultan Sehak when the Yarsan *kalām* was transferred to the written form by Pir Musi in his famous *Defter* or book.

The narrators of Yarsan literature body were not only male; female narrators had an important position in transmitting the Yarsan *kalām*. Women's active role in Yarsan *kalām* narration originates from the belief in *dunadun*; every individual will resurrect in another body; next time maybe a female could resurrect in the shape of a male or vice-versa. Thus, in comparison with neighbouring societies, the Yarsan women have had an eminent position, particularly within its religious community. Consequently, the Yarsan literature has been enriched by a gender-perspective, unprecedented in the regions. This investigation is an attempt to shed light on the women's role in Yarsan sacred literature.

**Keywords:** yarsan, sacred literature, woman, *kalām*, *dunadun*, Sultan Sehak

## KURTEBÊJE

<i>amd.</i>	amadekar
<i>bnr.</i>	binêrin
<i>D.G.H.</i>	Dîwana Gewre, Huseynî
<i>D.N.Y.</i>	Danişmeyê Namaveranê Yarsan
<i>D.P.E.</i>	Defterî Perdîwerî, nusxeya xetî ya 'Elîmîr Derwîşî
<i>h.b.</i>	heman berhem
<i>hwd.</i>	her wekî din
<i>P.Z.</i>	piştî zayînê
<i>S.T.</i>	Serencam, Beyan el-Heq, nusxeya xetî ya Qadir Tehmasêbî
<i>r.</i>	rûpel
<i>vgz.</i>	veguhêzer

## DESTPÊK

Yarsan yek ji dînen kêmar ên kurdan e ku bi piranî li rojhilatê Kurdistanê belav bûye. Li gorî kategoriya dînan mirov dikare bêje ku ev dînek serbixwe ye. Ji peyva “serbixwe” qesta me ew e ku her çiqas wek gel nêzî misilmanan jiyabin jî çand û baweriya wan ji ya Îslamê pir cuda ye. Yarsanî hem dîne xwe hem jî çanda xwe bi awayekî veşartî jiyane da ku li derve belav nebe. Weku ji kelaman ango ji gotinên pîroz jî diyar dibe, yarsan xwedî dîrok û çandeke pir kevn in, lê belê li ser çand û dîroka wan agahiyeke zelal tune, lewre yarsan kelmên xwe heta serdema Sultan Sehak qeyd nekirine. Li gorî yarsanan di serdema Sultan Sehak de yarsanî şikla xwe ya herî dawî girtiye, kelm û gotinên wan ji aliyê Pîr Mûsiyê nivîsevanê Sultan ve hatine tomarkirin.

Di hin çavkaniyan de dikare bê dîtin ku yarsan wek “cemaat” hatine pênasekirin, lê belê ji bo ku wek cemaat bêne pênasekirin, divê yarsan aîde dînekî bin. Heke em wek bawerî li cudahiyan yarsan û dînen din binêrin, em dikarin bêjin ku yarsanî ne binbeşeke dînekî ye. Wekî mînak, baweriyên wek "nubuwet" û "me'ad" ên ku bingeha îslamê pêk tînin di baweriya yarsanan de tune, ev jî nîşan dide ku yarsanî ne baweriyeke îslamî ye. Ji ber vê rewşê, wexta ku em behsa yarsanan dikin, em ê têgeha cemaatê bi kar neyînin, şûna vê em ê “dîne yarsan” bi kar bînin.

Kurdên yarsan bi çend navan tene nasîn, wekî mînak yarsan di nav xwe de xwe wek “yarsan”, "taîfe" an jî "sersiporde" bi nav dikin, li başûrê Kurdistanê wek “Kakeyî” tene nasîn û bi rêya oryantalist Comte de Gobineau jî li derve wek “Ehl-i Heqq” hatine nasîn. Ji ber vê di çavkaniyên biyaniyan de em dikarin têgeha Ehl-i Heqq bêtir bibînin.

Heke em wek erdnîgarî pênaseya bicihbûna yarsanan bidin, em dikarin bêjin ku bêtir li herêmen Îranê yên wek Kermansah, Îlam û Loristanê jiyane, ji xeynê Îranê li Iraqê li bajarên Kerkuk, Xaneqîn û Silêmanî jiyane. Piraniya yarsanan kurd in lê belê yên azerî jî hene.

Armanca vê xebatê nasandina helbestvanên jin ên yarsanan e, ji bo ku kelmên van jinên yarsanî bêtir bêne famkirin em ê di beşa yekemîn de cih bidin bîr

û baweriya yarsanan. Lewre piraniya kelimên wan bi baweriyê ve girêdayî ne. Ji ber ku armanca me ya sereke ne bîr û baweriya yarsanan e, em ê li ser vê mijarê bi kûrahî nesekinin. Bi taybetî em ê li ser têgehên dînê yarsanî bisekinin da ku em karibin li ser kelaman xwendineke baş bikin.

Dînê yarsanî dînekî serbixwe û sistematîzekirî ye ku li ser bingeha bawerî û bingeha *dûnadûnê*, ango reenkarnasyonê, ava bûye. Li gorî vê baweriyê, her zindî piştî mirina xwe, carek din tê dinyayê. Lê di bedena kesekî/e din de, heywanekê de yan jî wek giyayekî tene dinyayê. Ji ber vê ye ku koçkirina kesekî wek mirin nayê dîtî di çanda yarsanan de. Li şûna mirinê, têgeha "kirasguhertin" tê bikaranîn. Li gorî yarsanan kesekî zindî wexta ku koç dike, kirasê xwe diguherîne, ango em dikarin bêjin ku wek beden dimire lê wek ruh dijî, lewre ew ê piştî, di serdemeke din de an jî di heman serdemê de careke din bê dinyayê. Her çiqas bi vê *kirasguhertinê* ruhê însanekî derbasî bedena însanekî bibe jî, ev tişt di bedena heywanan de jî dikare bê dîtî, ruhê kesê baş di bedena kesekî baştir de xuya dibe dîsa, lê ruhê kesê xirab an dikeve bedena kesekî xirab an jî bedena heywanekê. Ji kelimên yarsanan jî dikare bê dîtî ku di çanda yarsanan de *dûnadûn* an jî *kirasguhertin* xwedî cihêkî pir girîng e.

Baweriyeke din a girîng teofanî an jî *tecellî* ye ji bo yarsanan. Li gorî vê baweriyê, Xwedê û ferîşte dikarin di bedena însanan de xuya bibin û ev yek wek *tecellî* tê binavkirin. Wexta ku Xwedê di bedena kesekî de xuya dibe, tê zanîn ku ew pîroz e, her wiha êdî wek "kes" nayê binavkirin, lewre wek "Xwedê" tê dîtî. Di kevneşopîya yarsanan de Xwedê her serdem bi ferîşteyên xwe re di bedena kesekî pîroz de xuya bûye. Ev *tecellî* di serdema mîtolojîk de bi Şahên Keyanî dest pê kiriye, lê belê di dema ku wek serdema şerîetê tê qebûlkirin de bi 'Elî dest pê kiriye û piştî vê serdemê *tecellî* bi temamî derbasî karakterên kurd bûye. Li gorî baweriya yarsanan, *tecellî* bi Keyumersê padişahê mîtolojîk dest pê kiriye û bi Behlûl, Baba Serheng, Baba Celîl, Şah Xoşîn, Baba Nawis, Sultan û Seyîd Braka berdewam kiriye. Xwedê bi ronahiya xwe di bedena van kesan de xuya bûye, yanî ji ferîşteyên xwe re gotiye ku dê nîşanek hatina Xwedê diyar bike û di her serdemê de Xwedê, bi rêya nîşaneyên xwe, hatina xwe diyar kiriye. Di her serdemê de bi xuyabûna ruhê Xwedê,

kesên cuda wek Xwedê hatine hesibandin. Esas ev kes ji hev ne cuda ne, her yek ji yek cewherê hatiye lê her yek di bedenek din de xuya bûye.

Di kevneşopiya yarsanan de yek ji baweriyên girîng jî *ferîštenasî* ye ku ev yek sîstema perestînê ye, em ê piştî tecelliyê behsa wê bikin. Li gorî kevneşopiya yarsanan şeş ferîşteyên sereke hene û di her serdemê de ev ferîşte xwe nîşan didin. Digel van şeş ferîşteyan, Sultan Sehak wan tamam dike û ev sîstem wek *Heften* tê binavkirin. Weku me li jor behs kir, di her tecelliya Xwedê de ferîşteyên wî jî xuya bûne wek alîkarên wî. Ev ferîşte bi piranî mêr in lê jinên wek Remzbar an Perî Xanim jî di nav *Heften* de hene. Her ferîşte xwedî pêwîrekê ye û ev her yek bi van pêwîrên xwe alîkariya Xwedê dikin. Her şeş ferîşte di serdemekê de xuya nabin, lê belê wexta ku her şeş bi hev re xuya dibin dîrokeke nû ango serdemeke nû dest pê dike. Pîr Binyamîn, Dawud Dodanî, Pîr Mûsî, Mistefa Dawudan, Xatun Dayrak (Remzbar) û Baba Yadîgar ferîşteyên sereke ne.

Em ê di beşa yekem de behsa edebiyata pîroz a yarsanan jî bikin ku di vê edebiyatê de bi piranî hêmayên jiyana civakî, rolên Xwedê û ferîşteyan, bingeha yarsanî û bawerî hene. Edebiyata pîroz a yarsanan ji kelaman pêk tê ku ev kelam gotinên pîroz ên Xwedê, ferîşte û kesên pîroz in. Kelamên yarsanan bi awayekî melodîk hatine gotin û car caran kelam bi tenbûrê re jî hatine gotin. Ev kelamên ku bi tenbûrê re hatine gotin bi taybetî ji bo ku bi tenbûrê bêne gotin hatine. Li ser destpêka vê edebiyatê dîrokek zelal tune ye di çavkaniyan de, lewre demeke dirêj ev kelam nehatine tomarkirin, lê belê li gorî kevneşopiya yarsanan, di serdema Sultan Sehak de bi emrê Sultan ev kelam ji aliyê Pîr Mûsî ve hatine tomarkirin. Pîr Mûsî wek katibê Sultan tê nasîn û kelamên wê serdemê û serdemên çûyî, hemû ji aliyê wî ve hatine qeydkirin ango tomarkirin. Kelamên yarsanan bi piranî bi zaravayê goranî hatine gotin lê belê yên ku bi soranî û farsî hatine gotin jî hene.

Kelamên ku tê de hatine qeydkirin wek *defter* tên binavkirin. Deftereke her serdemê cuda ye û bi navên cuda tên zanîn. Wekî mînak deftera serdema Behlul wek *defter-e dewrey-e Behlûl* tê zanîn û deftera serdema Sultan Sehak jî wek *defter-e Perdîwerî* tê zanîn. "Perdîwer" pira simbolîk e ku mirov pê derbasî dinyaya din dibe. Di heman demê de îro li Hewramana rojhilatê Kurdistanê navê cihekî ye. Girîngiya

van defteran ew e ku gotinên pîroz ên Xwedê, ferîşte, kesên pîroz û pîran tê de hatine tomarkirin.

Her wiha em ê di vê beşê de cih bidin girîngiya muzîkê jî. Li cem yarsanan tenbûr wek amûreke pîroz tê dîtin, ji ber vê di jiyana rojane û dînî de, tenbûr xwedî cihekî pir taybet e. Bi piranî her kesê ku endamê yarsaniyê ye li tenbûrê dide û lê nede jî bi piranî li her malekê cihekî taybet ê tenbûrê heye. Rêzek mezin li ber vê amûrê tê girtin, heta beriya lêxistinê tenbûr tê maçîkirin. Di kevneşopiya yarsanan de pêkanîna îbadetê wek "Cem" tê binavkirin û di her îbadeta *Cemê* de tenbûr tê lêxistin û kelimên tene gotin. Tiştê girîng jî ev e ku tenbûr tenê ji bo îbadetê nayê bikaranîn, di cejn û taziyeyan de jî tê bikaranîn. Yanî em dikarin bêjin ku tenbûr di hemû jiyana civakî ya yarsanan de heye. Li gorî kevneşopiya yarsanan, tenbûr cara ewil ji aliyê ferîşteyên Xwedê ve hatiye lêxistin, piştî cara ewil Şah Xoşîn ev amûra pîroz girtiye destê xwe. Weku yarsan bawer dikin Şah Xoşîn ayîneke mezin li dar xistiye û ji alîgirên xwe kom çêkirine, ku ev kom wek *nehse* *nehse* tene binavkirin. Her komê li amûreke cuda xistiye, lê Şah Xoşîn ji bo xwe û ji bo koma xwe ya nehse tenbûr hilibijartîye û piştî ferîşteyan cara ewil wê rahiştîye tenbûrê. Ji ber vê ev amûr di kevneşopiya yarsanan de wek *Sazê Şah Xoşînî* tê binavkirin.<sup>1</sup>

Di beşa duyemîn de em ê cih bidin statuya jinên yarsan û her wiha bi awayekî kronolojîk jî em ê cih bidin jinên xwedî kelimên. Weku tene zanîn di çanda yarsanan de yê ku xwedî kelimên in ne tenê mên in, jinan jî kelimên gotine û di van kelaman de dîsa behsa jiyana civakî, hezkirina xwe ya li hemberî Sultanê ku tecellîya Xwedê ye û baweriya xwe kirine. Em ê cih bidin dozdeh jinên xwedî kelimên. Ji van jinan bi piranî dê Mama Celale û Xatun Dayrak ango Remzbar cih bigirin. Girîngiya van her du jinan ew e ku ya yekem diya sembolîk a Şah Xoşîn e û ya duyem jî diya sembolîk a Sultan Sehak e. Her du jî bi awayekî bakîre zarokê xwe anîne dinyayê. Di kelimên xwe de behsa ducanîbûna xwe, bekareta xwe, ferîşteyên Xwedê yê serdema xwe û nêrîna civakê ya li hemberî ducanîbûna xwe anîne zimên. Ji xeynî van Remzbar yek ji ferîşteyan e ku ji aliyê Sultan Sehak ve, Heq ji bo wê hatiye dayîn. Her wiha Remzbar xwedî Sîr e, hatina Sultan Sehak wek sirrek jê re hatiye dayîn, ji ber vê di

---

<sup>1</sup> Alînejad, S.K., *Tenbûr Ez Dîrbaz ta Konûn*, Entesarat-e Daneş va Fan, Tehran, 1376/1997, r. 240, vgz. Vali, Shahab, *Les Yârsâns, Aspect Mythologiques-Aspects Doctrinaux*, Editions universitaires européens, Saarbrücken, 2011, r. 45



kelamên xwe de behsa van sirran jî dike. Her wiha di beşa Remzbar de em ê tenê cih nedin kelamên wê bixwe, em ê cih bidin kelamên kesên wek Sultan Sehak, Pîr Binyamîn û Pîr Mûsî jî ku di kelamên xwe de behsa Xatun Dayrak kirine. Li ser her kelamekê em ê şîroveyekê bidin û kelamên goranî em ê bi kurmancî jî bidin, lê belê em ê ji xeynî şîroveyê dest nedin kelamên soranî.



# BEŞA YEKEM

## YARSAN Û BÎR Û BAWERIYA YARSANAN

### 1.1. YARSAN KÎ NE?

Yarsan dînekî serbixwe ye ku bi piranî li rojhilatê Kurdistanê jê tê bawer kirin. Ev dîn li gorî sunnî û şîitîyê ji aliyê kêmtir kesan ve hatiye qebûl kirin. Her çiqas kokên wê bigihîje çanda Îrana beriya îslamê jî, yarsan xwedî sistemeke dînî ya serbixwe ye.<sup>2</sup> Li Îranê wekî dînen kêmar tene hesabandin.<sup>3</sup>

Îro yarsan li rojavayê Îranê li herêmên wek Kermansah, Îlam û Loristanê di nav hev de dijîn. Çend civakên yarsanan li Kurdistanê Iraqê li bajarên Kerkuk, Xaneqîn û Silêmaniyê dijîn. Yarsanên ku li Iraqê dijîn li gorî ku Khanna Omarkhalî diyar kiriye wek Kakeyî tene nasîn.<sup>4</sup> Piraniya yarsanan kurd in. Lê li Azerbaycan û li derên din ên Îranê jî çend civakên yarsanan hene.<sup>5</sup>

Ji bo pênaseya têgeha "yarsan" divê em yek bi yek li têgehên "yar" û "san" binêrin. Têgeha "yar" li cem yarsan û misilmanên mutesewif tê wateya "hezkirî", "sadiq" an jî "heval". Koka vê binavkirinê li cem yarsanan ji kevneşopiyeye devkî tê ku wisa xuya dike aîdê Sultan Sehak e.<sup>6</sup> Her wiha li gorî Hamzeh'ee têgeha "yar" ji farisî û kurdî tê. Peyva "yar" ji bo nîşandana hezkirina Xwedê tê bikaranîn. Rêhevalên Xwedê jî wek "yar" tene binavkirin, bi vî awayî endamên vî dînî bi bikaranîna vî navî xwe wek rêhevalên Xwedê bi nav dikin.<sup>7</sup>

Têgeha "san" wateya Sultan an jî Şah dide: "Sultan Sehak" wekî îlah û di şûna *Xawandegar* (Xwedê) de tê dîtin. Weku Vali nîşan dike Merdux Kurdistanî

<sup>2</sup> Hamzeh'ee, M. Reza, *Yaresan (Ehl-i Hak)*, çev. Ergin Öpengin, Avesta Yayınları, İstanbul, 2008, r. 28

<sup>3</sup> Boyle, K., Sheen, J. (ed), *Freedom of Religion and Belief, A World Report*, Routledge, London, 1997, r. 418

<sup>4</sup> Omarkhalî, Khanna (Haz.), *Kürdistan'da Dini Azınlıklar*, çev. İbrahim Bingöl, Avesta Yayınları, İstanbul, 2014, r. 21

<sup>5</sup> Vali, Shahab, *Les Yârsâns, Aspects Mythologiques- Aspects Doctrinaux*, Editions universitaires européennes, Saarbrücken, 2011, r. 11

<sup>6</sup> Vali, *h.b.*, r. 14

<sup>7</sup> Hamzeh'ee, *h.b.*, rr. 72-73

dibêje ku rêveberên herêma Hewreman wekî San (Sultan) têne binavkirin.<sup>8</sup> Ji ber vê ye ku alîgirên wan wekî yarsan têne dîtin ango wek sadiq û piştevanên Şah.<sup>9</sup>

Ji bo nasîna vî dînî, divê em li ser navê wî bisekinin ku pênaseya wê di çavkaniyan de ji hev cuda hatine dayîn. *Matti Moosa* nîşan dike ku li rojavayê xebatên li ser doktrîn û dîroka dînê yarsan heta *Joseph Arthur* û *Comte de Gobineau* dirêj dibe.<sup>10</sup> Lê li ser navlêkirinê her tim nîqaşek hebûye. Li gorî Hamzeh'ee yarsan navê cemaata<sup>11</sup> Ehl-î Heqq e û navê Ehl-î Heqq cara ewil di sedsala nozdemîn de ji aliyê Comte de Gobineau ve ji bo lêkolînerên ewrûpî hatiye pêşkêşkirin. Ji wê rojê û pê ve ev dîn bi vî navî hatiye naskirin. Endamên vî dînî jî, vî navî di nivîsên xwe de û di têkiliyên xwe yên derve de bi kar tînin. Di nav xwe de jî (bi taybetî yên ku li rojhilatê Kurdistanê dijîn) navê yarsan, an jî bi awayekî kurt, navê "san" bi kar tînin, her wiha navê "Taifeh-ye San", ango "San" jî bi kar tînin.<sup>12</sup> Li gorî Shahab Vali jî, ji bo navlêkirina dînê yarsanî li rojavayê, têgeha ku herî navdar û herî zêde tê bikaranîn Ehl-î Heqq e, ev jî wateya "Mirovên Rastiyê" dide. Her çiqas li rojavayê wek Ehl-î Heqq bêne binavkirin jî, li gorî Vali di edebiyata yarsanan de bes navên wek "yarî" û "yarsanî" têne bikaranîn.<sup>13</sup> Ji ber ku Ehl-î Heqq li derve tê bikaranîn û di edebiyata yarsanan de têgeha *yarsan* tê bikaranîn, em ê di vê xebata xwe de têgeha *yarsan* tercîh bikin.

Li gorî ku Vladimir Minorsky di *The Encyclopaedia of Islam* de diyar kiriye, Ehl-î Heqq wek "Mirovê Xwedê" tê zanîn. Dînekî veşartî ye û li rojavayê Îranê belav bûye. Weku di ansîklopediyê de tê diyarkirin dibe ku bikaranîna *Ehl-î Heqq* bibe sedema şaşfêmkirinê, lewre ji aliyê Hurûfiyan ve jî tê bikaranîn, her wiha ev têgeh

---

<sup>8</sup> Merdux Kurdîstânî, M. *Tarîxê Kurd û Kurdistan*, çapa 3., s. 1., 1351/1973, r. 73, vgz., Vali, Shahab, *h.b.*, r. 14

<sup>9</sup> Vali, *h.b.*, r. 14

<sup>10</sup> Moosa, Matti, *Extremist Shiites, The Ghulat Sects*, Syracuse University Press, New York, 1988, r. 185

<sup>11</sup> Her çiqas Hamzeh'ee ji bo vî dînî têgeha *cemaatê* bi kar anîbe jî em ê wek *dîn* bidin, lewre ji bo ku bibe *cemaat* divê girêdayî dînekî be û ev girêdan ji aliyê Hamzeh'ee ve nehatiye diyarkirin. Dijberî Hamzeh'ee Shahab Vali û Pertow Hooshmandrad vê baweriyê wek *dîn* qebûl kirine. Em ê jî ji niha pê ve têgeha *dîn* bi kar binin. Ji bo bikaranîna têgeha *dîn* bnr, Vali, *h.b.*, Hooshmandrad, "Ayinsel olarak Hayat: Guran bölgesindeki Kürt Ehli Hak'ın ibadet uygulamaları", di *Kürdistan'da Dini Azınlıklar* de, Haz. Khanna Omarkhali, çev. İbrahim Bingöl, Avesta Yayınları, İstanbul, 2014

<sup>12</sup> Hamzeh'ee, *h.b.*, r. 72

<sup>13</sup> Vali, *h.b.*, r. 12

dişibe têgeha *Ehl-i Heqîqaya* sûfiyan jî. Cîranên wan navê '*Elî illahî* tercîh dikin ji bo wan lê belê ev jî ne têgeheke rast e, lewre girîngiya Elî ne pir zêde ye li cem wan.<sup>14</sup>

Di tevahiya kelimên yarsanan de navê 'Elî îllahî carekê ji aliyê Xan Almas Loristanî (1138) ve hatiye bikaranîn. Ev kesayetê girîng ê yarsan wekî Pîr Mûsî xuya bûye di serdema xwe de:

Ve gote yê Elmasê 'Elî Ellayî

Pêncî salan binişt ve melayî<sup>15</sup>

*(Got Elmasê Elî Ellayî*

*Di pêncî saliya xwe de rûnişt ser kursiya melatîyê)*

Heke em li ser dîroka vî dînî bisekinin mixabin em ê nekaribin dîrokeke zelal bidin lewre weku M. Reza Hamzeh'ee jî nîşan dike, tu belgeyên dîrokî tunene ji bo diyarkirina vê agahiyê. Ev ji ber vê pêk tê ku yarsan her tim di nav xwe de bi awayekî veşartî jiyane.<sup>16</sup> Li gorî ku Vali nîşan kiriye, wek hemû doktrînen mîstîk ên ku li ser veşartîbûnê ava bûne, kevneşopiya yarsanan jî li ser doktrîna veşartîbûnê ava bûye.<sup>17</sup>

## 1.2. BÎR Û BAWERİYÊN YARSANAN

Di nav yarsanan de hin bawerî hene ku ji yên misilmanan gelek cuda ne, lê belê bi baweriyên din ên kurdan ên wek êzdîtî hin tiştên wan ên hevpar hene. Baweriyên wek cewherê îlahî, dînadûn (reenkarnasyon), ferîştenasî bingeha doktrîna yarsanan ava dikin. Ev bawerî bi pîranî di nav kelimên wan de jî cih girtine, her

<sup>14</sup> Minorsky, Vladimir, "Ahl-i Hakk", *The Encyclopaedia of Islam*, Prepared by a number of leading orientalists, New Edition, Leiden, E.J. Brill, 1986, r. 260

<sup>15</sup> Xan Elmas, *Dîwân*, nusxeya çapnebûyî ya Seyîd Xelîl Alînejad, kelim 21, r. 69

<sup>16</sup> Hamzeh'ee, *h.b.*, r. 40

<sup>17</sup> Vali, *h.b.*, r. 16

wiha wek pratîk jî di jiyana wan de têne pêkanîn. Ji bo fêmkirina têgeh û wateyên kelimên ku em ê di beşa duyemîn de bidin, em ê hewl bidin ku bi awayekî kurt, yek bi yek li ser van esasên baweriyê bisekinin.

### 1.2.1. Cewherê Îlahî

Yek ji mijarên girîng ên metn û doktrînen yarsanan têgeha "zât" e. Ev têgeh di kelimên yarsanan de heye û her kesên pîroz li gorî vê baweriyê, xwedî xwezaya xwe ye. Ji vê têgehê diyar dibe ku "bûyîn" di kozmolojya yarsanan de aliyekî îlahî ye.<sup>18</sup>

Li gorî Shahab Vali, ev têgeh di kelimên yarsanan de di heman demê de bi navê "*ferr/xwarne*" jî tê nîşandan. Her wiha "*ferr/xwarne*" ku tê wateya lutfa îlahî di dîne zerdûştî de jî ji bo şahên keyanî an jî ji bo çend lehengên mîtolojîk tê bikaranîn.<sup>19</sup>

D. N. Mackenzie ji bo pênaseya "*ferr/xwarne*" dibêje "şan, îhtîşam û serwet."<sup>20</sup> "*Ferr/xwarne*" di metnên beriya îslamî ya Îranê de wekî hêzeke manewî tê nîşandan ku beriya afirandina laşî hebûye.<sup>21</sup>

Peyva "xwarne" bi avestayî rastiyeke îlahî û kalîteyeke manewî ye ku dema kesek piştî xwe bidê, ew rastî wek heybet û îhtîşamek li wî vedigere û derbasî ezîztiyê û mezinahiya manewiyetê dibe. Heke em bi awayekî din bêjin, dibe xwedî hêzek, rêzgirtinek, dehayek, refah û dilxweşiyekê. Bi saya îhtîşamê şahek dibe şah û heta ku ev îhtîşam wî bernede ew wek şah dimîne. Dema ku dev jê berda, ew jî statuya xwe ya şahî wenda dike. Ev bawerî ne tenê ya avestayî ye, di heman demê de di dema sasaniyan de jî hatiye gotin.<sup>22</sup>

---

<sup>18</sup> *h.b.*, r. 31

<sup>19</sup> *h.b.*

<sup>20</sup> Mackenzie, D.N., *A Concise Pahlavi Dictionary*, Londra, 1970, r. 96

<sup>21</sup> Amouzgar, J., *Târîxê Esatîrê Îran*, Tehran, 1374/1995, r. 50, vgz., Vali, *h.b.*, r. 31

<sup>22</sup> Sefa, Z., *Hemasê Sorayî der Îran, ez qadimterîn êhdê Tarîxî ta qernê çehardehomê Hicrî*, Entesaratê Emîr Kabîr, çapa 4mîn, 4, Tehran, 1363/1984, r. 494, vgz., Vali, *h.b.*, rr. 31-32

Lutfa îlahî (ferr/xwarne) dikare bi şekl û simbolên cihê xuya bibe. Li gorî Vali li cem yarsanan *ferr/xwarne* bi ronahiya îlahî xuya dibe, çawa ku di dema bûyîna Sultan Sehak de teyrekê ew aniye.<sup>23</sup> Ev çîrok di pirtûka *Yaresan (Ehl-i Hak)* a M. Reza Hamzeh'ee de wiha tê behskirin:

*Weku di metnên yarsanan de tê ravekirin, çar ferîşte ji bo tecelliyê demeke dirêj li bendê man heta ku darik biqede û teyrekî Spî û Esîl bê li ser wî darikî rûne. Piştî Dayrak Xanima Bakîre pêşka xwe ya ku li ser teyr bû vekir. Carek din pêşka xwe girt û vekir û zarokê dît li hemberî xwe. Ew zarok Sultan Sehak bû.*<sup>24</sup>

Girîngiya "*ferr/xwarne*" li cem yarsanan wek bingeh xuya dike. Ev bi saya "ferr" e ku ezîzek bi ronahiya xwe dikare pirsgerêkên dunyewî çareser bike û silametiye bibîne.<sup>25</sup>

Heke em li ser vî tiştî bisekinin ka kî ye xwediyê *ferr/xwarne*, weku Vali jî nîşan dike, em ê bibînin ku li gorî metnên zerduştî, pehlewî an jî metnên piştî îslamê yên wek *Şahnameya Fîrdewsî*, yên ku xwediyê vê lutfa îlahî ne şah, serwer û mîrza ne ku ev kes ji malbata şah tên: Keyûmers, Hûşeng, Cemşîd, Ferîdûn, Key Kawûs, Siyaweş, Key Xusrev, Goştasp. Hin qehreman jî hene ku ew jî xwediyê vê lutfê ne li gorî metnên yarsanî.<sup>26</sup>

### 1.2.2. Dûnadûn (Reenkarnasyon)

Dûnadûn yek ji baweriyên girîng e li cem yarsanan ku li gorî wan mirin "kirasguhertin" e. Ango piştî mirina kesekî, ew car din di bedena kesekî din de xuya dibe. Li gorî vê baweriyê her kes, ji bo temamkirina mafê jiyane ku jê re tê dayîn, 1001 car kiras diguherîne. Wexta ku ev çerx temam dibin, li gorî karên ku di wan bedenên de kiriye û jiyana ku berdewam kiriye, ji çerxa *dûnadûnê* derdikeve û an digihîje Nûra bêdawî an jî digihîje Tariya bêdawî. Her wiha heke kesê ku kirasê xwe guhertiye însanekî baş be, di bedena kesekî baş de xuya dibe, lê belê heke însanekî

<sup>23</sup> Vali, *h.b.*, r. 33

<sup>24</sup> Ceyhunabadî, *Haqq ol-haqayeq.*, vgz., Hamzeh'ee, *h.b.*, r. 153

<sup>25</sup> Vali, *h.b.*, r. 33

<sup>26</sup> *h.b.*, r. 34

xirab be di bedena kesekî xirab an jî heywanekê de xuya dibe. Ji ber vê, em dikarin bêjin ku ev kirasguhertin ne tenê mîstîk e lê belê bedenî ye jî. Enkarnasyon dikare xwe di hemû zindiyan de nîşan bide û ev wek *dûn* (kiras) tê zanîn. Bi vê baweriyê zatê ferîşteyek jî dikare di bedena însanekî de xwe nîşan bide û em ê vê mijarê di beşa "Ferîštenasî" de bînin zimên.

Li gorî baweriya yarsanan, hê di dema afirandina cîhanê de ferîşteyan ji Xwedê xwestine ku xwe nîşan bide. Ji ber vê daxwazê, Xwedê hin enkarnasyonan empozeyî ferîşteyan kiriye, ev enkarnasyon hezar û yek in û bi saya vê enkarnasyonê edalet derketiye, bi vê edaletê jî rewşên civakî yên wek qencî û xirabî derketine.<sup>27</sup>

Sultan Sehak li ser dînadûnê di kelama xwe de dibêje ku cilên nû li xwe kin û wiha berdewam dike ku dinyaya fanî ne girîng e yê ku tamedê dide dinyaya baqî ye:

Padişah meremû:

Binyamîn Yaran mew gişt û gişt bû

Bipuşun came û qewayê nû û nû

Hezar û yek dîn bikeran tamam

Dinya fanî bû baqî bû we kam<sup>28</sup>

*(Padişah dibêje:*

*Binyamîn Yaran hemû û hemû bû*

*Li xwe kin cil û hirqayên nû û nû*

*Hezar û yek dîn bikin tamam*

*Dinya fanî ye dê tam bide devên baqî)*

<sup>27</sup> Mokri, Mohammad, "L'idée de l'incarnation chez les Ahl-i Haqq", *Akten Des Vierundzwanzigsten Internationalen Orientalisten-Kongresses*, München, 28. August Bis 4. September 1957, r. 496

<sup>28</sup> *Serencam, Beyanul Heq*, nusxeya xetî, Qadir Tehmasibî, r. 26

Heke em wek pênase li têgeha *dûnadûn* (reenkarnasyon) binêrin, em dikarin bêjin ku *dûnadûn* cihguhertina ruhî ya ji bedenekê bo bedeneke din e. Çavkanî li ser vê yekê behsa têgehên cuda dikin: 1) nesx (îqame): derbasbûna laşekî bo yekî din, ango ruh ji laşekî derbasî yekî din dibe. 2) mesx (veguherîn) derbasbûna laşê mirov bo laşê heywanekê. 3) fesx (parçebûn) derbasbûna laşê însên ji bo mîneralekê. 4) resx (sabîtkirin) veguherîna bo giyayekî.<sup>29</sup>

Weku Vali jî vê pênaseyê piştrast dike, li gorî vê doktrîna yarsanan ruh ne tenê dikare têkeve laşê mirovan, di heman demê de dikare têkeve yê heywanan jî, her wiha yê giya û tiştên bê tevger jî. Esas baweriya ji peresîna ruhekî re dikare bi jiyanên ku dû re tîn pêk bê. Bi vê nêrînê, bi mirina laşekî fîzîkî, vejîneke nû di laşekî din de pêk tê û têkiliyek din rê dide ku bide dû tecrûbe û peresîna wî. Ango neqeba ku ruh xwe diguherîne derbasbûna ji laşekî bo yê din e.<sup>30</sup> Di vê bawriyê de jin û mêr wekhev tene dîtin, çawa ku mêrek dikare piştî mirina xwe di bedenek din de xuya bibe, jin jî bi heman awayî piştî mirina xwe (kiras guhertina xwe) dikare di bedena kesek din de xuya bibe. Di heman demê de mêrek jî dikare di bedena jinekê de car din bê dinyayê, her wiha jinek jî di bedena mêrekê de dikare bê dinyayê. Ev bawerî wekhevîya wan a li hemberî jin û mêran nîşan dide.

### 1.2.3. Tecellî (Teofanî)

Têgeha tecelliyê, ku zuhûrkirina hebûnên îlahî îfade dike, fenomeneke pir berbelav e di gelek dînên îbtîdayî û pêşveçûyî de. Li gorî vê têgehê, hebûneke xwedayî an jî xwedayek, dikare di mekanekê de, di nesneyekê de, di hebûnekê de an jî di însanan de carinan bi temamî carinan jî ne bi temamî, xuya bibe. Dikare bi însanan re têkeve têkiliyê an jî fermanan bide wan.<sup>31</sup>

Li gorî yarsanan cewherê îlahî yê Xwedê di serdemên cuda de, digel ferîşteyên xwe zuhûr kiriye. Ev bawerî esas dikare bê gotin ku heta mîtolojiya kevn a

<sup>29</sup> Feqîh Belxî, Ebulme'alî Muhammed bin Nimet 'Elevî, *Beyan el-Edyan*, amd. Muhammed Teqî Danişpejuh, Mecmuyê Entesaratî Edebî ve Tarîxiye Moqufatê Dr. Mehmûd Efşar, Tehran, 136/1997, vgz., Vali, *h.b.*, r. 36

<sup>30</sup> Vali, *h.b.*, r. 37

<sup>31</sup> Sinanoğlu, Mustafa, "Tecellî", *İslam Ansiklopedisi*, cilt. 40, 2011, rr. 243-245



cîhana îranî dirêj dibe û ev serdem jî, wek dîroka pîroz a yarsanan tê zanîn. Her wiha ev bûyerên tecelliyê di serdemên dîrokî de jî berdewam kirine. Li gorî yarsanan di serdema ku wek serdema şerîetê tê qebûlkirin, Elî û ferîşteyên wî xuya bûne, lê piştî vê serdemê têgeha tecelliyê bi temamî derbasî karakterên kurd bûye. Di vê serdemê de ku em behs dikin, tecelliya Xwedê ya yekemîn bi Behlûl dest pê dibe û lutkeya vê tecelliyê di laşê Sultan Sehak de xwe nîşan dide.

Têgeha "théophanie" li gorî ferhenga *Larousse* frensî "xuyabûn" an jî "xuyabûna îlahî" ye.<sup>32</sup> Weku M. Mokri diyar dibe, li gorî yarsanan Xwedê, ji ber ku nayê nasîn, pir aciz bûye û ji bo ku bê nasîn û hezkirin dinya afirandiyê. Hê di dema afirandina dinyayê de Xwedê soz daye ferîşteyên xwe ku dê xwe nîşanî wan bide. Lê belê xwe bi awayên din nîşan daye. Her xuyabûna wî bi awayekî îlahî çêbûye, ango bi ronahiya xwe hatiye.

Li gorî baweriya yarsanan tiştê girîng ew e ku di sîstema ferîštenasiyê de, Xwedê bixwe nayê dîtin, ancax di şiklê însanan de ango wek Xwedê-însan dikare bê dîtin. Wexta ku di sûretê însanekî de xuya dibe, ew kes wek Xawandegar ango Yar tê binavkirin, di şewaza teofaniyê de jî wek Şah an jî Padîşah tê binavkirin. Li gorî ferîşteyên xwe, Xwedê kêmtir xuya dibe di bedenên însanan de. Her wiha wexta ku Xwedê di bedena kesekî de xwe nîşan dide, ev tişt wek *zat-mihman* tê binavkirin. Li gorî vê baweriyê Xwedê tê di bedena kesekî de xuya dibe, carinan heta demekê dimîne carinan jî bi tevahiya jiyana wî kesî di bedena wî de dimîne.<sup>33</sup> Li gorî baweriyê, ew kes ji aliyê Xwedê ve tê ziyaretkirin. Her wiha weku Mohammad Mokri nîşan kiriye, kesên ku ji aliyê Xwedê ve qet nehatine ziyaretkirin wek *zat-beşer* têne binavkirin. Her wiha wexta ku Xwedê li mala wî kesî dimîne ev bûyer jî wek *Şah-mihman* an jî *Xwedê-mihman* tê binavkirin. Wekî mînak Binyamîn-mihman, Pîr Mûsî-mihman û hwd.<sup>34</sup>

Em ê li vir hewl bidin ku biyografiyeke biçûk a çend kesayetên girîng ên kurd bidin ku li gorî yarsanan Xwedê tecelliyî wan kirine.

<sup>32</sup> ji bo "théophanie" bnr: <http://www.larousse.fr/dictionnaires/francais/th%C3%A9ophanie/77722>

<sup>33</sup> During, Jean, "Notes Sur L'Angéologie Ahl-e Haqq", dans *Synchrétismes et Hérésies Dans l'Orient Seldjoukide et Ottoman (XIVe-XVIIIe Siècles)*, Actes du Colloque du Collège de France, octobre 2001, Sous la direction de Gilles Veinstein, Peeters, 2005, Paris, r. 134

<sup>34</sup> Mokri, *h.b.*, r.498

### 1.2.3.1. Behlûl

Li gorî metnên pîroz ên yarsanî Behlûl di dema Harun er-Reşîdê xelîfeya ebasiyan de jiyaye, ango di salên Hicrî 170-193 (P.Z. ji 786an heta 808an) de jiyaye.<sup>35</sup>

Di nav yarsanan de wek Behlûl Mâhî an jî Behlûl Mâdî (Behlûlê Medî) tê zanîn. Di çanda îranî de wek Behlûlê Dîwane an jî Behlûlê Mecnûn derbas dibe.<sup>36</sup> Hamzeh'ee nîşan dike ku navê Behlûl di nav metnên yarsan ên wekî *Heqq ol-Heqayeq* û *Serencam* de derbas dibe.<sup>37</sup>

Bi gelemperî, wek yekemîn kesayetê girîng ê kurd ê yarsanan tê hesibandin, li gorî doktrîna yarsanan, wî li herêma Hewramana Kurdistanê doktrîna yarsan belav kiriye, li ser vî dînî wez dane û vî dînî daye hezkirin.<sup>38</sup>

Wek tê gotin Behlûl bi çend alîgirên xwe re çûye Bexdayê û li wir Cafer el-Sadiqê şeşemîn îmamê şîiyên dozdehan dîtiye.<sup>39</sup> Li gorî Hamzeh'ee ku di pirtûka xwe ya *Yaresan (Ehl-i Hak)* de nîşan dide, Behlûl bi qasî demekê li wir xwendiyê û dû re vegehiyaye Kermanşahê. Li wê herêmê fikrên xwe belav kirine û dane naskirin, bi vî awayî wê demê gelek alîgirên wî çêbûne.<sup>40</sup> Gerên Behlûl di kelamekê de wiha derbas dibin:

Ew vate yê Yaran, ew vate yê Yaran

Ême dîwaneyin, ew vate yê Yaran

Henî megîlin yek yek şaran

Ta zinde kerim ayînê Îran<sup>41</sup>

<sup>35</sup> Hamzeh'ee, *h.b.*, r. 91

<sup>36</sup> Vali, *h.b.*, rr. 41-42

<sup>37</sup> Hamzeh'ee, *h.b.*, r. 91

<sup>38</sup> Safizade, S., *Daneşnameyê Namaveranê Yarsan, Ehval ve Asarê Meşahîr, Tarîx Ketab ha ve Estehalatê Erfanî*, Entesaratê Hîrmand, Tehran, 1376/1997, r. 38

<sup>39</sup> Amir-Moezzi, M.A., Jambet. C., *Qu'est-ce que le shî'isme?*, Fayard, 2004, r. 63-64

<sup>40</sup> Buraka'i Bozorgan, r. 12, vgz., Hamzeh'ee, M. Reza, *h.b.*, r. 94

<sup>41</sup> *D.N.Y.*, r. 41

*(Weku Yar dibêjin, weku Yar dibêjin*

*Em dîn in weku Yar dibêjin*

*Em digerin bajaran yek bi yek*

*Heta ku zindî bikin dîne îranî)*

Marzolph nîşan dike ku Behlûl wekî zanayê dîn (*Uqalâ' al-Majânîn*) dihat hesibandin.<sup>42</sup> Dîwanetiya Behlûl di kelamekê de wiha derbas dibe:

Dîwaneyê Zahir, dîwaneyê Zahir

Danayê Yaranim, Dîwaneyê Zahir<sup>43</sup>

*(Li Zahir dîwane me, li Zahir dîwane me*

*Zanayê Yaran im, li Zahir dîwane me)*

Her wiha Hamzeh'ee bi vî awayî behsa dîwanetiya Behlûl dike:

*"Li gorî metnên yarsan ên Heqq ol-Heqayeq û li gorî Kaka Reda'i, Behlûl wexta ku ji aliyê xelîfe ve ji bo kuştinê hatiye tehdîtkirin, Behlûl xwe li dînîtiyê daniye. Wexta ku ew wisa tevgeriyaye, hevalên wî bi awayekî veşartî fikrên yarsanî belav kirine. Her wiha tê nîşandan ku Behlûl li hemberî rêveberiya ebasiyan tevliheviyek derxistiye û gelek ji alîgirên xwe ji bo belavkirina baweriya yarsan şandiye cihên cuda."<sup>44</sup>*

Li ser dînîtiya Behlûl çend kelam jî hatine nivîsîn ku yek ji wan kelaman ya Newroz Soranî ye:

<sup>42</sup> Marzolph, Ulrich "Bohlul", *Enc. Ir.*, <http://www.iranica.com/newsite>

<sup>43</sup> D.N.Y., r. 41

<sup>44</sup> Ceyhunabadi, *Haqq ol-haqayeq..*, r. 224; Buraka'i, Sediq Safi-zadeh, *Bozorgan-e yarsan: Ahl-e Haq*, Tehran: 'Ata'i, 1361 h, r. 8, vgz., Hamzeh'ee, *h.b.*, r. 94

Behlûl Zatiwen Zati yekdane  
Amiyan maçan Behlûl dîwan e  
Kî dî dîwane wîtewr dana bûwe  
Merkew ne meydanê gerdûn rana bûwe<sup>45</sup>

*(Behlûl cewherê îlahî ye, cewherê yekane*

*Bi nezanî dibêjin ku Behlûl dîn e*

*Kî dîtiye dîwane ew qas zana bûye*

*Berzîne xwe li meydana asîmanê digerîne)*

Weku Vali nîşan dide, Jalâlî Moqaddam dibêje ku îro li gundê Gehwareyê ku li herêma Goranê ye, çiyayek bi navê Behlûl heye û li gorî kevneşopiya yarsanan ev çiya cihê Behlûl bûye û li wir dikete xelwetê. Li ser berdewama jiyana wî an jî cihê wî yê mirinê ku wekî piştî Îsa 805 hatiye nîşandan tu agahî tune. Li Kerendê ziyaretek bi navê "*Ziyaretgeha Behlûl*" heye. Li gorî kevneşopiyê gora Behlûl li wir e.<sup>46</sup>

### 1.2.3.2. Şah Fezl Velî

Li gorî kevneşopiya yarsanan piştî serdema Behlûl ya Şah Fezl tê. Shahab Vali nîşan dike ku serdema wî wek netemamkirî û nîşandaneke veşartî (*Zohûrê Xefî*) tê hesibandin.<sup>47</sup> Li gorî Nur 'Elî Elahî, ku Hamzeh'ee nîşan dike, dîroka zayîn û mirina Şah Fezl Valî bi awayekî zelal nayê zanîn. Her wiha tê gotin ku Şah Fezl ji

---

<sup>45</sup> D.N.Y., rr. 39-40

<sup>46</sup> Jalâlî Moqaddam, M., Safvat, D., "Ahl-e Haqq" di *Dâirat al-Ma'ârif-e Bozorg-e Eslâmi*, Vol, 10, Musavî Bojnûrdî, K., (éd), Markaz-e Dâirat al-Ma'ârif-e Bozorg-e Islâmî, Tehran, 1380/2001, rr. 467-474, vgz., Vali, *h.b.*, r. 43

<sup>47</sup> Vali, *h.b.*, r. 43

Hindistanê ye û bi çend kesên navdar ên wek Nesîmî, Zekerîya û Tor-e Ser Borideh re jiyaye.<sup>48</sup>

### 1.2.3.3. Baba Serhengê Dewdanî

Li gorî kevneşopiya yarsanan tecelliyekî din ê Xwedê, Baba Serhengê Dewdanî ye. Li gorî vê kevneşopiyê piştî Şah Fezl ew bûye xwediyê cewherê îlahî an jî bûye tecelliyê Xwedê. Dîsa li gorî kevneşopiya yarsanan ji Dewdanê ye, gundekî di bin çiyayê Şahû, nêzî Cewanrûda rojhilatê Kurdistanê ye.<sup>49</sup>

Baba Serheng di dawiya sedsala 10mîn a P.Z. de jiyaye û bedena wî ya simbolîk li gundê Tewîle hatiye defnkirin. Ev gora simbolîk îro ji aliyê yarsanan ve tê ziyaretkirin. Çarîneke balkêş heye ku ji Baba Serheng bêtir behsa dînê kurdan dike:

Serhengê Dewdan, Serhengê Dewdan

Ez kî namimin Serhengê Dewdan

Çenî êrmanan megîlim herdan

Mekuşim perî ayînê kurdan<sup>50</sup>

*(Serhengê Dewdan, Serhengê Dewdan*

*Ez ku navê min Serhengê Dewdan*

*Bi hevalên xwe re her gav digirim*

*Ji bo ayîna kurdan hewl didim)*

<sup>48</sup> Ceyhunabadi, *Haqq ol-haqayeq*, rr. 260-261, vgz., Hamzeh'ee, *h.b.*, r. 94

<sup>49</sup> Elâhî, N., *Borhân al Haqq*, r. 30, vgz., Vali, *h.b.*, r. 44

<sup>50</sup> D.N.Y., r. 53

#### 1.2.3.4. Şah Xoşîn

Jiyana Şah Xoşîn bi awayekî dîrokî nehatiye diyarkirin, lê li gorî kevneşopiya yarsanan, Şah Xoşîn bi awayekî mucîzewî ji jineke bakîre ya bi navê Celale hatiye dinyayê.<sup>51</sup> Li gorî Hamzeh'ee piştî 'Elî, teofaniya yekem Şah Xoşîn e.<sup>52</sup> Lê li gorî yarsanan beriya Şah Xoşîn Xwedê di bedena Behlûl, Şah Fezl û Baba Serheng de tecellî kiriye.

#### 1.2.3.5. Baba Nawis

Li gorî kevneşopiya yarsanan, Şah Xoşîn beriya ku wenda bibe, diyar kiriye ku dê li derekê ku lê tenbûra wî tê xistin xuya bibe. Alîgirên wî demeke dirêj li wî cihî digerin. Rojekê digihîjin gundê Sergetê ku li herêma Hewremanê ye. Li wir di bin siya darekê de rûdinin û wê demê dengê tenbûra Şah Xoşîn dibihîzin. Fam dikin ku wexta xwenîşandana wî hatiye. Dikevin nav wî gundî û Şah Xoşîn di bedena Baba Nawis de dibînin. Navê wî yê rasteqîn Îbrahîm e kurê Ehmedê ji eşîra Cafan e. Wexta ku Baba Nawis Îlahîbûna xwe eşkere dike, her kes wî wek dînekî dibîne.<sup>53</sup>

#### 1.2.3.6. Sultan Sehak

Li gorî Hamzeh'ee di navbera Şah Xoşîn û Sultan Sehak de zêditirî du sed salan heye. Her wiha Sultan Sehak e ku şiklê herî dawî yê yarsaniyê ava kiriye.<sup>54</sup>

Sultan Sehak ji malbateke ji koka Berzenciyan tê û bavê wî Şêx Îsî ye. Bê guman piştî Şah Xoşîn reformparêzê mezin Sultan Sehak e û wek tecelliyê Xwedê tê pêşkêşkirin.<sup>55</sup>

---

<sup>51</sup> *Tadhkarey-e A'alâ*, Anonyme, Ivanow, W., (ed), Entesaratê Anjomanê Esmâ'îlî, Matba'i Qaderî Press, Bombay, 1950, p. 32/Ivanow, W., *The Truth-Worshippers of Kurdistan, Ahl-I Haqq texts*, edited in the original Persian and analysed by W., Ivanow, Published for the Ismaili Society by Successors of E.J. Brill, Holland, 1953, r. 111, vgz., Vali, *h.b.*, r. 44

<sup>52</sup> Hamzeh'ee, *h.b.*, r. 99

<sup>53</sup> Vali, *h.b.*, rr. 45-46

<sup>54</sup> Hamzeh'ee, *h.b.*, r. 109

Bapîrê wî Baba Eliyê Hemedanî di serdema xwe de wek alimekî hatiye nasîn û Sultan Sehak jî li dû wî çûye, ewil felsefe, metafîzîk û edebiyat xwendiyê, piştê jî dersên dîn û hiqûqa dîn xwendiyê.<sup>56</sup> Lê belê yarsan vî tiştî qebûl nakin, lewre li gorî wan Sultan Xwedê ye û pêdiviya wî bi xwendinê tune.

Ber bi sedsala 15mîn a P.Z. ve, teofaniya herî mezin di bedena Sultan Sehak de pêk hatiye. Li gorî yarsanan, wisa tê bawerkirin ku Sultan Sehak avakarê dînê yarsan e. Çar ferîşteyên ku di çar bedenên însanan de enkarne bûne, sê roj û sê şev li çiyayê Şahû li benda hatina Xwedê bûne. Xwedê wek teyrêkî spî xwe nîşan daye û ji wan re gotiye ku bila biçin Berzenciyê û li wir Şêx Îsî bibînin. Dû re wî qanîh bikin ku bi Dayraka keça Huseyn Beg re bizewice. Piştî vê ji wan xwestiyê ku darekî tûyê li ber baxçê wan biçînin û wexta ku ew dar hişk bibe ew ê wek teyrêk spî car din xuya bibe, ev ê bibe nîşaneyê vegera wî. Ferîşte daxwaza Xwedê tînin cih û demek bi şûn de Xwedê jî soza ku daye pêk tîne û wek teyrêk spî tê, ber bi Dayrakê ve diçe û li ser çokê wê disekine. Dayrak xwe li ser teyr xwar dike û di carekê de li ser milên xwe zarokek dibîne û navê wî dikin Sultan Sehak.<sup>57</sup>

Weku Vali diyar dike, serdema herî girîng a yarsanan bi Sultan Sehak dest pê dike û hatina Sultan wek serdema "*Heqîqet*"ê tê nasîn. Bi gelemperî wisa tê hesibandin ku damezrînerê rasteqîn ê baweriya yarsanan Sultan Sehak e.<sup>58</sup>

Wisa xuya dike ku Sultan Sehak sîstema Şah Xoşîn nû kiriye û sîstemeke sosyo-dînî ava kiriye. Sedema vê tevgera Sultan Sehak jî ev bûye ku qebîleyan bîne cem hev û ji tehdîda moxolan a li hemberî Kurdistan û Mezopotamyayê xwe biparêzin. Sedemeke wî ya din jî ew bûye ku kevneşopiya qebîleyan biparêze.<sup>59</sup>

Li gorî Hamzeh'ee di sedsala panzdemîn de, Sultan Sehak yarsanî jî nû ve ava kiriye û ji bo ku rê û rêbazan sîstematîze bike tevgerê xurt a sosyo-dînî afirandiyê.

---

<sup>55</sup> Mokri, Mohammad, *Mythe Historisé de L'Epoque Islamique au Luristan, La Geste du Roi Khôchîn, le Cavalier de la Montagne, Etude d'ethno-lexicologie (deuxieme partie)*, Extrait du JA, Tome 287. 1(1999), Paris, 1995, r. 44

<sup>56</sup> Buraka'i, Sediq Safi-zadeh, *Bozorganê yarsan: Ehl-ê Haq*, Tehran: 'Ata'i, 1361 h., r. 53, vgz., Hamzeh'ee, *h.b.*, r. 111

<sup>57</sup> Mokri, *h.b.*, r. 497

<sup>58</sup> Vali, *h.b.*, r. 47

<sup>59</sup> Tebîbî, H., "Menşê Îctîmayê Moteqîdatê Kurdanê Ehl-î Heqq", di *Zemêmeyê Mecelleyê Berresî hayê Tarîxî* de, Şomarê 3mîn, Sala 6mîn, rr. 54-55, vgz., Vali, *h.b.*, r. 47

Di serdema xwe de hin alîgirên xwe wek rêberê şaxên cihê yên yarsanan hilibijartiye. Piştê yên ku ji koka wan tîn rêberiyê kirine. Di serî de heft şaxên yarsanan hebûye, lê belê di sedsala hejdemîn de çar şaxên din jî lê zêde bûne û şaxên wê bûne yazdeh.<sup>60</sup>

Vali vê dabeşkirina şaxan wek malbat dibîne û li ser vê dibêje Sultan Sehak malbatên yarsanan ava kirine. Bi saya van malbatan e ku civaka yarsanan heta niha jî hebûna xwe berdewam kirine. Di nav her malbatekê de divê "yar/sadiq"ek hebe û her wiha divê bibe "sarsepordeh" (kesê ku xwe teslîm dike) ji bo her malbatekê. Ev malbat hê jî hene û bi rêberiya ezîzên ku di her malbatê de hene civaka yarsanan li ser piyan maye.<sup>61</sup>

Zatê Sultan Sehak piştî ketina laşên cuda di serdemên cuda de û li cihên cuda bi cih bûye. Enkarnasyonên wî li Kurdistanê û her wiha li derên din jî çêbûne, wekî mînak di laşê Hecî Bektaşî Welî de enkarne bûye.<sup>62</sup>

#### 1.2.4. Ferîštenasî

Ferîštenasî li cem yarsanan yek ji sîstema perestînê ye. Weku Vladimir Minorsky diyar dike, li gorî kevneşopiya yarsanan, civaka yarsanan jî Heft Ferîşteyên Sereke pêk hatiye ji avabûna cîhanê û vir de, her wiha di her serdema xwenîşandanê de yek ji wan xwe nîşan daye, ango di heft dewran de xwenîşandana îlahî pêk hatiye.<sup>63</sup>

Heke em vê pênaseyê zelaltir bikin divê em berê xwe bidin pênaseya Hamzeh'ee a li ser ferîštenasiyê. Li gorî Hamzeh'ee, yarsan ji wî Xwedayî bawer dikin ku karibe li ser rûyê erdê tecellî bike. Li gorî vê baweriyê, bi heft tecelliyên gelek tecelliyên biçûk jî pêk hatine.<sup>64</sup> Çawa ku Xwedê dikare di hebûnên din de tecellî bike, ferîşte jî dikarin li şûna hev xuya bibin, ji ber vê ye jî di metnên yarsanan

<sup>60</sup> Hamzeh'ee, *h.b.*, r. 115

<sup>61</sup> Vali, *h.b.*, r. 48

<sup>62</sup> *h.b.*

<sup>63</sup> Minorsky, Vladimir, "The Sect of the Ahl-i Hakk", in *Iranica, Twenty Articles*, Publication of the University of Tehran, vol. 775, 1964 r. 251

<sup>64</sup> Hamzeh'ee, *h.b.*, r. 162



de navên ferîşteyan dikare li şûna hev bêne bikaranîn. Bi awayekî mirov dikare bêje ku ferîşte wek wezîrên Xwedê vê rolê hilgirtine ser xwe.<sup>65</sup>

Weku Vali nîşan dike, Tebîbî dibêje ku li gorî doktrîna yarsanan, her ferîşteyeke sereke îlahî ye û her yek xwedî berpirsiyariyeke taybet e di dinyaya maddî û manewî de.<sup>66</sup> Li gorî During, ferîşte bi kesayetên dîrokî enkarne dibin, lê belê xwezaya wan ji ya însanan cudatir e.<sup>67</sup>

Ev sîstema ferîşteyan wek hiyerarşî tê dîtin û di vê hiyerarşiyê de komên ferîşteyan hene. Her kom di serdemeke taybet de ava bûye, her wiha piraniya van koman ji heft ferîşteyan pêk tê.

"Heften" ji şeş ferîşteyên sereke û Xwedê pêk tê ku beriya tecelliya îlahî xuya bûne. Tabloya ferîşteyên *Heften* wiha ye:

1. Serdema Xawendegar: Cebraîl, Mîkaîl, Îsrafil, Azraîl, (?)
2. Serdema 'Elî: Muhemmed, Selman, Qamber, Nusayr, Fatemeh
3. Serdema Xoşîn: Baba Bozorg, Baba Faqih, Baba Hesên, Baba Taher
4. Serdema Sehak: Binyamîn, Dawid, Pîr Mûsî, (?), Remzbar, Baba Yadîgar, Mistefa
5. Serdema Qermezî: Kake Mîre, Kake 'Ereb, Kake Rehman, (?), Zerbanû
6. Serdema Muhemmed-Beg: Kake Merîcan, Kake Melekcan, Qerepust, Şahsiwar, (?)
7. Serdema Xan Ateş: Xan Cemşîd, Xan Almas, Xan Ebdal, (?), Perî Xanim<sup>68</sup>

Her wiha xwenîşandana herî girîng a van Heft Hebûnên Îlahî an jî "Heften" di serdema Sultan Sehak de ye.<sup>69</sup> Weku em di tabloyê de jî dibînin di van *Heften*an de

<sup>65</sup> *h.b.*

<sup>66</sup> Tebîbî, H., "Tathîr-e Haft Amshâspand dar Âyîn-e Kordân-e Ahl-e Haqq", dans *Zamîneh Majalleh Barrasî hây-e Târîkhî*, Shomâreh 3, Sâl-e 6, vgz., Vali, Shahab, *h.b.*, r. 54

<sup>67</sup> During, *h.b.*, r. 131

<sup>68</sup> Ji bo vê tabloyê bnr. Hamzeh'ee, *h.b.*, r. 163

<sup>69</sup> Vali, *h.b.*, r. 54

ferîşteyên jin jî hene ku yek ji wan Remzbar e û em ê di beşa duyemîn de bi berfirehî cih bidine wê.

"Heftewane" koma duyemîn a ferîşteyên yarsanan e. Wisa tê zanîn ku ev *Heftewaneya* serdema Sultan Suhak avakarê heft şaxan e ku dû re ew ê bibe yazdeh. *Heftewane* xwedî cihekî girîng e ji bo yarsanan û li gorî baweriya wan *Heften* alîkariya *Heftewane* kiriye.

Prensîba bingehîn a vê sîstemê ew e ku wexta yek ji wan wenda dibe yekî din dikeve şûna wî. Heke Şeş ferîşte di heman demê de di serdemekê de xuya bibin, ev tê wê wateyê ku serdemeke nû ya Dîrokê dest pê dike.<sup>70</sup>

Di metn û kevneşopiyên yarsanan de bûyerek wiha heye: Beriya teofaniya mezin a Sultan Sehak, Pîr Binyamîn (Cebraîl) figurê herî navdar ê yarsanan ketiye bedena gundiyeqî feqîr ê bi navê Xidirê ji Pawe. Wexta ku ferîşte dikeve bedena wî, gundî xwe wenda dike. Ji ber ku gundî xwe pir aciz dibîne Pîr Mûsî (Îsrafil) di bedena Rukn ed-dîn de xuya bûye, ji Şamê tê gundê Pawe û diçe cem wî kesî. Li birca wî dinêre û jê re dibêje ku ew Cebraîl e. Wê demê yê gundî ji hişê xwe diçe û dû re rewşa ferîşteyî pê re pêk tê.<sup>71</sup>

Li gorî kevneşopiya yarsanan, heft ferîşteyên sereke hene, lê belê weku em ê li jêr bibînin ji Pîr Binyamîn heta Baba Yadîgar navê şeş ferîşteyan hene. Yarsan wisa bawer dikin ku yê heftemîn Sultan Sehak e, lewre koma van ferîşteyan wek *Heften* tê zanîn. Em ê li vir şeş ferîşteyên sereke yê *Heften* bidin nasîn. Mixabin em ê nekaribin li ser hemû ferîşteyan bisekinin, lewre hem mijareke kûr e hem jî derdikeve derveyî mijara me.

---

<sup>70</sup> During, *h.b.*, r. 134

<sup>71</sup> *h.b.*

#### 1.2.4.1. Pîr Binyamîn

Weku em di pirtûka Vali de dibînin, li gorî Sefîzade, Cebraîl di sedsala 13mîn de, di bedena Pîr Binyamîn de xuya bûye.<sup>72</sup> Pîr Binyamîn li çiyayê Şahû yê ku li herêma Hewramana rojhilatê Kurdistanê ye, hatiye dinyayê. Dîsa li gorî kevneşopiya yarsanan li Kerendê kiras guhertiye û gora wî ya sembolîk li wî bajarî ye. Pîr Binyamîn ferîşteyê sereke yê *Heften* e û yê herî nêzîkê Sultan Şahak e, di nav mircana Cewherê Îlahî de beriya ebedîbûnê, beriya hemû aferideyan hatiye afirandin.<sup>73</sup> Rengê wî spî ye.<sup>74</sup>

Ev ferîşte Ruhê Ezîz ê Xwedê hilgirtiye. Wesfê wî yê sereke îlham û afirandin e.<sup>75</sup> Li gorî kevneşopiya yarsanan Pîr Binyamîn di şeklê herî baş a xwenîşandana Cebraîl de xuya bûye.<sup>76</sup>

#### 1.2.4.2. Dawud Dewdanî

Li gorî kevneşopiya yarsanan, beriya afirandina dinyaya maddî, di Mircana serdestpêkî de rola Rêberiya hevalan ji Dawud (Îsrafil) re hatiye dayîn. Ew ê di pêşiyê de bimeşe û xetên Xwedê/Sultan Şahak bide meşandin û dê meclîsa îlahî ya dinyayê ew ê ava bike.<sup>77</sup>

Karê vî rêberî ew bûye ku karê cîhanê bimeşîne. Li hemû cîhanê alîkariya rêwîyan dike, wan diparêze û ewle dike. Merhamet, ewlebûnî, parastin, alîkarî û rêberiyê nîşan dide. Rengê wî şîn e û nîşaneyê wî çûveke zêrîn e. Li gorî Daring, yarsan bi awayekî din gîrêdayî Dawud in û wekî "Dawûdî" têne binavkirin.<sup>78</sup>

---

<sup>72</sup> Sefîzade, S., (ed), *Dewreyê Heftewane, Cozî ez Nameyê Minevî Ser Encam*, Kitabxaneyê Tehûrî, Tehran, 1361/1382, r. 115, vgz., Vali, *h.b.*, r. 54

<sup>73</sup> Mokri, Mohammad, *Le Chasseur de Dieu et le mythe du Roi-Aigle (Dawra-y Dâmyârî)*, Otto Harrassowitz, Wiesbaden, 1967, r. 5

<sup>74</sup> Daring, *h.b.*, r. 136

<sup>75</sup> *h.b.*, r. 137

<sup>76</sup> Vali, *h.b.*, r. 54

<sup>77</sup> Mokri, Mohammad, "Le Kalâm Gourani sur Le Cavalier au Coursier Gris, Le Dompteur du Vent", Extrait du *JA*, 1974, r. 48

<sup>78</sup> Daring, *h.b.*, r. 137

#### 1.2.4.3. Pîr Mûsî

Pîr Mûsiyê ku wek Rukneddîn Demîşqî jî tê zanîn, enkarnasyona Mîkaîl e. Pîr Mûsî wezîr û nivîsevanê Sultan Sehak bûye li gorî kevneşopiya yarsanan. Ferîşteyekî sereke ye ku di destê wî de *Qelemê Zêrîn* hebûye û bi wê qelemê, di pirtûka veşartî de her tişt qeyd girtine, ji ber vê jî wesfê wî "Qelem Zêr" an jî "Qelem Zen" e. Bi vê qelema xwe qerar, tevgerên însanan û bûyerên dinyayê qeyd kirine. Rengê wî zer e û taybetiya wî ya herî mezin dadgerî ye.<sup>79</sup>

#### 1.2.4.4. Mistefa Dawudan

Mistefa Dawudan (Ezraîl) ferîşteyê mirinê ye, peywira xezeba îlahî bi wî hatiye dayîn. Rengê wî reş e. Mistefa û Dawud du formên dijberî hev in. Li cem Dawud tu şopên xezebê tunene û li cem Mistefa jî tu şopên merhametê tunene.<sup>80</sup>

#### 1.2.4.5. Xatûn Dayrak (Xatûn Remzbar)

Bi merhameta îlahî hatiye dinyayê. Dîsa ji jinekê enkarne bûye. Wekî Dawud (Îsrafil) bi merhamet e. Bi taybetî jin û zarokan diparêze. Rengê wê mor e. Asyeya jina Fîr'ewn, Belqis (padîşaha Sabayê), Zeyneba xwişka Îmam Huseyn, Nêrgiza diya Îmamê dozdemîn xuyabûnên vê ferîşteyê ne.<sup>81</sup> Beriya îslamê, di mîtolojiya îranî de, di figurên cihê yê jinan de xuya bûye, her wiha weku em ê di pêş de behs bikin wek Sîmûrg jî xuya bûye.

#### 1.2.4.6. Baba Yadîgar

Li gorî ku Vali diyar dike, Baba Yadîgar li gundê Şêxanê hatiye dinyayê û rasterast ji Sultan Sehak perwerdehî girtiye. Ji bo ku rêberiya xelqê bike çûye

---

<sup>79</sup> *h.b.*, r. 141

<sup>80</sup> *h.b.*

<sup>81</sup> *h.b.*, r. 142

Hîndîstanê. Piştire vegeyriyaye Kurdistanê û nêzî Seranê hatiye qetilkirin. Gora wî ya sembolîk li çiyayê Dalahûyê ye.<sup>82</sup>

Li ser jidayîkbûna Baba Yadîgar çîrokek heye di kevneşopiya yarsanan de. Weku Hamzeh'ee nîşan dike, li gorî kevneşopiya yarsanan Sultan Sehak darê Şah Îbrahîm daye Pîr Îsmâil Kulan ji bo ku li baxçê biçîne. Ji vê darê dara hinarê şîn bûye û hinar ji bo Sultan hatiye pêşkêşkirin. Piştire *Cem* hatiye sazkirin, li ser hinarê dua hatiye kirin û hinar ji bo kesên wir hatiye belavkirin. Piştî vê *Cemê* Dada Sariya, keça Pîr Mîkaîl, ji bo paqijiyê çûye wir. Wexta ku paqijî kiriye, libek hinarê dîtîye ser erdê. Wê ev liba hinarê xwariye. Piştire biheml bûye û ji devê xwe zarokek aniye dinyayê. Xelq li ser wê jinê gotinên nebaş kiriye, ji ber vê jî Sultan Sehak biryar daye ku vî zarokî têxe nav firinê. Heke tiştêk pê neyê wê fam bikin ku ev zarok qenc e û kesayetekî mezin e. Piştî sê rojan Dawid bi daxwaza Sehak ew ji firinê derxistiye û dîtine ku Baba Yadîgar bê şewat ji agir derketiye.<sup>83</sup>

### 1.3. EDEBIYATA PÎROZ A YARSANAN

Bingeheke xurt a edebiyata yarsanan heye ku piraniya vê bingehê ji kelimên pîroz pêk hatiye. Bi gotina Abdurrahman Adak: "*Edebiyata kurdî ya goranî digel edebiyata kurdiya lorî edebiyata herî kevn a kurdî ye. Em diyalekt û devokên wekî kurdiya goranî, kurdiya lorî, lekî, feylî û senendecî di bin sernavê edebiyata kurdiya goranî de dihesibînin. Melbenda vê edebiyatê Kurdistana Rojhilat e û beşeke biçûk a Kurdistana Başûr e.*"<sup>84</sup>

Li gorî Behrooz Chaman Ara, di nav zimanzanan de nîqaşeke wiha heye ka goranî zimanekî serbixwe ye an zaravayê kurdî ye. Lê weku diyar dike, li gorî McKenzie, goranî diyalekteke serbixwe ye, dû re pêş ve çûye û bûye zimanê edebiyatê. Lê Chaman Ara goranî wek diyalekteke kurdî dibîne ku li herêma Zagrosê tê axaftin û dibêje şewazeke wê ya edebî heye û kombînasyoneke sentatîk, leksîkal û

<sup>82</sup> *h.b.*

<sup>83</sup> Efelî Şah Ebrahîmî, Seyyîd Qasem, *Daftar-e romuz-e yarestan, (Ganjineh-ye sultan sehak, ehl-e haqq)*, Tehran: Rasti, 1350 h.: Doureh-ye zolal-zolal, r. 71; Ceyhunabadi, Haqq ol-heqayeq., rr. 400-404, vgz., Hamzeh'ee, *h.b.*, r. 173, ji bo heman çîrokê bnr. Vali, *h.b.*, r. 138-139

<sup>84</sup> Adak, Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Nûbihar, Stenbol, 2013, r. 118

fonemîk ava kiriye di nav axivêrên herêmên wek Kelhûrî, Hewramî, Lakî û Lorî de.<sup>85</sup> Her wiha, wisa diyar dike ku li gorî Joyce Blau goranî zimanê herî girîng ê metnên yarsanî ye.<sup>86</sup>

Gotinên pîroz ên Xwedê, ferîşte û pîran wek *kelam* têne binavkirin, her wiha yên ku *kelam* dibêjin jî wek "yên xwedî kelam" têne zanîn. Li gorî Ziba Mir-Hosseini ku diyar dike, *kelam* bi awayekî îlahî derketine û "gotinên pîroz" in ku nifş bi nifş bi awayekî devkî belav bûne.<sup>87</sup> Her wiha, Mir-Hosseini dîsa diyar dike ku *kelam* "gotinên pîroz" in ku mirov dikare di wan de dîrok, kok û sedemên ayînên veşartî bibîne, bi kurtasî mirov dikare *sedema bûyînê* bibîne.<sup>88</sup> Edebiyata kurmancan jî bi awayekî devkî dest pê kiriye û bi saya vê edebiyata devkî, kurmancî hebûna xwe parastîye. Edebiyata devkî ya kurmancan wek "kilam" tê zanîn û yên ku kilaman dibêjin jî wek "dengbêj" têne zanîn. Bi rêya van kilaman evîn, qehremanî, şer û hwd. dihat zimên û ev dengbêj çavkaniyên zindî bûn lewre di wan deman de kilam bi awayekî nivîskî nehatine qeydkirin û wekî çanda yarsanan nifş bi nifş bi awayekî devkî belav bûne.

Wek me got, edebiyata yarsanan bi devkî dest pê kiriye û nifş bi nifş bi vî awayî belav bûye. Kalamên pîroz heta serdema Sultan Sehak nehatine qeydkirin. Lê di serdema Sultan Sehak de, bi emrê wî, Pîr Mûsiyê ku nivîsevanê Sultan e, hemû kalamên serdema xwe û serdemên berê di *defterê* de tomar kirine. Ji ber vê ye ku li ser dîroka destpêka van kelaman tu agahî tune. Li gorî Mokri, sedema qeydnekirina van kelaman ew e ku, ev gotin pîroziya xwe wenda nekin.<sup>89</sup> Adak vê xweparastina yarsanan a ji biyaniyan wiha vedibêje: "*Kurdiya goranî zimanê dînî yê yarsanê ye û*

<sup>85</sup> Chaman Ara, Behrooz, *The Kurdish Sâhnâmâ and Its Literary and Religious Implications*, Copyright, Behrooz Chaman Ara, 2015, rr. 51-53

<sup>86</sup> Blau, Joyce, "Written Kurdish literature", *Oral literature of Iranian languages*, Philip G. Kreyenbroek and Ulrich Marzolph (eds.), London: I.B. Tauris&Co Ltd, 2010, r. 7, vgz., Ara, Behrooz Chaman, *h.b.*, r. 53

<sup>87</sup> Mir-Hosseini, Ziba, "Inner Truth Outer History: The Two Worlds of the Ahl-i Haqq of Kurdistan", in *International Journal of Middle East Studies*, Vol. 26, no. 2, (May, 1994), Cambridge University Press, 2014, r.268

<sup>88</sup> Mir-Hosseini, Ziba, "Redefining the Truth: Ahl-i Haqq and the Islamic Republic of Iran", in *British Journal of Middle Eastern Studies*, Vol. 21, no., 2 (1994), published by: Taylor&Francis, Ltd., 2014, r. 213

<sup>89</sup> Mokri, *La Grande Assemblée Des Fidèles de Vérité au tribunal sur le Mont Zagros en Iran (Dawra-y Dîwâna Gawra)*, *Livre Sacré et Inédit en Gourani Ancien, Texte Critique, Traduction, Introduction et Commentaires avec des Notes Linguistiques et Glossaire, Etudes d'Hérésiologie Islamique et de Thèmes Mythico-Religieux Iraniens*, Librairie Klincksieck, Paris, 1977, r. 16

*bîr û baweriyên yarsanê bi nezmê hatine îfadekirin. Ji ber vê jî diyalogên edebiyata kurdiya goranî di navbera, pîr/mezinên dînî yên baweriya yarsanê de çêbûne û diyalogên wan jî dînî ne. Li gorî nêrînekê ji ber ku ji aliyê sîstema siyasî ya dewleta Ebbasiyan ve bi çavekî baş li pêgirtiyên yarsanê nedihate nêrîn, yarsaniyan dua û nêrînen xwe yên dînî ne bi erebî, bi goranî îfade kirine, da ku bikaribin nêrîn û baweriyên xwe veşêrin.*"<sup>90</sup> Di vê rewşê de dibe ku bi demê re hin ji kelimên wan wenda bibin jî. Ev kelam di *Cema perestîna xwarinê* de, di taziyeyan de an jî di cejnan de têne gotin. Melodiyeke van kelaman heye, heta piraniya wan bi tenbûrê re têne gotin. Kelamên yarsanan bi gelemperî bi goranî hatine gotin, lê yên soranî û farsî jî hebûne. Di nav van kelaman de temayên wek fikr, bawerî û çanda yarsanan heye. Li gorî Valî Şewaza wan a helbestî ji ya edebiyata farisî ne pir dûr e û ev îlahî bi awayekî estetîk xweîfadekirina wan e.<sup>91</sup> Her wiha modeleke van kelaman tune. Dikarin ji beytekê, ji sê rêzikan, ji çarînan an jî kelamên pir dirêj pêk bên. Armanca van kelaman ne ew e ku helbest bê afirandin an jî edebiyateke helbestan bê çêkirin, ji ber vê beytek tenê jî bes e ji bo kesek bibe pîroz. Kelamên yarsanan hem bi awayekî monolog hatine gotin ku hest û baweriya xwe anîne zimên, hem jî bi awayekî diyalog hatine gotin ku wek axaftina bi kesên din re hestên xwe anîne zimên.

Divê em eşkere bikin ku di kelimên yarsanan de têgeha wextî tune. Di kelamekê de, yê ku kelamê dibêje, dikare di heman demê de hem behsa paşerojê, hem behsa niha hem jî behsa pêşerojê bike. Her wiha dikare behsa dînen xwe bike ku di demên cuda de û li cihên cuda xuya bûye.

Weku me li jor got, kelamên yarsanan ji aliyê Pîr Mûsî ve di *defteran* de hatine tomarkirin û di van *defteran* de gotinên pîroz ên Xwedê, ferîşte, pîr û kesên pîroz hatine qeydkirin. Heke em li ser pênaseya *defterê* bisekinin em ê berê xwe bidin gotara Shahab Valî ya bi navê "Yarsan ve Ezidi Kürtlerinin Yazılı Edebiyatı" ku wiha nîşan kiriye, ji ber dîne wan dîroka yarsanan li gorî tecelliya Xwedê û

---

<sup>90</sup> Adak, *h.b.*, r. 120

<sup>91</sup> Valî, "La littérature religieuse des Kurdes Yarsan", di *Etudes Kurdes no 11: La Littérature Kurde* de, Ed. Harmattan, Paris, mars 2012, r. 57

ferîştayên wan wek serdem têne veqetandin. Di her serdemê de *kelamên pîroz têne gotin û cihê ku ev kelimên pîroz têne nivîsîn wek defter tê binavkirin.*<sup>92</sup>

### 1.3.1. Serdemên Edebiyata Yarsanî

Yekemîn *deftera* ku kelimên pîroz tê de hatine komkirin *defter-e dewrey-e Behlûl* (*deftera serdema Behlûl*) e. Di vê *defterê* de kelimên Behlûl, Baba Lorê, Baba Receb, Baba Hatem û Baba Nocum hene.

Serdema duyemîn a kelaman serdema Baba Serheng e û wek *defter-e dewrey-e Baba Serheng* tê binavkirin. Di vê *defterê* de îlahiyên Baba Serheng, Baba Ruhtâf, Qelem, Rûm, Xunkar, Yarenc, Neva, Qeysar, Gerçek, Sebûra, Tebrîz û Serenc hene.<sup>93</sup>

Serdema sêyemîn a berheviya kelaman ya Şah Xoşîn û ferîştayên wî ne. Her wiha wisa tê diyarkirin ku helbestên Baba Tahir Hemedanî jî di vê serdemê de, di nav edebiyata pîroz a yarsanan de xuya bûne.<sup>94</sup>

Deftera serdema Sultan Sehak wek *Defterê Perdîwerî, Dîwana Gewre, Kelamê Xezîne* an jî wek *Namayê Serencam* tê binavkirin. Taybetiya vê serdemê ew e ku ji kevneşopiya edebiyata devkî derbasbûna edebiyata nivîskî ye. Pîr Mûsiyê nivîsevanê Sultan Sehak, di vê serdemê de her tiştê serdema xwe û serdemên berê tomar kirine. Ev *defter* jî beşên cihê pêk tê, her wiha gelek lehengên yarsanî yê dîrokî tê de cih digrin. Di vê *defterê* de beşên wek "Barge Barge, Dewreyê Heftewane, Gelîm wa Kûl, Dewreyê Çiltan, Defterê Abidîn, Xurdê Serencam" hene.<sup>95</sup>

Kelimên *Barge Barge* ew e ku ji aliyê heftê û du pîran ve heftê du kelam hatine gotin. *Barge Barge* beşa herî girîng a *Defterê Perdîwerî* ye û bi zaravayê

<sup>92</sup> Vali, Shahab, "Yarsan ve Yezidi Kürtlerin Yazılı Edebiyatı", *Kürt Tarihi*, sayı 11, Şubat-Mart 2014, r.

32

<sup>93</sup> Vali, Shahab, "La littérature religieuse des Kurdes Yarsan", r. 59

<sup>94</sup> h.b.

<sup>95</sup> Vali, *Les Yârsâns, Aspects Mythologiques-Aspects Doctrinaux*, r. 73



goranî hatiye nivîsîn. Ev behsa heftê û du bedenên îlahî dike ku li herêmên cihê xuya bûne.<sup>96</sup>

*Dewreyê Çiltan* behsa ronahî û tariyê dike. Li gorî vê beşa *Defterê Perdîwerî* dinya ji ronahî û tariyê pêk hatiye. Beriya afirandina dinya, roj, heyv û stêrkan, du kevir hebûne ku yek ji wan ronahî û yê din jî tarî bûye. Ev her du dijberî hev bûne û şer kirine. Xwedê ji ronahiya xwe çil ronahî (çiltan) afirandiye ji bo ku tariyê têk bibe.<sup>97</sup>

Di nav van beşên kelaman de ya herî dawî *deftera* "Yerî Tanî" an jî *deftera* 36an e. Ev 36 kesên xwediyê kelam, murîdên Axa Seyîd Braka ne ku di sed sala 18mîn de xuya bûne. Serdema "Yerî Tanî" serdema edebî ya herî bilind û girîng e di dîroka yarsanan de. Di van kelaman de doktrîna yarsanan hatiye ravekirin û şîrovekirin.<sup>98</sup> Li gorî P. Hooshmandrad di serdema Axa Seyid Braka de sih û şeş kitab hene, lê belê di kevanekê de nîşan daye ku esas sih û heft heb in.<sup>99</sup> Her çiqas hejmara wan sih û heft be jî wek serdema sih û şeş şairan tê zanîn. Her wiha Hooshmandrad ew wek "kitab" nîşan dane, lê Vali vê yekê wek sih û şeş "xwediyê kelaman" nîşan daye.<sup>100</sup>

Weku Hooshmandrad nîşan dide di van metnên pîroz de astronomî, qereqterên rastî û mîtolojî yên însan û ajalan, beşên bedena mirov, qereqterên mirovên rastî û mîtolojîk ên mîtolojiya Îranê, amûrên çandiniyê, lîstik, pêkanînen muzîkê, deng û reqs, hejmar û tîpên elfabeyê, amûrên muzîkê, reng, kulîlk, dar, fêkî, bêhnên xweş, giya û îbadetên dînî tene pêşkêşkirin.<sup>101</sup>

Her wiha li gorî Adak, naveroka babetên edebiyata yarsanî ev in: ravekirina bawerî, felsefe û doktrîna yarsanê, ravekirina têgehên taybet bi yarsanî re eleqedar yên wek tecellî, dînadûn û zat, şeş ferîşteyên baweriya yarsanê, ravekirina qonaxa qiyametê, mîtolojiya kurdî, dînê zerdeştîyê û baweriyên dînî yên berî îslamê, şer û

<sup>96</sup> *h.b.*

<sup>97</sup> *h.b.*

<sup>98</sup> Vali, *Les Yârsâns, Aspects Mythologiques-Aspects Doctrinaux*, r.74

<sup>99</sup> Hooshmandrad, Partow, "Ayinsel olarak hayat: Guran bölgesindeki Kürt Ehli Hak'ın ibadet uygulamaları", di *Kürdistan'da Dini Azınlıklar*" de, r. 112

<sup>100</sup> bnr. Vali, "La littérature religieuse des Kurdes Yarsan", r.61

<sup>101</sup> Hooshmandrad, *h.b.*, r. 106

cengê di navbera ronahî û tarîtiyê de, pêşbînî, dîroka dînê îslamê, bi taybetî jî mezhebê şî'itîyê.<sup>102</sup>

Li gorî Vali mijarên sereke yên kelimên yarsanan ev in: doktrîn û fikrên kevneşopîya yarsanan, ravekirina xuyabûna hebûna îlahî, ferîştenasî, adetên vê kevneşopiyê, mîtoloji û figurên mîtolojîk ên cîhana îranî, destanên cîhana îranî, zerduştî, figur û doktrînen wê, û hwd.<sup>103</sup>

#### 1.4. LI CEM YARSANAN GIRÎNGIYA MUZÎKÊ Û TENBÛRVANÊN JIN

Deng û muzîka yarsanan bi piranî ji tezahurên *Heften* ên curbicur tê afirandin û ev deng û muzîk hebûna îlahî nîşan didin. Têkiliyêke taybet a dengên "pîroz" bi Dawud re û bi gelemperî bi hemû endamên *Heften* re heye. Ji ber vê muzîk û îcrakirina muzîkê di jiyana dînî û rojane ya yarsanan de xwedî cihêkî pir girîng e.<sup>104</sup>

Muzîka kevneşopî ya yarsanan bi tenbûrê re tê îcrakirin. Îro ev amûr bi organolojiya xwe û bi repertuara xwe ya muzîkê wek amûra pîroz a yarsanan tê dîtin. Her çiqas di lêkolînên dîrokî de amûrên ku dişibin tenbûrê hebin jî, tenbûr bêyî koka wê ya fîzîkî û dîrokî ji bo yarsanan wekî fikreke bê wext û mutleq e.<sup>105</sup>

Tenbûr îfadekirina aliyên cihê yên dînê yarsanan e. Di sazkirina *Cemê* de tenbûr wek *cem-neşîn* ango ya ku tevî *Cemê* dibe tê hesibandin. Li gorî pênaseya Philip G. Kreyenbroek, *Cem* cihê kombûna ji bo ayînên dînî ye, li wir dua têne kirin û *kelam* xwedî roleke mezin in<sup>106</sup>, her wiha piraniya van *kelaman* jî bi tenbûrê re têne gotin. Bê guman, li her *Cemê* cihê tenbûrê heye, bê lêxistin an jî neyê lêxistin dîsa jî para wê ya xwarina pîrozkirî tê dayîn. Ji ber vê tenbûr wek îkoneke pîroz tê dîtin û li cihên taybet ên xaniyan tê aliqandin. Wexta yek tê dîwanê beriya ku destê yekî maç

<sup>102</sup> Adak, *h.b.*, r. 121

<sup>103</sup> Vali, *Les Yârsâns, Aspects Mythologiques-Aspects Doctrinaux*, r. 75

<sup>104</sup> Hooshmandrad, *h.b.*, r. 107

<sup>105</sup> Hooshmandrad, *Performing the Belief: Sacred Musical Practices of the Kurdish Ahl-i Haqq of Gûrân*, Doktora Tezi, Berkeley Kaliforniya Üniversitesi, 2004, s. 3, vgz., Hooshmandrad, *h.b.*, r. 108

<sup>106</sup> Kreyenbroek, Philip G., "Religion and Religions in Kurdistan", in *Kurdish Culture and Identity*, edited by, Philip Kreyenbroek&Christine Allison, Zed Books Ltd, London and New Jersey, USA, 1996, r.102

bike ewil diçe tenbûrê maç dike û ev nîşaneyê rêzgirtina wî kesî ya li hemberî tenbûrê ye.<sup>107</sup>

Du têlên tenbûra resen a yarsanan heye. Yek ji van têlan ji bo melodyê ya din jî bi piranî ji bo yekdengî tê bikaranîn. Lê belê îro sê têlên tenbûrê hene. Du têl bi hev re ji bo melodyê tèn bikaranîn, dîsa ya din jî ji bo yekdengî tê bikaranîn. Sêzdeh perdeyên tenbûra kevn hebûn lê niha çardeh perde hene û navbera perdeyan nîv-perdeyî ne. Du akordên bingehîn hene; *kûkê heft* (eyara heft) û *kûkê pênc* (eyara pênc).<sup>108</sup> Lê yarsan van eyarên tenbûrê wek *kûkê berz* û *kûkê terz* bi nav dikin.

Her pîvana muzîkê wek *nazim* an jî *meqam* tê binavkirin li cem yarsanan. Her nazim li civînên ne fermî (lê belê bi rêzgirtinî) dikare bê îcrakirin. Lê nazimên solo û komî yên pîroz ancax li rûniştinên *kelam* û *ceman* dikare bê îcrakirin. Yê ku naziman dixwîne wek *kelam-xwan* tê binavkirin. Kesê ku naziman dixwîne jî dikare tenbûrê lêxe û dikare naziman bi tenbûrê re bêje.<sup>109</sup>

Yarsan wisa bawer dikin ku di serdema Şah Xoşîn de repertuara muzîkê derketiye holê.<sup>110</sup> Vali jî vê agahiyê bi gotina S. K. Alînejad piştrast dike û dibêje ku Şah Xoşîn yekemîn kes e ku tenbûr wekî amûreke pîroz girtiye destê xwe û tevli kalamên pîroz bûye di dema *Cemê* de. Li gorî kevneşopiyê, Şah Xoşîn merasîmeke mezin a manewî li dar xistiye. Alîgirên xwe kiriye nehse kom, ji bo ku li muzîkê bidin. Wî ji bo xwe û ji bo wan nehse kesên ku herî bi huner in tenbûr hilbijartiye. Ji ber vê ev amûr wekî "*Sazê Şah Xoşîn*" tê binavkirin.<sup>111</sup> Teymûr Banyaranî di kelameke xwe de wiha behsa *nehse nehse* dike:

Teymûr meremû:

Teymûr vat Zat dîm

<sup>107</sup> Hooshmandrad, *h.b.*, rr. 108-109

<sup>108</sup> Hooshmandrad, *Performing the Belief: Sacred Musical Practices of the Kurdish Ahl-i Haqq of Gûrân*, s. 41-85, PC, FARMÂNÎ, O.A, Gahwâra, 2003, vgz., Hooshmandrad, *h.b.*, r. 109

<sup>109</sup> Hooshmandrad, *h.b.*, rr. 110-111

<sup>110</sup> *h.b.*, r. 120

<sup>111</sup> Alînejad, S.K., *Tenbûr Ez Dîrbaz ta Konûn*, Entesaratê Danêş ve Fen. Tehran, 1376/1997, p. 240, vgz., Vali, *h.b.*, r. 45

Zatê bê zewal zeberdest Zat dîm  
Destê Yedullah<sup>112</sup> ejder necat dîm  
Bangê binçîne axir selat dîm  
Herhereyê heyhat cihan gişt Cem dîm  
Sercûxeyê Sultanê sahibkerem dîm  
Xoşînê xweşnam Şayê xweşsuwar dîm  
Zikrê zuwanim çen dîdedar dîm  
We çen meqamat bezmê teyar dîm  
Nehsed nehsede hezar hezar dîm<sup>113</sup>

*(Teymûr dibêje:*

*Teymûr got min Zat dît*

*Min zatê bê zewal ê zeberdest<sup>114</sup> dît*

*Min di destê wek ejder ê Yedullah de rizgarî dît*

*Min dengê bingeha selatê axir dît*

*Min dît dinya hemû bibû Cem*

*Min serê koma Sultanê sahibkerem dît*

*Min Xoşînê xweşnav Şahê xweşsuwar dît*

*Zimanê min zikr kir min gelek dîdedar dît*

*Min çend meqam û şahiyê pak dît*

*Min nehsede nehsede hezar hezarî dît)*

Şah Xoşîn beriya ku *dûnê* xwe biguherîne, ji ferîşteyên xwe re roja xwe ya vegeê wiha rave dike: "Hûn ê bigerin û li cihê ku we dengê tenbûra min seh kir, hûn

<sup>112</sup> Lakaba Hz. Elî ye.

<sup>113</sup> *Kelamê Hezretê Şah Teymûr*, amd. Seyîd Mehrdad Muşşei û Seyîd Daryûş Mîrebevgî, çapnebûyî, r. 53

<sup>114</sup> "zeberdest" yê ku li ser her tiştî ye

ê fam bikin ku ez ê li wir zuhûr bikim." Li gorî kevneşopiya yarsanan ferîşte demeke dirêj (yanî 100 sal) digerin û nîşana ku Şah Xoşîn daye, li nav eşîra Cafan, li mala Şêrxan dibînin. Li wir dengê tenbûra Şah Xoşîn seh dîkin û fam dîkin ku dê Xwedê wek Baba Nawis li wir zuhûr bike. Ehmed di kelamekê xwe de behsa nîşana Şah Xoşîn dike:

Ehmed meremû:

Yaran ew nîşan

Yaran guwahiyê beyan ew nîşan

Kukê tenbûr ama we zuwan

We'deyê Xoşînin yaneyê Şêrxan<sup>115</sup>

*(Ehmed meremû:*

*Yaran wê nîşanê*

*Yaran qebûl bikin wê nîşanê*

*Eyara tenbûr hate zimên*

*Li mala Şêrxan wadeya Xoşîn e)*

Di çanda yarsanan de her kes dikare li tenbûrê bide, yanî ji kesên kal heta ciwan û zarokan, her wiha jin jî dikarin li tenbûrê bidin. Heta di nav tenbûrvanên jin de yên pir mezin jî hebûne, wekî mînak Reyhan Xanim Loristanî tenbûrvanek girîng bûye û yek ji nêzîkên Şah Xoşîn bûye. Dayê Xezan Sergetî di serî de sunnî bûye lê piştî bûye yarsan û tenbûrvanek mezin. Her wiha Nêrgiz Xanim Şahrizûrî jî berê sunnî bûye û piştî ku bûye yarsan ew jî bûye tenbûrvanek mezin. Xatûn Zer Banû Derziyanî jî hem tenbûrvan û hem jî xwedî kelaman bû.

---

<sup>115</sup> *Deftêrê Perdîwerî*, Nusxeya Xetî ya 'Elîmîr Derwîşî, çapnebûyî, r. 42

## BEŞA DUYEM

### HELBESTVANÊN JIN ÊN YARSANÎ

#### 2.1. STATUYA JINÊN YARSANÎ

Çand û jiyana kurd û Kurdistanê bala gerok û oryantallistan kişandiye û di gelek pirtûk û maqaleyên xwe de cih danê vê cihanê. Wexta ku wan behsa kurdan kiriye di van xebatên xwe de, helbet jiyana jinên kurd jî bala wan kişandiye û li ser wan jî nivîsîne. Li ser kar û bar, cil û berg, statu û rewşa wan a wekhevîyê sekinîne di xebatên xwe de.

Nêrînên van oryantallistan hema hema wekhev in wexta ku em nivîsên wan dixwînin. Li gorî Wadie Jwadih diyar dike, Soane dibêje hevparîyeke girîng heye ji aliyê kar ve di nav jin û mêran de. Mêr diçin li zeviyê dixebitin, li heywanan dinêrin, titûn diçînin, jin jî fêkî û titûnan hişk dikin, xalî radiçînin an jî karê malê dikin.<sup>116</sup>

Li gorî Kurdologê frensî Thomas Bois jî hevparîyeke girîng heye di jiyana jin û mêrên kurd de, weku diyar dike wexta ku mêr bi heywanan re eleqedar dibe, jin jî bi şîrê wan heywanan re penîr û rûn çêdike.<sup>117</sup>

Nêrînên Ergani Madenli Y.C. jî ji yên van oryantallistan ne cuda ne ku dibêje:

*"Li Kurdistanê nêvîyê karan aîdê jinan e. Jin tevî karê xwe yê malê, çandiniyê dike û bi mêrê xwe re bêyî rawestin dixebite, karên herî giran dike. Jina kurd ji bo fîrotina dexil û êzîngên xwe bi saetan dimeşe bi tena serê xwe. Tê bajêr, bi awayekî azad bazariya xwe dike, malê xwe difroşe, karên xwe dike û dîsa bi awayekî paqij û serbest vedigere gundê xwe."<sup>118</sup>*

Bi qasî ku em ji nêrînên oryantallistan pê derdixin statuya jina kurd li gorî jinên ereb, fars û tirk çêtir e, ji aliyê hal û tevgerên xwe ve ji wan azadtir e. Xwedî li mal, zarok, kar û aboriya xwe derdikeve. Di gelek rewşên wek dîn, polîtîka, kar,

---

<sup>116</sup> Soane, E. B., "The Southern Kurd", *Journal of the Central Asian Society*, IX, Part I (1922), rr. 44-45, vgz. Jwaideh, Wadie, *The Kurdish Nationalist Movement: Its Origins and Development*, Syracuse University Press, Newyork, 2006, r. 43

<sup>117</sup> Bois, Thomas, *The Kurds*, Khayats, Beirut, 1966, r. 23

<sup>118</sup> Ergani Madenli Y.C., "Kürtlerde Kadın Meselesi", di *Rojî Kurd* de, İstanbul, 2013, r. 307

mafê zewac û veqetînê de bi mêran re wekhev tê dîtin. Li gorî ku H. H. Hansen diyar dike, Rambout jî li ser vê wekhevîyê disekine û li gorî ku dibêje li cem kurdan jin bi mêran re wekhev têne dîtin.<sup>119</sup>

Ergani Madenli Y. C. cih dide girîngiya azadiya jinê jî:

*"Em wisa dizanin ku li hemû alema osmaniyan "jin" ji aliyê madî û manewî ve di rewşeke pir xirab de ye. Mêrên me ji serî heta binî di nav cehaleteke pir mezin de ne. Jinên me jî bûnê qurbanê vê xurûra cahilî ya mêran, ji ber vê jî hem cahil hem jî guneh in. Cih û girîngiya jinê nehat famkirin. Bi vî awayî şûna ku malbat binyatekî xurt ava bikin, bûne çavkaniya bêaxlaqî û hilweşînên takekesî û civakî. Malbata kurd jî bê guman ji vê nexweşiyê derba xwe xwariye û zerar dîtiye. Wekî her kesî ew jî muhtacê başkirina vê nexweşiyê ye."*<sup>120</sup>

Ji bo çareserkirina pirsgerêka jina kurd nîşan dide ku divê dayîkên kurd perwerde bibin û hin şîretan li ciwanên kurd jî dike di vê meselê de:

*"Tiştê kêr terbiye û ilma li gorî serdemê ye. Heke ev tişt jî bi jina kurd bêne dayîn, yanî qereqtera wan a hêzdar bi perwerdehî û ilmê bê xemilandin, di civaka kurdan de çareserîya pirsgerêka jina kurd dê gelek hêsan bibe. (...) Xort divê fam bikin ku meseleyên jin û malbatî meseleyên pir girîng in. Beriya her tiştî divê çareserîyek bibîne ji bo raseriya jinê. Ji civakê re çawa ku zad lazim be, ew qas jî dayîkên xwedî hişmendî û aqil lazim e, divê ev tişt bê zanîn: 'Jinên miletekî pîvana pêşketinê ye.' dibêje û şîretên wî bi vî awayî berdewam dibin: "Ciwanên kurd divê her tim zanibin ku pêşveçûna millet û însanan bi pêşketina jinan re girêdayî ye û divê ev tişt neyê jibîrkin."*<sup>121</sup>

Ev nêrîn bi gelemperî li ser jinên kurd in. Lê belê ji ber ku armanca me ya vê xebatê jinên yarsanî û kelimên wan e, em ê bêtir cih bidin rewşa jinên yarsanî. Jinên yarsanî ji ber bawerîya xwe, li gorî jinên misilman xwedî jiyaneke azadtir in. Dikarin kelaman bêjin, li tenbûrê bidin û biçin Cemê. Lê her çiqas biçin Cemê jî nikarin li wir

<sup>119</sup> Rambout 1947, 17 -Cf. Dickson 1910, 364, vgz., Hansen, Henny Harald, *The Kurdish Woman's Life*, Nationalmuseet-Kobenhavn, 1961, r. 7

<sup>120</sup> Ergani Madenli Y. C., h.b., r. 306

<sup>121</sup> h.b., r. 307

*kelam* bêjin. Weku me diyar kir, li gorî baweriya yarsanan jiyana mirovan li ser *dûnadûnê* ava bûye, yanî piştî mirina kesekî, ruh dikare di bedena yekî din de xuya bibe. Ji ber vê baweriyê, ruh heke ji bedena mêrekî derketibe dikare têkeve bedena jinekê, berevajê vê jî mimkun e. Ev taybetiya *dûnadûnê* dihêle ku jin û mêr di baweriya yarsanan de wekhev bêne dîtin. Her wiha ji ber ku zayenda berê ya kesekî nayê zanîn, dikare bê gotin ku li cem yarsanan girîngiya zayendê tune.

Di kevneşopiya yarsanan de keç û kur wekhev têne dîtin û Sultan Şehak di kelameke xwe de cih dide wekheviya keç û kuran jî. Li gorî wî di navbera keç û kuran de tu cudahî tune. Sultan diya xwe, Xatûn Dayrak, wek diya hemû keç û kuran dibîne. Wiha jî diyar dike kesê ku cudahî têxe navbera keç û kuran, di dawiya dinyayê de ew ê tiştên ne xweş bê serê wî, yanî bi şûrê tûj dê serê wî bê jêkirin:

Sultan meremû:

Kenaçe û kurî

Tewfirêşan nîyen kenaçe û kurî

Beşê Sultanin ezel hewerî

Xatûne Dayrak î beşîş xirî

Pûşakê Yarî ew balaş birî

Bîyawê dayan pûran û hurî

Her kesî biwaçû kenaçe û kurî

Meweziş we dem mewdayê key birî<sup>122</sup>

*(Sultan dibêje:*

*Keç û kur*

*Cudahiya keç û kuran tune*

*Ew diyariyê ezelî yê Sultan in*

---

<sup>122</sup> Tahîrî, Teyyîb, *Tarîx we Felsefeyê Serencam*, Dezgayê Tojînewe û Belavkirdinewey Mukriyanî, Hewlêr, 2009, r. 206



*Xatûnê Dayrak berpirsiyara vê çemberê ye*

*Wê dirû cilê Yarî*

*Bû dayîka kur û keçan*

*Her kesê ku bêje kur û keç*

*Dawiyê ew ê bê avêtin ber devê şûrê tûj)*

Weku me di beşa yekem de behs kir, kelim xwedî girîngiyê pir mezin e li cem yarsanan. Kelam ji aliyê Xwedê, ferîşte û pîran ve ji bo kesayetên mezin tên û ev kesayet jî van kelaman dibêjin. Li cem yarsanan kesên ku xwedî van kelaman in ne tenê mêr in, yên jin jî hene ku xwedî kelam in û ji ber vê ye ku jin di çanda yarsanan de xwedî statuyê girîng in.

Di kevneşopiya yarsanan de her çiqas me behsa wekheviya jin û mêran kiribe jî helbet hin îstîsna hene. Jinên yarsan di xwendina kelaman de azad in, lê belê li ayînên dînî, ango li *Cemxaneyê* nikarin tevî *Cemê* bibin. Lê li dijî vê, xwarina ku li *Cemê* tê belavkirin, ji bo her kesî wekhev tê parvekirin, jin jî tê de.

Cemxane cihê îbadetê ye û cihêkî pîroz e ji bo yarsanan. Tevî jinan, her kes dikare biçe *Cemê* û baweriya xwe pêk bîne. Lê belê cihê rûniştinê li gorî jin û mêran, heta li gorî zarok û xortan hatiye veqetandin. Yanî her kes nikare li gorî serê xwe biçe û li derekê rûne. Bi taybetî jî jin û mêr nikarin li ba hev rûnin. Li gorî yarsanan mêr li cihê pêşî rûdinin, zarok û jin jî li pişt wan rûdinin. Yanî ne mimkun e ku jin û zarok di rêza mêran de rûnin. Cihê rûniştinê ya li *Cemê*, di kelaman de jî derbas dibe û Sultan Şihak di kelameke xwe de diyar dike ku li *Cemxaneyê* cihê jin û zarokan li pişt e, xort û mêr jî li pêşiyê rûdinin:

Sultan meremû:

Cemxane ve piştin cemxane ve piştin

Perî jinana cemxane ve piştin

Zaro jinê nowa be yek hemnişîn  
Lamî û nêraniş bo ne pişt giştin<sup>123</sup>

*(Sultan dibêje:  
Cemxane li pişt e Cemxane li pişt e  
Ji bo jinan Cemxane li pişt e  
Zarok û jin bi hev re rûdinin  
Li pişt xort û mêran rûdinin)*

Sultan Sehak di kelameke xwe ya din de jî cih daye *Cemê* û rêza rûniştina zarok, xort, jin û mêran nîşan kiriye. Sultan Sehak diyar kiriye ku divê her kes li gorî rêbaza *Cemê* rûne û divê jin û mêr tevî hev nebin û bi hev re rûnenin. Her wiha behsa belavkirina xwarina *Cemê* jî dike. Li gorî Sultan divê xwarin ewil ji bo mêran bê dayîn, piştî wan ji bo xortan bê dayîn û piştî xortan jî divê ji bo jin û zarokan bê dayîn. Lê belê divê em li vir diyar bikin ku her xwarin wekhev tê parkirin, yanî ji bo mêr û xortan çî qas bê dayîn, ji bo jin û zarokan jî ew qas xwarin tê dayîn:

Sultan meremû:

Ha lamî û nêran ha lamî û nêran  
Ne piştî qapiyê Cem ha lamî û nêran  
Usa nîş Cemî pey wîşan gîran  
Beşêşan domay mirdanî didan  
Domay î du Cem im car pey jinan  
Perî şan berşû yekreng beş diran  
Zaro û mird ew yek têkel nekiran<sup>124</sup>

---

<sup>123</sup>Hoseynî, S. M., *Dîwana Gewre*, Entesaratê Baqê Nêy, Kermanshah, 1382/2003, r. 27

*(Sultan dibêje:*

*Xort û mêr xort û mêr*

*Li pişt deriyê Cem xort û mêr*

*Wisa rûnin li Cemê cihê bigrin*

*Piştî mêran xwarinê bidin xortan*

*Piştî van her duyan bidin jinan*

*Beşa her kesî wekhev bidin wan*

*Nekin têkilhev zarok û mêran)*

Li ser adabê *Cem*, Xanê Elmas di kelameke xwe de behsa cihê Xwedê û ferîşteyan dike. Li gorî ku diyar dike, gava ku mirov beşdarî *Cem* dibe, Cism (Beden) derdikevin huzûra Sultan û şeş ferîşteyên wî. Xanê Elmas van her şeş ferîşteyan wek taybet û muhterem pênase dike. Weku diyar dike, çar koşeyên *Cemê* ji bo ferîşteyan hatine veqetandin, ev her çar ferîşte li *Cemê* xuya nabin, lê cihê wan diyar e û her kesê ku diçe *Cemê* vî tiştî dizane. Her wiha wisa diyar dike heke kesek karibe yekê ji wan bibîne, tu qudreta wî namîne ku li wir rûne. Cihê jor ê *Cemê* wek cihê Sultan, koşeya rastê wek cihê Binyamîn diyar dike û wisa dide nîşan ku Binyamîn her gav duayan dike. Cihê Dawud diyar dike û dibêje Dawud her dem digihîje hawara gelê xwe. Cihê Pîr Mûsî diyar dike û dibêje ku ew xwediyê tûmaran e, ji ber ku Pîr Mûsî wek nivîsevanê Sultan tê dîtin û her tiştî qeyd dike. Koşeya çepê wek ya Mistefa diyar dike û li gorî baweriya yarsanan Mistefa Azraîl e, ji ber vê Xanê Elmas wî wek bi kîn û qar pênase dike. Taybetiya dîne yarsan ew e ku li *Cemê* cihê sembolîk ê jinekê jî heye û ew cih ya Remzbar e. Remzbar jî li wir wek ferîşte cihê xwe digre û her dem li wir hazir e. Xanê Elmas wexta ku cihê Remzbar ê li *Cemê* diyar dike, dibêje gel ji bo karên xwe divê ji wê rica bikin:

---

<sup>124</sup> h.b.

Xanê Elmas meremû:

Cemnîşînî Cem

Nukteyî bişniwin ji erkanê Cem

Cism ha ve huzûrê Sultan Sercem

Çenî Çwar Cesed xaseyê muhterem

Çwar guşey Cem çenî fewqê Cem

Cagey Yaranin qayibin we çem

Eger je Yaran biwînan we çem

Key qudret darû binîşû we Cem

Fewqe Cem textê qudretê bîm e

Cageyê Sultanim Padişahê Ezîm e

Guşeyê rasê Cem cayê Binyamîn e

Mudam we lawleddem we amîn e

Rustemê sermest yelê pîlten

Sahivê zor û zat gurzê neh sed men<sup>125</sup>

Î guşe cageyê Dawud eyan e

Gîw ê dilawer baş e Keyan e

Feryadresê teng Dawudin Yaran

Amîn newînu xilel je karan

Î guşe cageyê Munşîyê Defterin<sup>126</sup>

Je kul hesavat ew baxever in

Munşî Pîr Mûsî sahvîvtûmarin

Xeyrûşernivîsî ber ta we bar in

Guşeyê çepê Cem baş kemandarin

Yanî Mistefayê pir qîn û qar

<sup>125</sup> "men" pîvana giraniyê ya wê serdemê ye.

<sup>126</sup> Munşîyê Defter yanî Pîr Mûsî, yek ji laqabên wî jî Nivîsevanê Defter e.

Î guşe cagey Xatûn Rezbarin  
Recaçiyê Yaran dest bi kirdarin  
Binîşan we Cem Yaran pey muşkil  
Ewan cayê wîşan nemekin qafil<sup>127</sup>

*(Xanê Elmas dibêje:*

*Yên ku li Cem rûdinin*

*Guhdarî xalekê bikin ji erkanê Cem*

*Cism derdikevin huzûra Sultan*

*Ligel Çar melekên taybet ên muhterem*

*Çar koşeyên Cem û jorê Cem*

*Cihê Yaranên xeyb in ji çav*

*Eger yek Yaran bibîne bi çav*

*Tu qudreta wî dimîne qey li Cem rûne*

*Jorê Cem textê qudreta bi ronahî ye*

*Cihê Sultan Padişahê Ezîm e*

*Koşeya rastê Cem cihê Binyamîn e*

*Her dem dua heye di devê wî de*

*Rustemê sermest lehengek wek fil e*

*Sahibê gurzê nehse men e*

*Ev koşe cihê Dawudê eyan e*

*Gîwê dilawer ji bo Keyan (Şah) baş e*

*Di rojên teng de yê ku tê feryada Yaran Dawud e*

*Kesê ku bêje amîn ji karê xwe kêmasî nabîne*

*Ev koşe cihê Munşiyê Defter e*

---

<sup>127</sup> Xan Elmas, *Dîwân*, nusxeya çapnebûyî ya Seyîd Xelîl 'Alînejad, rr. 10-12

*Ji hemû hesaban ew hayedar e*  
*Munşî Pîr Mûsî sahibê tûmaran e*  
*Xêrûşernûsê hemû erd û behran e*  
*Koşeya çepê Cem ya Kemandar e*  
*Yanî Mistefayê pir kîn û qar*  
*Ev koşe ya Xatûn Rezbar e*  
*Ji bo karên baş ji wê rica bikin*  
*Ji bo muşkilan ey Yaran li Cem rûnin*  
*Ew cihê rûniştinê ne nekin qafil)*

Yek ji mijarên girîng jî "jinên bakîre" ne di baweriya yarsanan de. Li gorî yarsanan her serdemê jinek bakîre hebûye wek Meryem, lê bi qasî em dibînin tenê dayîkên Xwedê û ferîşte yên wek Sultan Sehak, Şah Xoşîn bûne û ev jin zarokên xwe an jî devên xwe anîne, an jî bi awayên din ku ji bo anîna zarokê ne xwezayî ne. Li gorî ku Martin van Bruinessen diyar dike, di van serdeman de jina bakîre her dem eynî jin e, lê zarokê ku tê dinyayê her dem zarokek din e. Carinan Xwedê bi xwe ye carinan jî yek ji ferîşteyên Wî ye.<sup>128</sup>

Wekî mînak, di serdema Şah Fezl de, yanî di serê sedsala 15mîn a P.Z. de, wexta ku Şah Fezl tevî çar ferîşteyên sereke Mansur (el-Hallac), Nesîmî, Zekerîya û Turke çûne gerê pir birçî bûne. Pezek bi navê Barra û Ayîneya yekemîn dayîka bakîre jî li ba wan bûye. Şah Fezl gotiye wî pezî şerjê bikin lê hestiyên wî neşkînin. Her çar ferîşteyan çawa hatiye xwestin wisa kirine û pez şerjê kirine. Piştî xwarinê Şah Fezl ji wan xwestiye ku wan hestiyên bînin û li ber wî kom bikin, ferîşteyan wisa kiriye û Şah Fezl bi awayekî mucîzewî pez dîsa xuliqandiye. Çi qas birçî bûne bi heman awayî pez şerjê kirine û Şah cardin ev pez xuliqandiye. Rojekê Şah Fezl çûye derekê dûr û demeke dirêj nehatiye. Yê din pir birçî bûne û li benda wî mane. Lê her çûye nekarîne bisekinin û biryar dane ku car din pez şerjê bikin, li gorî fikra wan

<sup>128</sup> van Bruinessen, Martin, *Kürtlük, Türklük, Alevîlik - Etnik ve Dinsel Kimlik Mücadeleleri*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2008, r. 177

ew ê jixwe dîsa bixuluqe. Ayîne li hemberî vê fikrê derketiye lê belê guhdarî wê nekirine. Pez şerjê kirine, weku Şah Fezl digot qet hestî neşkandine û piştî xwarinê wan hestî kom kirine ser hev lê belê pez nexuluqiye. Ew jî ji tirsan hestî birine li derekê dûr veşartine. Wexta ku Şah Fezl vegeyriyaye ji wan pirsya pez kiriye û wan jî ji tirsan gotiye ku pez reviyaye. Şah ji vê rewşê bawer nekiriye û bi navê Barra gazî pez kiriye. Lê nêriye ku ji dûr nalîna hestiyên tê. Pir hêrs bûye û jê pirs kiriye:

- Kê bi geriya te girt?

- Turke.

- Kê çermê te jê kir?

- Nesîmî.

- Kê te avête nav agir?

- Mansur.

- Kê goştê te kerî kir?

- Zekerîya.

Li ser vê Şah Fezl xwestiye ku vî tiştî bîne serê her çar rêhevalên xwe. Serê Turke hatiye jêkirin, çermê Nesîmî hatiye gurandin, Mansur di nav agir de hat şewitandin û Zekerîya hat parçekirin. Piştî ku Mansur hat şewitandin xweliya wî li derdorê belav bû û hinek xwelî jî çû ser êzingekî ku di nav çem de kaş dibû. Xweliyê li ser êzing hey kiriye nalîn. Keça mela jî wexta ku çûye ser avê, ev nalîn bihîstiye û fam kiriye ku ev deng ji xweliya ser êzing derdikeve. Şaş maye û devê xwe vekiriye. Çawa ku devê xwe vekiriye ew xwelî firiyaye û çûye ketiye nav devê wê. Piştî demekê fam kirine ku keçik ducanî ye. Nasên wê jê aciz bûne lê belê wexta ku zarok bi awayekî derxwezayî çêbûye ji kerameta wê fam kirine û navê zarok bûye Şems-i Tebrîzî. Ayîne yekemîn jina bakîre ye ku zarok aniye.<sup>129</sup>

Me di beşa jiyana Sultan Şehak de behsa jidayîkbûna wî ya derxwezayî kiribû û em ê di beşa Xatûn Dayrak (Remzbar) de dîsa bi awayekî berfirehtir behsa jiyadîkbûna Sultan bikin. Her wiha Mama Celale bi ronahiya rojê ducanî dibe û ew jî

---

<sup>129</sup> h.b., rr. 179-180

bi awayekî derxwezayî Şah Xoşîn tîne dinyayê.<sup>130</sup> Ji xeynî van me di jiyana Baba Yadîgar de jî behsa jiyadîkbûna wî ya derxwezayî kiribû ka çawa hatiye dinyayê û ji bo ku diya wî neyê sûcdarkirin çawa ji aliyê Sultan Sehak ve ew avêtine nav êgir û çawa bi awayekî saq û silamet ji wî agirî filitiye.

## **2.2. JINÊN YARSAN ÊN XWEDÎ KELAM**

Li gorî doktrîna yarsanan, girîngiya mêrên xwedî kalam û kalamên wan ji aliyê pîrozbûnê ve çî qas zêde be, ya jinan jî ew qas zêde ye. Ji ber vê jî kalamên jinên yarsanan nehatine piştguhkirin û ew jî wek pîroz hatine qebûlkirin. Em ê li vir cih bidin dozdeh kelambêjên jin. Em ê hewl bidin ku li ser jiyana wan agahiyên bidin, li ser kalamên wan bisekinin û rave bikin. Jinên yarsan bi piranî kalamên xwe bi zaravayê goranî gotine, lewre em ê jî bi goranî bidin û di nav kevanekê de jî kurmanciya wan bidin. Ji xeynî zaravayê goranî, Nêrgiz Xanima Şehrezûrî kalamên xwe bi zaravayê soranî gotine.

Kelamên jinên xwedî kalam hem bi awayekî monolog hatine gotin ku hest û fikrên xwe gotine, hem jî wek diyalog hatine gotin ku wek bi yekî re diaxivin. Her wiha di nav van kelaman de yên pir dirêj jî hene, yên ku ji du beytan pêk tên jî hene. Mijara van kelaman bi piranî bawerî ye ku em dikarin tê de bûyerên wek dînadûn, tecellî, hezkirina Xwedê bibînin. Wekî din em dikarin xweza, dîrok, hestên derûnî û jiyane jî bibînin di van kelaman de. Mixabin tunebûna berhemên li ser jiyana jinên yarsanî, nahêle ku em agahiyên berfireh bidin. Em ê bi saya kelaman karibin li ser jiyana û bawerîya jinên yarsanî xwedî fikrekê bibin.

### **2.2.1. Dayê Tebrîzê Hewramî**

Li gorî kevneşopiya yarsanan Dayê Tebrîz di sedsala 10mîn a P.Z. de jiyaye, arifeke ji Hewramanyê ye. Yek ji murîdên Baba Serheng e. Li ser jiyana wê zêde

---

<sup>130</sup> h.b., r. 183



agahî tune. Tê zanîn ku li gorî kevneşopiya yarsanan di sedsala 3mîn de, jin îrşad dikirin. Çend dubeytiyên Dayê Tebrîz heta îro hatine.<sup>131</sup>

Dayê Tebrîz hezkirina xwe ya li hemberî Baba Serheng bi serxweşiya xwe aniyê zimên. Xwe wek ji şahiyê serxweş bûye îfade dike û wisa diyar dike ku nalîna wê ya kêfxweşiyê li her derê belav bûye:

Razin piyalem, razin piyalem

Sersamim ne bezm

Badeyê piyalem yava ve nalim

Çimkî nalekem berz bî ne alem<sup>132</sup>

*(Di qedeha min de sir heye*

*Serxweş im ji şahiyê*

*Qedeha şereba min tije bû*

*Nalîna min li alemê belav bû)*

Li gorî dînê yarsan, kevneşopiyê wek *serseporden* heye ku ev bawerî di maneya teslîmkirina serê xwe de tê bikaranîn. Kesek wexta ku dibe yarsan, divê hemû baweriyên yarsanî qebûl bike, her wiha divê xwe teslîmî vî dînî bike. Li gorî kevneşopiya yarsanan, wexta ku yek dibe yarsan, li ayîna taybet gwîz tê şikîandin. Ev şikandina gwîzê jî sembola *serseporden* e. Hin kes li ser *serseporden* kelimên xwe gotine, yek ji wan jî Dayê Tebrîz e ku di kelama xwe de behsa girîngiya *serseporden* dike. Dayê Tebrîz di vê kelama xwe de kêfxweşiya xwe ya teslîmkirina serî tîne zimên:

---

<sup>131</sup> D.N.Y. r. 62

<sup>132</sup> h.b.

Zil keran rewşen zil keran rewşen  
Yaran li xore zil keran rewşen  
Sersepordeban ve yarî weşin  
Bisazin perî wîtan yew cewşen<sup>133</sup>

*(Dilê min ronî bûye*

*Ey yar dilê min li ber tav ronî bûye*

*Serê xwe ji bo yar dayîn xweş e*

*Ew cewşenbûn xweparastin e)*

### **2.2.2. Celale Xatûn Loristanî (Mama Celale)**

Li gorî kevneşopiya yarsanan Mama Celale di sedsala 11mîn a P.Z. de li Loristanê hatiye dinyayê û *dûnê* xwe li wir guhertiye. Mama Celale keça Mîrza Emanollah e û diya Şah Xoşîn e. Wexta ku Şah Xoşîn tîne dinyayê bi awayekî bakîre tîne. Gora Mama Celale ya sembolîk îro li nêzikê bajarê Xoremabada Loristanê ye. Mama Celale wek jineke mezin a xwedî kalam tê zanîn.<sup>134</sup>

Li gorî baweriya yarsanan di serdema Şah Xoşîn de, Xwedê wek tecelliya nû dikeve bedena Celale û Celale Xatûn bi vê tecelliya nûranî, ducanî dibe. Celale Xatûn ji aliyê bavê xwe ve tê sûcdarkirin, lewre bavê wê wisa difikire ku keça wî zîna kiriye. Wexta ku eşîreta wan koç dike, wê li serê çiyê dihêlin û naxwazin tev xwe bibin. Celale li ser wî çiyayî tenê dimîne û ditirse, ji ber vê jî dest bi girînê dike. Wê demê Kaka Reyayê ku yek ji ferîşteyên wê demê ye û li benda zuhûrkirina Şah Xoşîn e, girîn û qêrîna Celale dibihîze, îşareta Xwedê dibîne û diçe cem wê. Jê re behsa hatina xwe dike ku dibêje dengê wê ji dûr ve bihistiye. Her wiha behsa barê wê

---

<sup>133</sup> *h.b.*, r. 63

<sup>134</sup> *h.b.*

jî dike û wê barê wek Xaliq bi nav dike. Dibêje barê wê ew qas mezin e ku çiyayê Gawê jî nikare hilgire:<sup>135</sup>

Kaka Reya meremû:

Çe mile Gawe serim bird ew diyar  
Dîm gewre kenaçe mendin çe hawar  
Çemiş yekî bî esrîniş hezar  
Bariş Xaliq bî Gawiş nemîbird bar<sup>136</sup>

*(Kaka Reya dibêje:*

*Min serê xwe ji Gawê dirêj kir ber diyaran ve*

*Min keçek gewre dît ku dike hawar*

*Çavê wê bi hezaran hêstir tijî bû*

*Barê wê Xaliq bû ga jî nikarîbû hilgire)*

Piştî hatina Kaka Reya ji bo hawara Celale, Şah Xoşîn tê dinyayê lê belê Celale Xatûn hê jî ditirse, lewre dibêje ku dê zarokê wê hê jî wek xeyrî meşrû bê dîtin. Di vê kelama xwe ya bi diyalog de Celale Xatûn, Kake Reya wek siwarê zana pênase dike û jê re behsa hatina hukma Xwedê dike û dibêje ku xelqê Loristanê vî tiştî nizane, zarokê wê wek pîç dibînin. Her wiha ev kelimên ku di navbera Celale Xatûn, Kaka Reda û Şah Xoşîn de derbas dibin, kelimên diyalog in, lewre her yek ji yekî din re tişteke dibêje:

Celale meremû:

Ey Kaka Reya siwarê dana

---

<sup>135</sup> *D.P.E.*, rr. 3-4

<sup>136</sup> *h.b.*, r. 13

Î hukme ama çî heft asîmana  
Xelqî Loristan we zoliş mizana<sup>137</sup>

*(Celale dibêje:*

*Ey Kake Reya siwarê zana*

*Ev hukm hat ji heft asîmanan*

*Wî wek pîç dizanin xelqê Loristan)*

Wexta ku Celale Xatûn ji xelqê ditirse, Kaka Reya wek bersiv jê re dibêje ku divê zarokê xwe wek pîç nebîne, ew tecellî ye, tecelliyê Xwedê ye:

Kaka Rêya meremû:

Siwaranîm siwaranê Serawend<sup>138</sup>

Delîranîm delîranê Xwedawend

Kur batinan çeneman negîran gezend

Celale bikr e Xoşîniş ferzend<sup>139</sup>

*(Kaka Reya dibêje:*

*Siwar in siwarê Serawend*

*Egîd in egîdê Xwedê*

*Yên ku batinê wan kor bin nikarin zerar bidin me*

*Celale bakîre ye Xoşîn zarokê wê ye)*

---

<sup>137</sup> *h.b.*

<sup>138</sup> "Serawend" li Kurdistanê navê cihekî ye.

<sup>139</sup> *D.P.E.*, rr. 13-14

Piştî ku Şah Xoşîn tê dinyayê dibêje ku Kaka Reya rast negotiye, ew ne tecelliyê Xwedê ye, ew Xwedê bi xwe ye:

Şah Xoşîn meremû:

Kaka tu qeletit kird qelet wana

Min Yezdaninan hîç kes nezana

Sahib heft tebeq zemîn heft esmana

We merkebê Celalewe we mîhmanî amana<sup>140</sup>

*(Şah Xoşîn dibêje:*

*Kaka te xelet kir xelet got*

*Ez Yezdan im hîç kes nizane*

*Sahibê heft tebeqeyê zemîn heft esmanan im*

*Ez wek mêvan hatim bedena Celale)*

Mama Celale di vê kelama xwe ya monolog de hestên xwe derdixe pêş û behsa roja xuliqandinê dike. Şanaziya xwe ya li hemberî Şah Xoşîn tîne zimên û xwe wek meyperestekê dibîne:

Mestim ci badeyî royê elestê tu

Wesin yek camî mey ci destî tu

Ayîneyê dilim rewşen in çûn mey

Ci ew bûn bînim mey perestî tu<sup>141</sup>

---

<sup>140</sup> *h.b.*, r. 13

<sup>141</sup> *D.N.Y.*, rr. 63-64

*(Serxweş im ji şerabê roja ewil a xuliqandinê*

*Bes e qedeheke meyê ji destê te*

*Neynika dilê min ronî ye wek şerabê*

*Ji ber vê ye meyperestê te me)*

Serdema Şah Xoşîn, ji bo yarsanan wek serdemek temam, yanî serdemek e ku Xwedê û ferîşte hemû bi hev re zuhûr dikin, ji ber vê ev serdem gelek pîroz e. Ji ber vê sedemê jî, Mama Celaleya ku Zatê Xwedê hildigire û navgînek e ji bo zuhûrkirina Xwedê, însanan dawetî pîrozkirinê dike û beşaret dide wan, her wiha gazî wan dike ku bên û şhadet bînin ji bo Xwedêbûna Şah Xoşîn:

Ne berê Şahî ne berê Şahî

Ew ro nîştêbîm ne berê Şahî

Mirdan û jinan meşîn we şahî

Perî Şah Xoşîn medan gowahî<sup>142</sup>

*(Li ber deriyê dergaha Şah*

*Wê rojê rûniştibûm li ber deriyê dergaha Şah*

*Mêr û jin ji bo şahiyê hatin*

*Ji bo Şah Xoşîn wek Xweda bibînin)*

Li gorî doktrîna yarsanan, roja ewil a xuliqandinê di navbera mirov û Xwedê de peymanek çêdibe û yarsan ji bo vê peymanê dibêjin *beyawbest* û *beyawbest*

---

<sup>142</sup> h.b., r. 64

*sacinarî*<sup>143</sup> jî peyman ewil e. Ev peyman hem di îslamê de hem jî di dînê yarsanî de heye. Peymana ku ji bo misilmanan hatiye çêkirin, di Qur'anê de, di sûreya E'rafê de wiha derbas dibe: *"Di bîra wan bîne wê dema ku Rebbê te ji Benîademiyân, ji piştên wan zurriyeta wan girt û ew li ser nefsa wan kirin şahid; qey ez ne Rebbê we me? Gotin; belê em şehde didin. Da ku hûn roja qiyametê bibêjin; em ji vê xafil bûn."*<sup>144</sup> Tefsîra vê ayetê wiha hatiye dayîn:

*Yanî ya Muhemmed! Di bîra mirovan bîne, vê ehd û peyman Xweda ya ku ji temamê beşeran girtiye û temamê beşeran ew îqrar kiriye ku Xweda Rebbê wan e, ji xeyrî wî tu îlahên bi heqiyê nînin. Temamê beşeran ev îqrar gotine, vêca çi bi zimanê halê xwe be, çi jî bi zimanê xwe dê qas be. Temamê beşeran ribûbiyeta Xweda îtiraf kirine.*

*Belê, ev îqrara ha ji Benîademiyân bi eynelyeqînî çêbûye. Di wê wextê de çêbûye ku Xweda zurriyet ji piştên Benîademiyân derxistiye. Çawa ku ev yek ji zahirê ayetê tê fêmkirin. Yan jî ji nefsa Adem zurriyeta wî derxistiye çawa ku ev ji hedîsê tê fêmkirin.*

*Tirmizî ji Ebû Hureyre (r) rîwayet kiriye û sehîh jê dêriyaye, gotiye, Resûlê Xweda (s) got: "Çi dema Xweda Adem xuliqand, piştta wî mesih kir, vêca ji piştta wî her sulale ya ku heta roja qiyametê ew xaliqê wan e, ket." Yanî çi dema Xweda îrade kir ku Adem (c) bixuliqîne û ew xuliqand, piştta wî mesih kir. Vêca temamê zurriyeta ku heta roja qiyametê ewê ji piştta wî bixuliqîne ket, rûh hat ser wan û ew soz û peyman "Qey ez ne rebbê we me?" ji wan stend."<sup>145</sup>*

Li gorî baweriya yarsanan li ser rûyê erdê ev peyman hatiye nûkirin. Peymana dawî di dema Sultan Sehak de hatiye kirin û ev peyman wek *beyawbestî perdîwerî* hatiye binavkirin. Di vê kelama jêr de Pîr Sadiq Mazenderanî behsa peymanê dîke:

<sup>143</sup> bnr: Safîzadeh, Sedîq, *Nameyê Serencam*, Entesarat Hîrmend, Tehran, 1996, rr. 579-580

<sup>144</sup> Şoşikî, Mela Muhemmedê, *Tefsîra Qur'anê Nûra Qelban-2*, Mela Muhemmedê Bêrkevanî (amd.), Çapa Yekem, Nûbihar, Stenbol, 2011, rr. 456-457

<sup>145</sup> h.b.

Yaran perî bo yaran perî bo  
Zarî ken çenî bilbil perî bo  
Ez ew wulenan amam we layî tu  
Ane peymanana vîm westim ce nû

*(Ey yar ji bo Wî*

*Bikin girî wek bilbilan ji bo Wî*

*Ez ew gul im ku hatim ba te*

*Niha min nû kir peymanana xwe ya bi te re)*<sup>146</sup>

Pîr Sadiq Mazenderanî di kelameke ya din de jî behsa peymanê dike û behsa "sacinar" jî dike ku me li jor cih dabûyê:

Ew piştî perde ew piştî perde  
Barge Şam westin ew piştî perde  
Ne jêrê sacinar serşan siperde  
Ve qewlê rastî şertêşan birde<sup>147</sup>

*(Li pişt perde*

*Koşka Şah li pişt perde danişt*

*Serê xwe teslîm kirin di bin sacinar*

*Bi qewlê rastiye şertên xwe bi cî anîn)*

---

<sup>146</sup> D.N.Y., r. 64

<sup>147</sup> Pîr Sadiq Mazenderanî, D.N.Y., r. 166



Her wiha Mama Celale jî di kelameke xwe de behsa peymanê serdema Şah Xoşîn kiriye. Di wê kelimê de behsa peymanê sacinarî ya bi Şah Xoşîn re hatiye behskirin.

### 2.2.3. Reyhan Xanim Loristanî

Li gorî kevneşopiya yarsanan Reyhan Xanim di sedsala 11mîn de jiyaye. Yek ji nêzikî Şah Xoşîn e. Dîsa li gorî kevneşopiya yarsanan, li Yaftekuha Loristanê hatiye dinyayê. Reyhan Xanim di nav yarsanan de kesê wek ji tembûrvanên navdar bûye di serdema xwe de.<sup>148</sup>

Reyhan Xanim di kelameke xwe de behsa roja xuliqandinê, şabûna xwe, sermestbûna xwe dike. Weku di kelama xwe de diyar dike ku yê gel û bijare, yanî her kes Xwedêbûna Şah Xoşîn qebûl dike:

Xoşîn elest Xoşîn elest

Serim ce sewdayê tu bîn sermest

Gul û şemamim her du ha ne dest

Guwahî medin çî xas û çî geşt<sup>149</sup>

*(Xoşîn li roja ewil a xuliqandinê*

*Bi sewdaya te ez bûm sermest*

*Min bi dest xist gul û şemam*

*Çî bijare çî gel me hemû qebûl kir Xwedêbûna te)*

---

<sup>148</sup> D.N.Y., r. 69

<sup>149</sup> h.b.

Weku di kelama jor de hatiye behskirin di vê kelama jêr de jî tê behskirin ku her kes Xwedêbûna Şah Xoşîn qebûl dike. Di kelimên Reyhan Xanim de, bi piranî behsa baweriyên yarsanan tê behskirin. Weku di vê kelimê de jî tê dîtin, Reyhan Xanim diyar dike ku Xwedêbûna Şah Xoşîn ji aliyê her kesî ve tê qebûlkirin, heta ava çemê jî qebûl dike ku Şah Xoşîn Xweda ye. Her wiha behsa Matiyân jî dike ku Matiyân hem di wateya mehîne de ye hem jî navê çemekî ye li bajarê ku Şah Xoşîn lê hatiye dinyaye:

Ew rû yê matiyân ew rû yê matiyân

Bargê Şahim westin ew rû yê matiyân

Ew ro nîşte bîm ne koşkî Keyan

Dîm av ewro guwada ve giyan<sup>150</sup>

*(Li ser mehîneli ser mehîne*

*Koşka Şahê min rûnişt li ser mehîne*

*Wê rojê rûniştim li koşka Şahan*

*Min dît ku îro ava çemê jî Xwedêbûna Wî qebûl kir)*

Di vê kelimê de Reyhan Xanim girîngiya şûrê Şah Xoşîn jî nîşan dide. Şûrê wî bi awayekî temsîlî mutleqiyeta hakîmiyeta wî ya îlahî nîşan dide, ji ber vê jî tûjbûna wî tê behskirin. Her wiha Reyhan Xanim behsa Xeta jî dike ku Xeta navê welatekî ye li bakurê Xorasanê û ev welat hem bi xezalên xwe hem jî bi însanên xwe yê delal navdar e:

Ce bala ta yî ce bala ta yî

Ama suwarî ce bala ta yî

Xetayî Xoşîn Xetayî Xoşîn

---

<sup>150</sup> h.b.

Tîqîş mewêrû ce gaw ta mahî<sup>151</sup>

*(Ji jor heta jêr*

*Ji jor suwarek hat heta jêr*

*Xetayî Xoşîn Xetayî Xoşîn*

*Şûrê wî jê dike her tiştî ji ga heta masiyê)*

#### **2.2.4. Fatime Loreyê Goran**

Li gorî kevneşopiya yarsanan, Fatime Lore ji xelqê Goran e. Fatime Lore ji serdema Şah Xoşîn e û yeke ji nêzikê wî ye. Di sedsala 11mîn de hatiye dinyayê. Dîsa li gorî kevneşopiya yarsanan pir nêzikî Baba Tahir Hemedanî bûye û li ser wê û Baba Tahir çîrokek wiha jî heye: Wexta ku Şah Xoşîn Baba Tahir dibîne Fatime Lore *dûnê* xwe guhertiye. Baba Tahir ji ber vê pir xemgîn bûye. Şah Xoşîn îşaretek daye wî ku dê di jiyana bêdawî de Baba Tahir û Fatime Lore wek Leylî Mecnûn bigihîne hev. Di heman demê de Fatime Lore di nav yarsanan de wek sirra yarsanan (remzê yarsan) tê zanîn.<sup>152</sup>

Fatime Lore di vê kelama xwe ya monolog de behsa girêdana xwe ya Şah Xoşîn dike. Li gorî ku diyar dike, kesê ku Şah Xoşîn wek Xwedê qebûl dike, dê çî bike ji canê xwe. Yanî di çavê Fatime Lore de Şah Xoşîn ew qas mezin e ku dinyayek bê wî, yanî bê Xwedê nikare bifikire:

Giyan perî çî şen giyan perî çî şen

Her kes to darû giyan perî çî şen

We nawit sewgend derûnim bêêşin

Bê to giyan û zil hemîşe rîşen<sup>153</sup>

---

<sup>151</sup> *h.b.*, r. 70

<sup>152</sup> *h.b.*

<sup>153</sup> *h.b.*, r. 71

*(Can ji bo çi ye  
Her kesê ku xwedî te ye dê çi bike ji can  
Bi navê te sond dixwim ku diêşe nava min  
Bê te dil û can birîndar e her car)*

Fatime Lore di kelameke xwe de sirrdariya (razdarî) xwe nîşan dide. Li gorî ku diyar dike, bi fermana Şah ew bûye xwediyê sirran û vê sirrê jî wek dermanê derdê xwe dibîne ku gunehê Şah pê hatiye û ji bo êşa wê dayê:

Razdarê yarim razdarê yarim  
We fermanê şah razdarê yarim  
Şahim bizeyîş ama ve zarîm  
Raz kird we dermanê derdekê karîm<sup>154</sup>

*(Razdarê yar im  
Bi fermana Şah razdarê yar im  
Gunehê Şah bi zarîna min hat  
Ev sir bû dermanê derdê zor e)*

Di vê kelama xwe de Fatime Loreyê Goran behsa mêvandariya Xwedê dike. Weku diyar dike Xwedê du roj in hatiye mêvandariya wê û mêvanê xwe, ango Xwedayê xwe wek xwediyê du cîhanan pênase dike. Her wiha sînema xwe wek textê Şahê xwe dibîne:

---

<sup>154</sup> h.b.

Yarim mehman e yarim mehman e  
Ane du roç in yarim mehman e  
Mehmanim Padişahê her du geyhan e  
Sînem textgayê Şahê zeman e<sup>155</sup>

*(Yar mêvan e Yar mêvan e  
Ev du roj in yar mêvan e  
Mêvanê min Padişahê her du cîhanê ye  
Sînga min textê Şahê zeman e)*

#### **2.2.5. Liza Xanim Caf**

Li gorî kevneşopiya yarsanan, Liza Xanim Caf di sedsala 11mîn de jiyaye. Ji Şahrizurê ye. Yek ji nêzikê Şah Xoşîn tê zanîn.

"Heyder" di kelimên Liza Xanim de gelek derbas dibe û Şah Xoşîn nîşan dide, wek tê zanîn "Heyder" lakaba Hz. Alî ye û bi erebî di maneya "şêr" de ye. Li gorî baweriya yarsanan, Alî û Şah Xoşîn Cewherê Xwedê girtine ser xwe, her wiha ji bo wan, di kelimên cuda de, navên cuda têne bikaranîn. Ji ber ku li gorî vê baweriyê Alî, Şah Xoşîn, Sultan û hwd. xwediyê heman cewherê ne û girîngiya nav tune. Liza Xanim di vê kelama xwe de behsa zemanê berê dike, weku dibêje wextek li bajarê Eyne bûye. Her wiha wisa diyar dike ku li der û dor wek "Keça Caf" tê nasîn:

Heyder serraf Heyder serraf  
Çendî ne Eyne bîm ne gêcî taf  
Îsa mewaçin penim keçê Caf  
Qebale marî ne taşî Mesaf<sup>156</sup>

---

<sup>155</sup> h.b.

*(Heyder serraf Heyder serraf  
Wextek li Eyne bûm li hember sûlavê  
Ji min re dibêjin keça Caf  
Qebaleyek bîne ji Çiyayê Mesaf)*

Liza Xanim di vê kelama xwe de girîngiya Şah derdixe pêş û dibêje divê her kes rêzgirtina li ber Şah bizane û divê tu kes piyên xwe li ber Şah dirêj neke:

Heyderê nazkêş Heyderê nazkêş  
Ne huzûr û Şah pa minêr li pêş  
Qebaleyê sirrim bikire endîş  
Ba nizanû pêş bêgane û xîş<sup>157</sup>

*(Heyderê nazkêş Heyderê nazkêş  
Li huzûra Şah lingê xwe dernexe pêş  
Carek bifikire ev qebaleya sir e  
Ne dost ne xerîb bila nizanibe vê sirê)*

Di vê kelama xwe de Liza Xanim şahiya li hemberî Şah Xoşîn nîşan dide. Hatina wî dişibîne hatina biharê. Weku diyar dike berf dihele, dibe av û bihar tê. Bihar xweşî ye, aramî ye û hatina serdemekê nû ye. Ji ber vê Liza Xanim jî hatina Şah Xoşîn wek xweşiyekê û serdemekê nû dibîne:

---

<sup>156</sup> h.b., r. 72

<sup>157</sup> h.b.

Vefran bî ve av vefran bî ve av  
Vehar çûn ama vefran bî ve av  
Gul û wewêşe hewrîzan ce xwaw  
Perî araişê deşt û ku û kav<sup>158</sup>

*(Berf heliya bû av  
Bihar hat û berf heliya bû av  
Gul û binevş şiyar bû ji xew  
Ji bo bixemlîne deşt û gir û çiya)*

#### **2.2.6. Xatûn Meyzerd**

Li gorî kevneşopiya yarsanan, Xatûn Meyzerd di sedsala 12mîn de jiyaye. Ji xelqê Loristan e. Yek ji nêzîkê Şah Xoşîn e. Li gorî kevneşopiya yarsanan wexta dozdeh salî bû hatiye cem Şah Xoşîn û bi demê re bûye pîrek mezin. Gora wê ya sembolîk îro li Yaftekuya Loristanê ye.<sup>159</sup>

Xatûn Meyzerd di kelama xwe de Şah Xoşîn wek Cebbar dibîne. Weku tê zanîn Cebbar yek ji sîfatên Xwedê ye. Her wiha Şah Xoşîn wek nêçîrvanekî dibîne û gel jî wek nêçîr. Li gorî vê kelimê, Şah Xoşîn wexta ku nêçîra gel dike rehmeta xwe li wan belav dike, ango li gorî Xatûn Meyzerd nêçîrbûna wan îlahî ye:

Xoşînê Cebbar Xoşînê Cebbar  
Hezar suwar ama yu Şahin Cebbar  
Cebbar Xoşîn e ême şan şîkar  
We rehmete we bijendî diyar<sup>160</sup>

---

<sup>158</sup> h.b.

<sup>159</sup> h.b., r. 73

<sup>160</sup> h.b.

*(Xoşînê Cebbar Xoşînê Cebbar  
Hezar suwar hatin cem Şah Cebbar  
Cebbar Xoşîn e em nêçîrên wî  
Bi rehmeta xwe li me da)*

Xatûn Meyzerd di vê kelama xwe de jî girîngiya Şah Xoşîn derdixe pêş û dibêje dikare bi rihetî serê xwe teslîmî wî bike, her wiha bangî gel dike ku biçûk û mezin her kes ji bo rêya Şah Xoşîn dest bide hev. Di vê kelimê de "pir" wek rêya gihîştina Şah Xoşîn hatiye nîşandan û li gorî Xatûn Meyzerd, ji mezin heta biçûk divê her kes hevkarîyê bike:

Yaran girdiman yaran girdiman  
Serman bisparî ve yar girdiman  
Pîr û yuwan û gewre û wirdiman  
Bikuşîm perî rageyê pirdiman<sup>161</sup>

*(Ey yar em hemû  
Em hemû serê xwe teslîmî yar bikin ey yar  
Pîr û ciwan û mezin û biçûk  
Em hewl bidin ji bo rêya pira xwe)*

### **2.2.7. Dayê Xezan Sergetî**

Li gorî kevneşopiya yarsanan, Dayê Xezan di sedsala 12mîn de jiyaye. Ji gundê Sergetiya Hewraman e. Wek nêzîkî Baba Nawis tê zanîn. Wisa tê zanîn ku Dayê Xezan di serî de misilman bû û dijminê Baba Nawis bû, ji ber ku wî wek

---

<sup>161</sup> h.b., r. 74



kafirek didît. Lê belê dû re ew bixwe jî dibe yarsan û di nav yarsanan de dibe figureke mezin. Di heman demê de tembûrvaneke navdar e.<sup>162</sup>

Wexta ku Dayê Xezan Sergetî dijminê Baba Nawis bûye, ew wek zilmkar û gawurek dîtiye û feryada xwe di kelama xwe de nîşan daye, ji Şîrû lava dike ku dawî bi vê zilmê bîne û edaletê bike para wan:

Şîrû kirya cewr Şîrû kirya cewr

Ne destî Bile mirdim kirya cewr

Dadman resan ne destî î gewr

Destî weş afat dindaniş hezûr<sup>163</sup>

*(Ey Şîrû zilm kir ey Şîrû zilm kir*

*Feryad ji destê Bile mirim zilm kir*

*Feryada me seh ke ji destî vî gawurî*

*Destên wî afat in danên wî sist)*

Dayê Xezan piştî ku dibe yarsan, vê kelmê dibêje û pesnê Baba Nawis dide. Wî wek Xweda dibîne û vî tiştî jî bi nîşaneyên wek zindîkirina miriyan, veğerandîna yaverên xwe yên ji tofanê nîşan dide:

Tîrî wet kef û dem û di giyana

Mirdet zindû kirdin ce goristana

Yaverit gîlav dan ce vir avana

Ça ga Xudayun henîş nîşana<sup>164</sup>

---

<sup>162</sup> h.b., r. 91

<sup>163</sup> h.b.

*(Te ji kefa destê xwe tîrek avêt canê min*

*Te miriyê li goristanê zindî kir*

*Te yaverê xwe ji tofanan vegerand*

*Ev qas nîşane heye Xweda yî tu)*

Weku me di biyografiya Dayê Xezan de behs kir, ew di serî de misilman bûye, piştê dînê xwe guherandiye û bûye yarsan. Weku di vê kelimê de tê dîtin, Dayê Xezan behsa serpêhatiya xwe ya ketina dû Xwedê dike. Her wiha cih dide Ketayûn jî ku xwedî cihekî girîng e di mîtolojiya îranî û yarsanan de. Ketayûn keça Keyserê Rûmê ye. Bi Goştasp re dizewice û du zarokên wê yên bi navê Esfandiyar û Peşûten çêdibin. Li gorî kevneşopiya yarsanan, Ketayûn yek ji ferîşteyên *Heften* e di serdema Goştasp de. Her wiha Ketayûn wek Remzbar (diya Sultan Sehak) jî tê hesabandin ku Remzbar yek ji ferîşteyên sereke ye di kevneşopiya yarsanan de.<sup>165</sup>

*Em şûn û ew şûn em şûn û ew şûn*

*Pey Şam megiliyam em şûn û ew şûn*

*Ta peydaş kirdim ve bêçine û çûn*

*Zat aswaranin çenî Ketayûn<sup>166</sup>*

*(Li vir û li wir li vir û li wir*

*Li dû Şahê xwe geriyam li vir û li wir*

*Heta ku min ew dît bê sebeb*

*Zatê min suwar e wek Ketayun)*

---

<sup>164</sup> *h.b.*, r. 92

<sup>165</sup> jî bo zêdetir agahî li ser Ketayûn bnr: *Vali, Les Yarsans, Les aspects-Les doctrinaux*, rr. 389-390

<sup>166</sup> *D.N.Y.*, r. 92

### 2.2.8. Xatûn Dayrak (Remzbar an jî Rezbar)

Li gorî kevneşopiya yarsanan Xatûn Dayrak di sedsala 15mîn de jiyaye û li Helwanê hatiye dinyayê. Keça Huseyn Beg Celd e. Yek ji figurên herî mezin e ji bo yarsanan, lewre diya simbolîk a Sultan Sehak e û kurê xwe bi awayekî bakîre aniyê dinyayê. Li gorî kevneşopiya yarsanan Remzbar yek ji ferîşteyên *Heften* e. Remz wateya sîrrê dide, yanî navê Remzbar ji vir tê, yê ku sîrrê wek bar girtiye ser milên xwe.

Remzbar wek diya Sultan Sehak jî xwedî kesayetiyeke mezin e. Di beşa Sultan Sehak de me li ser jidayîkbûna Sultan Sehak hinek agahî dabûn lê em ê li vir vê agahiyê berfirehtir bikin. Li gorî kevneşopiya yarsanan jidayîkbûna Sultan Sehak ji aliyê Baba Nawis ve tê îşaretkirin. Piştî ku Baba Nawis xwe dikşîne xeybê, Pîr Binyamîn, Pîr Mûsî, Dawud û Mistefa Dawudan diçin herêma Hewramanê û li gundê Berzenciya Şehrezûr, li benda hatina Sultan dimînin. Li wî gundî, diçin li mala Şêx Îsî bi cih dibin û jê re dibêjin ku divê bi Dayraka keça Huseyn Beg Celd re bizewice. Şêx Îsî qebûl nake, lewre hem pir kal bûye hem jî gelek zarokên wî yên mezin hene. Dawiya dawî qebûl dike lê vê carê bavê Dayrak, Huseyn Beg, qebûl nake, lewre naxwaze keça wî bi kalekî re bizewice. Bi israran, dawiya dawî her du alî jî qebûl dikin û wan dizewicînin. Piştî demekê Dayrak ducanî dibe. Eywet ducanîbûna Dayrak di kelameke xwe de diyar dike û şahiya xuyabûna Sultan bi xwezayê girê dide. Li gorî ku nîşan dike, wexta ku Sultan dikeve zikê Dayrak, dengê birûskê tê ji çiyayan û digihîje guhê ferîşteyan. Her wiha ferîşte jî şabûna xwe tînin zimên û ji bo pêşwaziya Sultan ji çiyayan dadikevin:

Eywet meremû:

Sedayê re'd û berqî weharan ama ne kêwan

Ce betnê Dayrak peyabî Sultan

Quriştê hewrê weharan pîçan ne kêşan

Ya wa ve guşê Çwar Tene Yarî ne bûsan

Dawud vatiş Mistefa derya muradiman

Melekan çe ser meçerû we kêwan we rewan<sup>167</sup>

*(Eywet dibêje:*

*Dengê birûska biharê hat ji çiyayan*

*Sultan di hundirê Dayrak de peyda bû*

*Qûrîné ewrê biharê pêça her derê*

*Gihaşt guhê Çar Tene Yarî*

*Dawud got Mistefa va ye miradê me*

*Melek ji çiyayan dadikevin xwarê)*

Nasên Huseyn Beg ên ku li hemberî vê zewacê bûn ji Huseyn Beg re li ser Dayrak tiştên ne xweş dibêjin, lewre li gorî wan ne mimkun e ku zarokek ji vî kalî çêbe û li gorî wan ev zarok ji kesekî din e. Li ser vê Huseyn Beg ji keça xwe pir aciz dibe û tiştên ne xweş jê re dibêje, heta wisa nîşan dike ku heqê wê û wan derwêşan kuştin e ji bo ku ji xelqê re bibin îbret. Her wiha sirra keça xwe jî tîne zimên û ji ber vê jî aciz dibe, lewre Remzbar her tim behsa sirrekê dike lê belê vê sirra xwe eşkere nake. Her wiha bavê wê dîsa jê bawer nake û li gorî wî wekî Meryem kesek din tuneye li vê cîhanê. Huseyn Beg van tiştan di kelama xwe de wiha tîne zimên:

Sezat kuştin e çenî derwîşan

Ta bewî be lawme pêy xelkî Sîrwan

Tu her remzê Yarî marî we zuwan

Bicîge Meryem kesî weku to naman vê cihan<sup>168</sup>

---

<sup>167</sup> D.G.H., r. 10

<sup>168</sup> h.b., r. 9

*(Heqê te kuştin e tevî wan derwêşan  
Heta ku ji xelqê Sîrwan<sup>169</sup> re bibe îbret  
Tu her dem sirra Yar tînî zimên  
Ji xeynî Meryem kesek wekî te tuneke li vê cîhanê)*

Ji ber ku Dayrak dizane ev sirra Yar e, wexta ku bavê wê jê hêrs dibe, Dayrak her dem vê sîrrê tîne bîra wî lê belê sirra xwe tu car eşkere nake. Ji ber wê jî bavê wê aciz dibe ku her dem dibêje ev sirrek e û ji ber vî tiştî qet şerm nake. Li gorî wê, divê xelq şerm bike ku li ser wê tiştên ne xweş dibêjin. Wiha berdewam dike ku Xwedayê ku heft asîmanan xuliqandiye ev sîrr daye derwêşên xwe, ji ber vê jî ew derwêş bê guneh in:

Dayrak meremû:  
Xelkan bikerdî dî heya û şerman  
Herfî bêcayî mawerdî we zuwan  
Min wîm sîrrim, sir minin remzim nizanan  
Şermê nîya mirdantan biyan biwînan  
Wu Xwuwaye xelqîş kirdin hewt asûman  
Ça esrarî Heq we ladê derwêşan nîya gunaşan<sup>170</sup>

*(Dayrak dibêje:  
Ey xelq bikin heya û şerm  
We tişteke ecêb anî zimên  
Ez bixwe sîrr im, sir ez im kes nizane  
Ez şerm nakim, bila mîrên wê bê û bibîne*

<sup>169</sup> Sîrwan li Hewramanê navê robareke pîroz e.

<sup>170</sup> D.G.H., r. 9

*Vê Xwedayê ku vê heft asûmanê xuliqandiye*  
*Heq sirra xwe daye derwêşan ew bê guneh in)*

Her wiha ev sir di serdema Sultan Sehak de di *Dîwana Gewre* de jî hatiye behskirin. Di kelama ewil a *Dîwana Gewre* de rewşa Remzbar hatiye nîşandan. Di kevneşopiya yarsanan de teyrek spî hatiye ser pêşka Xatûn Dayrak û ew teyr nîşaneyê hatina Sultan Sehak bûye. Di vê kelimê de ev bûyer hatiye nîşandan û her wiha wisa hatiye gotin ku Baba Rukneddîn an jî Pîr Mûsî ev sirr zanîbû:

Baq ew temaşa baq ew temaşa  
Xulaman bidê baq ew temaşa  
Şah we Şehbazan çe towit wist ra  
Xatûne Dayrak damaniş kîşa  
Yaran çenî hem şîn ew bûsanî  
Xatûne Dayrak ça ka biyanî  
Şahbazê sifîd nîşt ew dawanî  
Baba Rukneddîn vê sirre zanî<sup>171</sup>

*(Li bostanê temaşe kin*  
*Xulam li bostanê temaşe kin*  
*Şah Şehbazên xwe ji te re şand*  
*Xatûna Dayrak pêşka xwe kişand*  
*Yaran bi hev re biçin wê bostanê*  
*Niha werin ba Xatûna Dayrak*  
*Şahbazê Spî li ser wê pêşikê rûnişt*

---

<sup>171</sup> *h.b.*, r. 13

Wexta ku Sultan çêdibe, Dayrak jî behsa Şahbazê dike ku di *Dîwana Gewre* de weku me li jor behs kir, ji bo hatina Sultan Şahak nîşaneyek bû. Dayrak jî vî tiştî dubare dike û dibêje Şahbaz ji cihê xwe yê veşartî xuya bûye, yanî wek mizgîniyek ji cihê xwe biriqiye:

Dayrak meremû:

Ferzendê emîn ferzendê emîn

Şahbazê sifîd mederay ne kemîn

Ni ser qulleyê erş amay we zemîn<sup>172</sup>

*(Dayrak dibêje:*

*Zarokê rastgo zarokê rastgo*

*Şahbazê Spî ji cihê xwe biriqî*

*Ji lutkeya erşê hate erdê)*

Li gorî kevneşopiya yarsanan, Sultan Şahak wek Xwedê tê hesabandin. Ji ber ku diya wî Ramzbar jî wî wek Xwedayê li ser rûyê erdê dibîne. Remzbar di vê kelama xwe de hawara xwe digihîne Pîr Mûsî jî, ku zarokê di zikê wê de wek qusûrek tê dîtin. Her wiha Remzbar avakirina dinyayê û demsalan a bi destê zarokê xwe, ango bi destê Sultan Şahak tîne zimên di vê kelama xwe de. Li gorî ku di kelama xwe de diyar dike, her ferîşte sembola demsalekê ye, yanî her demsal ji cewherê ferîşteyekê pêk hatiye. Ji xeynê vê bi taybetî behsa Binyamîn, Dawud, Pîr Mûsî û Mistefa dike ku ev her çar ferîşteyên herî girîng in. Dibêje ew çar melek in lê belê cewherê wan hezar in û wisa diyar dike ku bihar ji Dawud, havîn ji Binyamîn, payîz ji Pîr Mûsî û zivistan jî ji Mistefa çêbûye. Her wiha weku diyar dike ax ji Binyamîn, ba ji nefesa Dawud, av ji Pîr Mûsî û agir ji Mistefa çêbûye:

---

<sup>172</sup> *h.b., r. 14*

Remzbar meremû:

Xulaman nî bar

Mûsî xulaman qusûr biyen nî bar

Ça ga emriş kird azîzê salar

Çerîş Mistefa ni ew qehr û qehhar

Sîneş bî we sac gêre kurêy nar

Ta ke kureşan nekenû ne şar

Ta ke mirdanim germîşan bi ew kar

Çwar behriş sazena ni î maye çwar

Umman û muhîte qulzûm û Xunxar

Binyam û Dawud Mûsî û Qehhar

Çwar in melek mayeşan hezar

Ne yek ferzenenî fesliman her çwar

Mayeş ne Dawud ser cuşen behar

Tawiştê Binyamîn badrîz Defterdar

Mayeş Mistefa zimistanê Yar

Xak ni Binyamîn biyen mayedar

Bad ne Yar Dawud nefes teyar

Avin je mayê Mûsî Defterdar

Ateş Mistefa mayeşen ve Yar

Şerareyê aftav ne çerxê seyyar<sup>173</sup>

*(Remzbar dibêje:*

*Xulam li vê barê*

*Ey Mûsî xelq li vê barê qisûrek dibîne*

---

<sup>173</sup> h.b., rr. 16-17



*Ezîzê salar ferman da*  
*Mistefa bi qehr û qehhar geriya*  
*Sîneyê wî dibe wek kureyê nar*  
*Heta ku wê kureyê bibe şeh*  
*Bila ew bi karê xwe re mijûl bin*  
*Heta ku vê çar deryayê bi cewherê vê her çaran ava bikin*  
*Umman û Muhîte Qulzûn û Xunxar*  
*Binyam û Dawud û Mûsî û Qehhar*  
*Çar melek in lê cewherê wan hezar e*  
*Çar demsal bi destê yek zarokê min ava bûye*  
*Ev şahiya biharê ji mayaya Dawud e*  
*Havîn Binyamîn e payîz Defterdar*  
*Zivistan ji mayaya Mistefa ye*  
*Cewherê axê ji Binyamîn pêk hat*  
*Mayaya bayî nefesa pak a Dawud e*  
*Av ji mayaya Mûsî Defterdar e*  
*Agir ji mayaya Mistefa ye*  
*Çîrûska rojê ya çerxa ku dizivire)*

Remzbar di kelamekê xwe de behsa hatina xwe dike, her wiha behsa Sultan Sehak jî dike ka dema çêbûye çi bêhnfirehiyek mezin pê re peyda bûye. Lewre weku me li jor behs kir, nasên wê li ser wê tiştên ne xweş gotine, lê bi hatina Sultan, her tişt kifş bûye. Li gorî wê li mala Şêx Îsî, Sultan alîkariya wê kiriye lewre nasên wê jê bawer nedikirin û li gorî wan zarokê di zikê wê de ji kesekî din e. Ji ber vê, Remzbar li vir behsa vê dike ku wexta Sultan çêbûye alîkariyek mezin pê kiriye, lewre her tişt êdî eşkere bûye. Her wiha behsa şabûna xwezayê jî dike bi hatina Sultan ku gul û kulîlk bi bêhna xwe ya xweş şabûna xwe nîşanî hatina Sultan, dane. Remzbar behsa

*dûnên* xwe jî dike di vê kelimê de ku dibêje hê di serdema kevîran de hebûye û vî tiştê balkêş jî dibêje ku kevîr ji wê ye û ew bixwe ji kevîr jî pîrtir e. Di vê kelimê de behsa navê dê û bavê xwe, serdem bi serdem behsa guherînên xwe û bi wan guherînan jî behsa navên xwe dike:

Rezbar meremû:

Amayim çe herîr amayim çe herîr

Azîz vî remzî amayim çe herîr

Dadam Zer Xatûn babûmin Emîr

Pa yanû Îsî to man bî destgîr

Ça gul û bostan kirdman ebîr

Îna mêwanî guwayê ezel nûr

Na hecer jiyam namim bî Mûşîr

Hecer ne eze ez ne hecer pîr<sup>174</sup>

Namim Damiya bî na Deycûr twîr

Ça Serendîl<sup>175</sup> bî namim Zermîr

Ez pakim kird xak kîşam ne qelbîr

Xizmet û pakîn usa bî dilgîr

Kirdîn xizmet we xakê zerd besîr

Ça Serendîl da niyaman tekbîr

Hem bîm we ferzendê beşer beşîr<sup>176</sup>

*(Rezbar dibêje:*

*Ez ji hevrişimê hatim*

<sup>174</sup> Di hin kelaman de wisa tê nîşandan ku kevîr ji Remzbar çêbûye. bnr: *D.G.H.*, r. 309

<sup>175</sup> Serendîl (Serendîb) li Hîndîstanê navê çiyayekî bû wan çaxan li gorî baweriya yarsanan. Her wiha li gorî yarsanan mirovê ewil ji axa wî çiyayî û li wî çiyayî hatiye afirandin.

<sup>176</sup> *D.G.H.*, rr. 306-307

*Ezîz bi vê sîrrê ji hevrîsimê hatim  
Diya min Zer Xatun bavê min Emîr e  
Li mala Îsî te alîkariya min kir  
Gul û bostan bêhnek xweş da  
Niha nûrê ezêlî wekî mêvan hatiye  
Di serdema keviran de navê min Mûşîr bû  
Kevir ji min e ez ji kevir pîrtir im  
Di dema Deycûr de navê min Damiya bû  
Di serdema Serendîl de navê min Zermîr bû  
Min ax paqij kir û seridand  
Xizmet û paqijkirin ji dil hat  
Me wisa kir ku dê axa zer piştire karibe bibîne  
Piştire li ser Serendîl min tekbîr anî  
Piştî ji bo hatina zarokê beşer min mizgînî da)*

Di berdewama kelama jor de Remzbar behsa xwe dike ka çawa *dûnê* xwe guheriye. Ji Sultan re dibêje ka çawa di serdema Hz. Elî de, Fatima bint Esed bû, di Kerbelayê de çawa bû, piştire di serdema Şah Xoşîn de, li Loristanê çawa wek Mama Celale zuhûr kiriye û di vê serdemê de li mala Şêx Îsî çawa bûye Dayrak Remzbar. Pîr Malikê Goran (sedsala 14-15mîn) jî di kelameke xwe de behsa Remzbar dike û dibêje ku di serdema Elî û Muhemmed de, Remzbar wek Fatima hatibû dinyayê, her wiha behsa ferîşteyên din ên wek Binyamîn, Dawud û Pîr Mûsî jî dike ku berê bi çî navî li dinyayê xuya bûne:

Seravê du dere seravê du dere  
Bargeyê Şam vestin seravê du dere  
Selman Binyam e Dawud Qember e

Pîr Mûsî wezîr Kake Cabir e  
Seyîd Mistefa tîriş xeter e  
Fatime Remzbar sirriş perwere<sup>177</sup>

*(Di nav ava du çeman de  
Koşka Şahê min niştasih bû di nav ava du çeman de  
Selman Binyamîn bû Dawud Qember bû  
Pîr Mûsî Kake Cabir bû  
Tîrê Seyîd Mistefa xeter bû  
Fatime Remzbar bû, wê sîr mezin kir)*

Remzbar di vê kelama xwe de dîsa girîngiya Sultan Şahak derdixe pêş. Ji gel re dibêje îqrarê wê Şah e û bila ew jî qet teksîr nekin ku îqrarê wan Şah e. Dawud wek rêberê rêya xwe dibîne. Wisa diyar dike ku wexta ku Şah li textê zêrîn e xelq ji nûra wî mest dibe. Ji ferîşteyên ezêl re jî dibêje ku bila zuhûr bikin. Xwe wek şehadetnameyê dibîne, ango di roja mahşerê de ew ê alîkariya gelê xwe bike yê ku di nav tengasiyê de ye, her wiha behsa gelê xwe yê ku di nav pêlên behrê de dixeniqin dike ku ev jî di wateya *dûnadûnê* de ye, yanî pêlên behrê yê ku radibin û dadikevin dişibîne kirasguhertinê:

Remzbar meremû:  
Îqrarî Şahim e  
Mirdanê bê teksîr îqrarî Şahim e  
Dawud rehberin rehnemayê rahimê  
Ye cayê iltica rayê eywellahime  
Şah di banê textê zer mirdan mestê nûr

---

<sup>177</sup> D.N.Y., rr. 145-146

Mirdanê ezel bikerîm zuhûr  
Şehadetnamçe îqrar û vît in  
Mirdanî gird qerqê mewcê mûhît in<sup>178</sup>

*(Remzbar dibêje:*

*Îqrarê min Şah e*

*Dawud rêberê rêya me ye*

*Cihê iltîcaya min e rêya eywellahê ye*

*Şah di banê textê zêrîn de ye gel ji nûrê wî mest e*

*Gelê ezel bikin zuhûr*

*Şehadetnameya min bixwe îqrar e*

*Gel di nav pêlan de xeniqiye)*

Di vê kelimê de Remzbar behsa alîkariyê (reda) dike û alîkariyê wek barek dibîne. Ango em dikarin bêjin ku rêya Heq rastî ye û kesê ku di vê rêyê de diçe vî tiştî wek alîkarî li ser xwe dike bar. Her wiha dibêje ku dilê Yar wek dikana eynikan e ku hûr bi hûr tê nexşandin. Behsa ronahiya Pîr dike û dibêje ku Pîr her tiştî dibîne û erkan li ba wî tarî nabe:

Remzbar meremû:

Reda bariye

Rayê Heq rasiyen reda bariye

Dilê Yar dukanê mînakariye

Dîde û des teyar nîstî Yarî ye

Erkan yaneyê Pîrê bîna tarî ye

---

<sup>178</sup> S.T., rr. 64-65

Erkan yaneyê Pîrê ray îqrariye<sup>179</sup>

*(Remzbar dibêje:*

*Alîkarî bar e*

*Rêya Heq rastî ye alîkarî bar e*

*Dilê Yar dikanê eynikan e*

*Çav û destê paqij fenayê Yar e*

*Erkan li ba Pîr tarî nabe*

*Erkan li ba Pîr rêya îqrarê ye)*

Remzbar di vê kelama xwe de dîsa behsa wesfên du ferîşteyan dike, weku dibêje Dawud wek delîl, Pîr Mûsî jî wek mûrşid tê dîtîn. Her wiha behsa cihê heriyê ku însan jê çêbûye dike. Di kelimê de dibêje ku cihê "heriya zer" ango "Zerdegil" li çiyayê Serendîl e û cewherê benî adem ev heriya zer e:

Remzbar meremû:

Dawud Delîl e

Pîr û Pîr Mûsî Dawud Delîl e

Pîr Mûsî Mûrşid Dawud Wekîl e

Zerdegil<sup>180</sup> mawaş kuyê Serendîl e

Benayê benî Adem bendeyê celîl e

Yarê celîl Yarê Pîr û Delîl e<sup>181</sup>

---

<sup>179</sup> *h.b.*, rr. 72-77

<sup>180</sup> Zerdegil heriyê zer e, heriyê zer ê ku însan pê hatiye afirandin

<sup>181</sup> *S.T.*, r. 7

*(Dawud Delîl e  
Pîr û Pîr Mûsî Dawud Delîl e  
Pîr Mûsî Mûrşîd e Dawud Wekîl e  
Zerdegil li ser çiyayê Serendîl e  
Cewherê benî adem evdekî celîl e  
Evdê Celîl Yarê Pîr û Delîl e)*

Remzbar dîsa di vê kelama xwe de li ser girîngiya rêya Heq, Pîr Binyamîn û Dawud disekine. Dibêje rêya Heq rêya rastiye ye û bê ser û ber e. Dawud wek delîl dibîne û behsa Pîr Mûsîyê Defterdar dike ku Şah ew kiriye wekîl:

Remzbar meremû:  
We bê erz û tuyl  
Rayê Heq rasiyen le bê erz û tuyl  
Pîr Binyamînê we Cem Yar Dawud Delîl  
Mûsî Defterdar Şah kirdiş Wekîl<sup>182</sup>

*(Remzbar dibêje:  
Bê ser û ber  
Rêya Heq rêya rastiye ye bê ser û ber  
Pîr Binyamînê li Cem Yar e Dawud Delîl  
Mûsî Defterdar Şah ew kir Wekîl)*

Remzbar di gelek kelimên xwe de behsa Sultan Şahak dike û wî wek Xwedê nîşan dike. Remzbar, Sultan wek hêzek dibîne, ji ber vê jî her çî ferman bike bê

---

<sup>182</sup> h.b., r. 68

guman û bê pirsgirêk qebûl dike. Wisa diyar dike ku her tim hişê wê bi Sultan û bi kirinên wî mijûl e û riya ku Sultan nîşan dide, qebûl dike û di wê riyê de diçe. Her wiha di kelimê de behsa *Heften* û *Heftewan* jî tê kirin û Remzbar wisa diyar dike ku *Heftewan* ji nûra Şahbaz hatiye afirandin, ango ji nûra Sultan:

Remzbar meremû:

Bî ew quweyê dil bî ew quweyê dil

Azîz emrê to bî ew quweyê dil

Her çi fermanin qebûl im qebûl

Ve ême ferzin î rage û usûl

Ew yadim meyû weşiyanim şî'ûr

Medî guwahî ez ve bê kudûr

Çe lewhe yaqut ateşe qatil

Zuhûr day çe nûr dîwanê kamil

Heftewan çe nûre Şahbaze adil

Pey şertê mirdan to kirdî hasil

Perî destgîrî Yaranê fazil

Ew hem meylit kird azîzê adil

Ew hem meylit kird azîz we muhebbet

Hem ew Heft pûre destgîrim pê şert

Çe Perdîwer da niyanit sohbet

Awerdî Binyam pey destgîrî şert

Heftewan her heft to dadî xelat

Heftad sefî Yar vît kirdî xulqet

Ser dan çe rahê to Heftad sefî Yar

Sela çe vîtin Padişahê ber û bar



Neh sed neh sedê Pîran bî gerd<sup>183</sup>  
Çû gahê rejîyan gerd pey îqrarê şert  
Gerdîn xulaman bîwen bîwenan  
Rû malan çe şertê sikkeyê Heftewan  
Her çi royê ezel ta aman vî gah  
Zatê heft mezher negînin çi gah  
Her çi ew dema ta axirzeman  
Destgîr Heftewan bigirdîş daman<sup>184</sup>

*(Remzbar dibêje:*

*Bi quweta dil bi quweta dil  
Ezîz emrê te bi quweta dil  
Her çi ferman dikî qebûl im qebûl  
Ev rê û usûl ferz e ji bo me  
Hate bîra min û şûûra min çû  
Bê guman ez vê qebûl dikim  
Ji lewhaya yaqût atêş e qatil  
Dîwanê kamil ji nûr zuhûr da  
Heftewan ji nûrê Şahbazê adil e  
Ji bo şertê gel te kir hasil  
Ji bo alîkariya Yaranê fazil  
Te meyl kir ezîzê adil  
Te meyl kir û bi muhebbet kir  
Ew Heft kur ji bo alîkariya wê şertê Yarî çêbû  
Li Perdîwer sohbet dikirin*

<sup>183</sup> Li gorî yarsanan di dema Şah Xoşîn de, ji 900 mûrîdan 900 mûrîdên Şah Xoşîn hebûn.

<sup>184</sup> D.G.H., rr. 452-453

*Binyam ji bo alîkariya şert anî  
Hebûna her Heftewan diyariya te ye  
Te afirand Heftê safê Yar  
Heftê safên Yar serê xwe dan di rêya te de  
Sela ji te ye ey Padişahê ax û avê  
Neh sed neh sedê Pîran kom bû  
Li ser hev rijîyan ji bo şertê îqrar  
Bêdawî bêdawî kom bûn  
Ji bo teyîdkirina Heftewan kom bûn  
Ji roja ezel tiştên ku heta îro hatine  
Xemla her tiştê Zatê heft mezher e  
Ji niha heta axirzemanê  
Heftewan alîkar in bigrin pêşka wan)*

Çawa ku Remzbar Xwedêbûna Sultan qebûl dike, dixwaze gel jî vî tiştî zanibe û qebûl bike. Remzbar di vê kelama xwe de jî behsa *Heftewan* dike û wisa diyar dike ku kesê ku di rêya Şah de diçe divê serê xwe di wê riyê de feda bike:

Remzbar meremû:

Zemzeme û wade zemzeme û wade

Cuşîyan Yarî zemzeme û wade

Ha mirdan qewl medan guwade

Zatê Heftewan kerîyan şehade

Wefa pa kesin ser pêşan dade

Ser û sikkeyê şert înan nihade<sup>185</sup>

*(Remzbar dibêje:*

*Pistîni û wade pistîni û wade*

*Yarsan bi coş bû bi pistîni û wade*

*Ey gel vê gotinê qebûl bikin*

*Zatê Heftewan şehadet bikin*

*Wefa ya wî kesî ye ku serê xwe daye wan*

*Wan kir şert serdanê)*

Remzbar, Sultan wek nêçîrvan dibîne, wek kelama Mama Celale ya ku li ser nêçîrvaniya Şah Xoşîn gotiye. Di heman demê de, gelê yarsan jî wek nêçîr dibîne. Li gorî wê kesê ku ne yarsan e ne pak û paqij e. Her wiha goştê kesê ku nebe nêçîr qirêj e:

Remzbar meremû:

Nexçîrê Yar e nexçîrê Yar e

Nexçîrê Padişam nexçîrê Yar e

Her kes napakin xakiş çe xar e

Nexçîr dar win guştiş mirdare<sup>186</sup>

*(Remzbar dibêje:*

*Nêçîrê Yar e nêçîrê Yar e*

*Nêçîrê Padişahê min nêçîrê Yar e*

---

<sup>185</sup> h.b., r. 458

<sup>186</sup> h.b., r. 471

*Kesê ne paqij axa wî ne pak e*

*Goştê kesê nebe nêçîr mirdar e)*

Remzbar di kelameke xwe behsa duayan jî dike. Duaya ku di destpêka *Cemê* de tê xwendin duaya Sultan e û Remzbar wekî şefaatkara hemû yarsanan ji vê duayê re tekbîr tîne. Duaya duyemîn ya xwarinê ye. Ev dua beriya xwarinê ji aliyê Binyamîn ve tê ricakirin û Padişah jî ji bo xwarinê destûr dide:

Remzbar meremû:

Padişam duaş da Padişam duaş da  
Tekbîriş wanan Padişam duaş da  
We duayê duyum Binyam kird reca  
Padişam ruxset da Yaran kird xo ra<sup>187</sup>

*(Remzbar dibêje:*

*Padişahê min dua kir Padişahê min dua kir*

*Tekbîr tînin Padişahê min dua kir*

*Di duaya duyemîn de Binyam rica kir*

*Padişahê min destûr da Yaran dest bi xwarinê kir)*

Li gorî yarsanan, Remzbar ji her kesî re şefaateke dike. Pîr Mûsî diçe li ba gunehkaran û Deftera xwe vedike. Remzbar li wir ji bo ku şefaateke bike bangî Şah dike û jê rica dike ku perdeyê negre:

---

<sup>187</sup> *h.b., r. 475*

Remzbar meremû:  
Defter kirdewe  
Pîr Mûsî Wezîr Defter kirdewe  
Şî ew serkanî rûy we derdewe  
Ya Şah murwetin mekerit perdewe<sup>188</sup>

*(Remzbar dibêje:*

*Defter vekir  
Pîr Mûsî Wezîr Defter vekir  
Çû li ba kesên ku rûyê wan bi êş e  
Ya Şah murwet ke negre perdeyê)*

Weku me berê jî behs kir, li gorî yarsanan şikîndina gwîzê sembola serdayînê ye, ango teslîmkirina serî ye (serseporden). Ji ber vê li gorî baweriya yarsanan wexta ku yek dibe yarsan li ayînan gwîz tê şikîndin, ev jî tê wê wateyê ku ew kes serê xwe teslîm dike.<sup>189</sup> Di vê kelimê de behsa vê gwîzê û ayînê tê kirin:

Remzbar meremû:  
Gerd bîn ew zî gerd bîn ew zî  
Karxaneyê Xacam gerd bîn ew zî  
Îd asuwarenan kewser ew hewzî  
Ew yurtê Qedîm westin ew cewzî<sup>190</sup>

---

<sup>188</sup> S.T., r. 97

<sup>189</sup> ji bo şikîndina gwîzê û ayîna ji bo ku yek bibe yarsan, bnr: D.G.H., r. 683

<sup>190</sup> D.G.H., r. 648

*(Remzbar dibêje*

*Derya kom bûn derya kom bûn*

*Karxaneyê Xacam li derya kom bûn*

*Niha suwar e kewser hawuza wî ye*

*Ew yurdê Qedîm xwe avête gwîzê)*

Di dema Sultan Sehak de, ji bo civaka ku îro em wek yarsan dizanin, sîstemeke civakî hatiye avakirin ji aliyê Sultan ve û ev sîstem îro jî berdewam dike. Li gorî vê sîstemê, kesên ku yarsan in an jî dû re dibin yarsan, divê bibin xwedyê delîl û pîrek. Ev delîl û pîr dikare ji emrên cihê bê hilibijartin. Ji bo pêkanîna vê rêbazê, Sultan Sehak bixwe jî ji bo xwe hem delîl hem jî pîrek hildibijêre. Bi hilibijartina wî, Pîr Binyamîn dibe pîrê Sultan. Ji ber vê Remzbar jî Pîr Binyamîn wek pêşengek dibîne, li gorî wê, Pîr Binyamîn ji erd heta behran, pêşengê her tiştî ye heta Şah bixwe jî serê xwe teslîmî Pîr Binyamîn dike. Remzbar dîsa behsa şert û îqrarê dike û dibêje ku Pîr Binyamîn ev şert û îqrara yarsanan bi cih aniye:

Remzbar meremû:

Ha Pîr Binyamîn î tu serqîtar î

Pîrê serqîtar çe ber ta bar î

Wekîl Wesî îxtiyardar î

We îqrarî Şah vîş ser pêyet siperden

We îqrar heddit we hedgah birdin

Her çi biwaçî reda û rasiyen

Binayiyê dîdeyê Heqşinasiyen<sup>191</sup>

---

<sup>191</sup> S.T., rr. 60-61

*(Remzbar dibêje:*

*Ha Pîr Binyamîn tu pêşengê kerwanê yî*

*Pîrê pêşeng î ji erd heta behran*

*Wekîlê her tiştî yî*

*Şah bixwe jî serê xwe teslîmî te kir*

*Te îqrar bi cih anî*

*Her çi bêjî alîkarî û rastî ye*

*Heqşinasê dîtîne yî)*

Remzbar di vê kelama xwe de dîsa behsa girîngiya Pîr Binyamîn dike, weku dibêje Pîr Binyamîn alîkarê Yaran e. Wiha berdewam dike ku, ji bo hemû kesî yek Xweda heye ji bo hezaran jî Mîrek heye. Li vir jî bi Mîr qesta wê Pîr Binyamîn e. Her wiha Dawud wek rehber û Pîr Mûsî jî wek wezîr dibîne. Her wiha dibêje ku Xweda yek Xweda ye û Pîr jî yek Pîr e:

Remzbar meremû:

Binyam we Yar destgîrin

Î guwa û beyayî Şah we Yar destgîrin

Xwandekar Xudayê Heftad û du Pîr in

Hezar yek Xuda hezariş Mîr in

Dawud rehberin Mûsî wezîr in

Xuda yu yuwin Pîr her yek Pîr in<sup>192</sup>

*(Remzbar dibêje:*

*Binyam alîkarê Yar e*

---

<sup>192</sup> h.b., rr. 59-60

*Ji beyawbestê ve ew e alîkarê Şah û Yar  
Xwandekar Xwedayê Heftê û du Pîr e  
Xweda yek e ji bo hezaran jî Mîr yek e  
Dawud rêber e Mûsî wezîr e  
Xuda yek yek e Pîr her yek Pîr e)*

Remzbar di vê kelama xwe de behsa *dûnadûn* dike û dibêje, Şah ev tişt wek kar daye wan, her wiha wisa diyar dike ku hukmê erd û asîmanan di destê wî de ye:

Remzbar meremû:

Kirdin we pîşe  
Şaman dûnadûn kirdin we pîşe  
Hukmê asuman û zemîn we pêş e  
Vîş xeberdarin xeberker vîşe<sup>193</sup>

*(Remzbar dibêje:*

*Kir karê me  
Şahê min dûnadûn kir karê me  
Hukmê asîman û zemîn ji destê wî ye  
Ew bixwe xeberdar e xeberker ew e)*

Remzbar dîsa behsa şert û îqrar dike. Dibêje ku Pîr Binyamîn şertê Şah e, ji berê de heta niha şertê Şah e û ev şert bi cih aniye. Ji lewhaya ku beriya dinyayê heta qelema ku li dinyayê pê hatiye nivîsîn, ango ji ga heta masî, ev şert hatiye bicihanîn.

---

<sup>193</sup> *h.b.*, r. 16



Li gorî kevneşopiya yarsanan masî li ser ga û dinya jî li ser masî ye. Her wiha diyar dike ku hemû sirrên Îlahî ji bo Pîr Mûsî eşkere ne:

Remzbar meremû:

Binyamîn şertê îqrarê Şamî

Pîrê pêşqedem îqrarê Şamî

Çe bala ta Yî<sup>194</sup> hem şertê Şamî

Çe lewh ta qelem çe gaw ta mahî

Penit izharen sirrê Îlahî

Perî Yaranit bide guwahî<sup>195</sup>

*(Remzbar dibêje:*

*Binyamîn tu şertê îqrarê Şahê min î*

*Pîrê pêşeng ê îqrarê Şahê min î*

*Ji jor heta dema Ya tu şertê Şahê min î*

*Ji lewha heta qelem ji ga heta masî*

*Hemû sirrên Îlahî eşkere ne ji bo te*

*Ji bo Yaranê xwe şehadet bide)*

Di vê kelimê de Remzbar dîsa behsa Pîr Mûsî dike û bi sifata "Siyah Kuhnişîn" bangî wî dike. Nivîsa wî dişibîne zêr û bi xwe jî wek mucewherek dibîne. Ji ber ku Pîr Mûsî wek nivîsevanê Sultan Şehak tê dîtin û her tiştî di Deftera xwe de dinivîse, Remzbar li vir behsa wê jî dike û dibêje ku tapûya deftera heftê û dû dînan di destê wî de ye. Dixwaze ku bila îqrarî wî Pîrî bike ku bi destê wî digre û alîkariya wî dike:

<sup>194</sup> Li gorî yarsanan, mîtolojiya afirandinê di serî de Zatê Heqq "Y" bû, bnr. *Dîwanê Xan Elmas*, r. 69

<sup>195</sup> *S.T.*, r. 58

Remzbar meremû:

Siyah Kuhnişîn<sup>196</sup>

Mirdê mayedar Siyah Kuhnişîn

Yar goherî Yar sefid xettê zerîn

Qebaleyê Defterê heftad û du dîn e

Barû ev nezer bişkavû Defter

We îqrar key pey Pîrê Destwer<sup>197</sup>

*(Remzbar dibêje:*

*Siyah Kuhnişîn*

*Xwedyê cewherê Siyah Kuhnişîn*

*Mucewherê Yar bi xeta spî û zêrîn*

*Tapûya Deftera heftê û du dînan*

*Vê nezerê bîne ber çav veke Defterê*

*Ji bo Pîrê Destewer îqrar ke)*

Di vê kelama xwe de Remzbar behsa girîngiya Yar, kirasguhertin û çar ferîşteyên sereke dike. Ji Yaran re dibêje "xwedyê hûş" ango "hişyarbûn" û ji wan re behsa girîngiya *dûnadûnê* dike, yanî dibêje lixwekirina cilên nû bingeha "yarbûn"ê ye. Her wiha diyar dike ku her çar koşeyê alemê, ji çar melekên sereke pêk hatiye û şertê yaran jî bi piyên wan melekan ve hatiye girêdan. Weku diyar dike, dinya li ser van her çar melekan hatiye avakirin û ev her çar, pêşeng in. Yê ku di rêya Heq de êşê dikşînin ev her çar melek dibin wek dermanekî ji bo wan. Her wiha vê jî diyar dike ku çî qas êşê bikşînin jî, çî qas xwe ji bo Xwedê têxin înzîwayê jî, cihê ku herî dawî karibin biçin cihê wan her çar melekan e:

<sup>196</sup> "Siyah Kuhnişîn" sifatekî Pîr Mûsî ye û "kuhnişîn" yê ku li çiyayê rûdine, "siyah" jî reş e.

<sup>197</sup> S.T., r. 63

Remzbar meremû:

Hûş Yaran hûş

Mirdane ezel hûş Yaran hûş

Me'rîfet muhrin çe perdeyî sirpûş

Binayê Yarin cameyê nû we nû îş

Çahar qurneyê cîhan mewû we çahar cese

Şertî win we payê çahar cese bese

Çahar ten çahar lenger hem cîhangîr e

Hem serqîtar e hem ew Yar Pîr e

Hem xatircem'î riyazetkişan e

Ye ser menzilgah ye hedgaşan e<sup>198</sup>

*(Remzbar dibêje:*

*Hûş Yaran hûş*

*Ey yên ku ji ezel hatine hûş Yaran hûş*

*Me'rîfet li pişt perdeya sîrrê hatiye mohrkirin*

*Lixwekirina cilên nû bingeha Yar e*

*Çar koşeyên cîhanê ji wan her çar ferîşteyan e*

*Şertê we bi piyên wan her çaran hatiye girêdan*

*Çar ten bi çar hesinan dinyayê girtine*

*Hem pêşeng in hem jî Yar Pîr in*

*Dilê wan bi riyazetkişandinê rihet e*

*Menzilgeha herî dawî cihê wan her çaran e)*

---

<sup>198</sup> h.b., r. 45

Remzbar di vê kelama xwe de behsa *Cemê* dike, weku dibêje wext û saet wadeyê kerem e û li *Cemê*, wext wextê qebûlkirina *Çilane* ye. Weku dibêje wê rojê kê ji dîn dûr bikeve ew ê şermezar bibe û dê xelata wî jî kê m be. Yê ku şertên yarsaniyê bi cih tînin *kirdar* dikin û dû re roja dîn xelata xwe jî distînin:

Remzbar meremû:

Yaran kerem e

Ça wext û saet wadeyê kerem e

Guwahî erkanê Çilan e we Cem e

Pîr we Padişam perwane we şem e

Her Yarî ew roj çe dîn wareme

Ferda şermesar xelatiş xem e

Yarê şert şûn kirdar<sup>199</sup> mikalûn

Xirmeniş westin ferda memalûn<sup>200</sup>

(*Remzbar dibêje:*

*Yaran kerem e*

*Wext û saetê wadeyê kerem e*

*Li Cem wextê qebûlkirina erkanê Çilan e*

*Pîr perwane ye Padişah mûm e*

*Yarê ku wê rojê ji dîn dûr bikeve*

*Sibê şermezar e xelata wî kê m e*

*Yarê ku şertê kirdariyê diçînin*

*Sibê xelata xwe distîne ji wê çandiniyê)*

<sup>199</sup> "kirdar" di hemû karan de nayê bikaranîn. Peyveke teknîk e. Li cem yarsanan ji bo pêkanîna şertan, şerjêkirina qurbanan, pêkanîna çar rastiyan de, hwd. tê bikaranîn.

<sup>200</sup> S.T., rr. 52-53

Remzbar li ser pêşerojê diaxive di vê kelama xwe de, li gorî wê ew ê dinya pîr tevlihev bibe û her der bi dek û dolaban tijî bibe. Dê her tişt bibe pere û pûl, çiyayê Serendîl dê bi qirêjayî wer bibe:

Remzbar meremû:

Pîr mekr û hîle

Ça wext cihan aşûbin pîr mekr û hîle

Zerreyê Yar zerrin çe qeba û puyle

Serendîlî pol qeltane boyle

Cayê payê iltimasê Pîr û Delîl e<sup>201</sup>

*(Remzbar dibêje:*

*Pîr mekr û hîle*

*Wê wextê cihan dê bibe tevlihevî û mekr û hîle*

*Zerreyê Yar dê bibe pere û pûl*

*Pola Serendîl bi qirêjayî wer bibe*

*Wê çaxê ew cih dê bibe cihê iltimasa Pîr û Delîl)*

Remzbar di kelameke xwe de behsa Abidînê Caf jî dike, weku em ê di beşa Nêrgiz Xanimê de behs bikin, Abidînê Caf piştî dibe yarsan. Remzbar yarsanbûna Abidîn wek azadiyekê dibîne û piştî ku Abidîn azad dibe, Remzbar jê re vê kelamê dibêje:

Remzbar meremû:

Abidîn bi xêr hatî tu serî giyaniman

---

<sup>201</sup> h.b., rr. 19-20

Her ke weku tu der çî li meydaniman  
Xweşewîstî Şa ye ev nûrî îmaniman  
Qedemê bavêje qedem bem cih û mekaniman<sup>202</sup>

*(Remzbar dibêje:*

*Abidîn bi xêr hatî tu ser canê min hatî*

*Her kesê ku karibe ji meydanê derkeve*

*Ev nûr û îman hezkiriyê Şah e*

*Gav bavêje wan cih û mekanan)*

Remzbar di vê kelama xwe de behsa yarsanan dike ku li gorî wê gelê yarsan ji axê hatiye pakkirin, ango seridandin. Behsa jiyana nû jî dike û dibêje cihê ku dê yarsan biçin cihekî xweş e. Yanî axireta baqî wek mala wan dibîne. Her wiha li ser rêya Heq jî disekine ku ev rê rêya rastiye ye:

Remzbar meremû:

Vala vêtane<sup>203</sup>

Guruyê Yar ve xak vala vêtane

Eşqê Heq ce ser şet vêtane

Çe menzilgatan kam ca cêtane

Rayê Heq rasiyen rasî rêtane

Ye qebzê îqrar şertê Şatan e

Baqî axîret menzilgatane

Ye damî bela ye belatan e

Şadî pay sitûn kuyê telatan e<sup>204</sup>

<sup>202</sup> D.G.H., r. 561

<sup>203</sup> "Vala vêtane" gotineke yarsanan e, wateya wê pakbûn, seridandin e.

*(Remzbar dibêje:*  
*Hatiye seridandin*  
*Koma yar ji axê hatiye seridandin*  
*Eşqa Heq di serê dînan de ye*  
*Tiştên xweş li menzilan e*  
*Rêya Heq rastî ye rastî rêya we ye*  
*Meqbûza we îqrarê şertê Padişaha we ye*  
*Axîreta baqî menzila we ye*  
*Ev dapika belayî belayê we ye*  
*Rizgariya we li bin sitûna çiyayê zêrîn e)*

Sîmûrg figureke mîta îranî-kurdî ye û di dema Îslamê de, di edebiyata tesewwufî<sup>205</sup> ya îranî de bûye semboleke mezin. Wek Shahab Vali nîşan dide koka vê peyvê "Sîn Morg" e, bi zimanê avestayî "Saena" û bi farisî "Sîmorgh"<sup>206</sup> û bi kurmancî jî wek "Sîmûrg" tê zanîn.

Wek Vali diyar dike di Şahnameya Fîrdewsî û Kurdî<sup>207</sup> de peywendiya Sîmûrg û Zal hatiye nîşandan. Wexta ku Zal çêbûye bavê wî Sam ew nexwestiye. Bi daxwaza bavê wî, zilamên wî ew birine ber çiyayê Elburzê, ku ji însanan pir dûr e û pir tav lê dide. Hêlîna Sîmûrg li ser vî çiyayî ye. Wexta ku çêlikên Sîmûrg birçî dibin û Sîmûrg xwe ji çiya berdide jêr zarokê nû çêbûyî dibîne ku ji birçiyên digirî. Xwedê wê demê rehmê dixê dilê Sîmûrg ku wî zarokî bibe xwedî bike. Sîmûrg radihêje wî zarokî biriye hêlîna xwe. Piştî demekê wexta ku zarok êdî mezin dibe bavê wî Sam biryar dide ku biçe kurê xwe bîne. Sîmûrg jî jor dibînee ku Sam û

---

<sup>204</sup> S.T., r. 30

<sup>205</sup> bnr. Attar, Feridüddin, *Mantiku't Tayr, Kuş Dili*, çev. Ayhan Yıldırım, Ataç, 3. Baskı, 2015

<sup>206</sup> Vali, *Les Yârsâns, Aspect Mythologiques-Aspects Doctrinaux*, r. 392

<sup>207</sup> Vali, "Nêrîneke giştî ya li ser Şahnameya Fîrdewsî û Şahnameya Kurdî", di *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî, Dîrok- Teorî- Rêbaz- Lîteratur- Berawirdî-1* de, amd. Ramazan Pertev, Avesta, İstanbul, 2015, rr. 275-296

zîlamên wî tîn, fam dike ku ew ê kurê xwe bibe. Sîmûrg axaftin hînê Zal dike, lewre Zal qet naşibe însanan û nizane biaxive. Wexta ku Sîmûrg ew berdide, jê re dibêje ku ew bi çêlikên xwe mezin kiriye, rehm, evîn û hezkirin xistiye dilê wî û divê van tiştan ji bîr neke. Her wiha jê re dibêje ku textek mezin ew ê bibe wek hêlînek jê re û tacek zêrîn dê bibe wek baskên wî.<sup>208</sup>

Sîmûrg di kevneşopiya yarsanan de xwedî cihekî girîng e. Li gorî baweriya wan Sîmûrg di bedena Remzbar de enkarne bûye û Remzbar jî di vê kelama xwe de vî tiştî diyar dike û xwe wek Sîmûrg nîşan dide. Çawa ku Sîmûrg alîkariya Zal kiriye ew jî xwe wek alîkara Rustem nîşan dide:

Remzbar meremû:

Ew sayê şemî ew sayê şemî

Bargeyê Şam westin ew sayê şemî

Çenî Sê Tene biyam derhemî

Sîmurg beyanî ce rayê Rustemê<sup>209</sup>

*(Remzbar dibêje:*

*Li bin siya mûmê li bin siya mûmê*

*Koşê Şah niştecih bû li bin siya mûmê*

*Ligel Sê Beden (Sê Ten) tevlihev bûm*

*Wek Sîmurg ji bo Rustem)*

Me hewl da ku di beşa Xatûn Dayrak (Remzbar) de cih bidin kelimên ku Remzbar bixwe gotine û em ê ji niha pê ve cih bidin kesên ku li ser girîngî, şefaati, naz û sirra Remzbar kelam gotine.

<sup>208</sup> Vali, *Les Yârsâns, Aspect Mythologiques-Aspects Doctrinaux*, rr. 393-394

<sup>209</sup> *D.N.Y.*, r. 123



### 2.2.8.1. Kalamên Yarsanî yên li ser Remzbar û Girîngiya Wê

Li gorî yarsanan, Heq ji aliyê Sultan Sehak ve ji bo Remzbar hatiye dayîn. Sultan Sehak di kelameke xwe de behsa Heq dike û dibêje heta ku kesek Heq nas neke dûrî her tiştî ye û tiştê ku dike vala ye. Yanî Sultan di vê kelama xwe de, girîngiya teslîmkirina serî nîşan dide. Li gorî wî, wexta ku yekî serê xwe teslîm neke, ango nebe yarsan, ew ê tiştek neyê hesabandin, her tiştê wî dê vala bê dîtin, heta li roja qiyametê ew ê neyê hesabandin jî. Dîsa dibêje kesê ku xwe teslîmî Heq dike, di *Deftera Pîr Mûsî* de tê tomarkirin. Her wiha, nîşan dike ku wî Heq daye Remzbara diya xwe, *Defter* daye Pîr Mûsî ku weku tê zanîn Pîr Mûsî nivîsevanê wî bû û her tiştî dinivîsî. Ji xeynî vê Sultan, Binyamîn wek saqîyê *Cemê Çilane* dibîne û Dawud jî wek rêber dibîne:

Sultan meremû:

Bê gawan gawî bê gawan gawî

Gaw bê gawan bê gawan gawî

Ta ser nesparim kirde welawî

Ta Heq neşnasin dûr ne gişt bawî

Her serî ne lû ve huzûrî Cem

Nesencû ve dest xelîfe û xadim

Bêşek ew sere ve tûmar nîyen

Ne rojê hesav ve şûmar nîyen

Tomar Pîr Mûsîyê Qelem Baqîyen

Cemê çilane Binyam saqîyen

Rehber Dawudîn des ve daman gîr

Şert dam ve Binyam Heq dam ve Rezbar

Defter Pîr Mûsî naz ve Yadigar<sup>210</sup>

<sup>210</sup> h.b., r. 113

*(Sultan dibêje:*

*Bê gavan ga nabe*

*Ga bê gavan gavan bê ga nabe*

*Heta ku hûn serê xwe teslîm nekin tiştên ku hûn dikin vala ne*

*Heta ku we Heq nas nekir hûn dîr in ji her tiştî*

*Seriyê ku naçe huzûra Cem*

*Heta ku nekeve ber destê xelîfe û xadim*

*Bê guman ew serî di tomar de nayê qeydkirin*

*Li roja hesabê ew serî dê neyê hesibandin*

*Qelesa tomarê ya Pîr Mûsîyê Baqî ye*

*Saqiyê Cemê Çilan Binyamîn e*

*Rêber Dawud e bigre pêşka wî*

*Min Şert da Binyamîn Heq da Rezbar*

*Min defter da Pîr Mûsî naz da Yadîgar)*

Ev helbest girîngbûna Remzbar nîşan didin û sirra wê qebûl dikin. Taybetiya wê jî wek ferîşte, xwedîbûna sirran bû. Weku di van her du kelaman de hatiye nîşandan Sultan jî dixwaze ku bi sirra xwe duayê xwarinê bike û her wiha Binyamîn diyar dike ku ew bixwe û ferîşteyên din ji Remzbar hatine:

Sultan meremû:

Ey Pîre eyan ey Pîre eyan

Penit me'lûme ey Pîre eyan

Pûse biyam mew şîve heştiman

Biwaçe Remzbar ew lale û aman

Heşt loqme nî'met binêrîn çe xan

Baweriş wêy gah binîş çe miyan  
Her yek yek remzî nûş kêyn çe îman<sup>211</sup>

*(Sultan dibêje:*

*Ey Pîrê aşîkar ey Pîrê aşîkar*

*Tu dizanî ey Pîrê aşîkar*

*Wisa hatin her heştê me*

*Bêje Remzbar duayê xwe bêje*

*Heşt loqme nî'met bişîne sifrê*

*Bîne û li ortê rûne*

*Ji bo her yek sirrek noş bike)*

*Binyamîn meremû:*

*Ey Pîrê Remzbar ey Pîrê Remzbar*

*Dexîlin ew tu Ey Pîrê Remzbar*

*Emrê Xacam e Şahê leyl û nehar*

*Heşt luqme nî'met pey taqîqe kar*

*Binêriş der dem ne xanê esrar*

*Ez wîş ew to yî heşt xaliqê asar*

*Ta ke Xacaman ce sir bû aşîkar<sup>212</sup>*

*(Binyamîn dibêje:*

*Ey Pîrê Remzbar Ey Pîrê Remzbar*

*Em xwe dispêrin te Ey Pîrê Remzbar*

*Emrê Xacayê min e Şahê şev û rojê*

<sup>211</sup> D.G.H., r. 443-444

<sup>212</sup> h.b., r. 444

*Ew heşt loqme nî'met ji bo pêkanîna kar e*  
*Ji sifreya sirr wê heşt loqmê çêke zû bi zû*  
*Ez bixwe ji te me û ew heşt mexlûq jî*  
*Sultan bi çêkirina van xwe aşîkar bike)*

Pîr Binyamîn dîsa di vê kelama xwe de behsa girîngiya barê Remzbar dike. Wek kevneşopiya yarsanan, Pîr Binyamîn jî cih dide girîngiya sirra Remzbar. Weku dibêje îqrara wê jî şerta wê jî şidayî ye. Her wiha diyar dike ku *Heften* jî şîrîkê wî barî ye û Melekê Teyyarê ku di dawîya kelimê de tê behskirin sifateke Baba Yadîgar e û mirov dikare wek melekê ku difire pênase bike:

Pîr Binyamîn meremû:

Lutfî keremin

Beyayê Pîr Remzbar lutfî keremin

Remzbar remz bar kanê keremin

Çe xatircemî xatiriş cem in

Îqrariş bitûyn şertiş muhkemin

Baqiyê malê Yar Çilane Cem in

Şerîk bî we bar

Heften we mewcûd şerîk bî we bar

Binyam û Dawud Pîr Mûsî Remzbar

Mistefa û Êywet Melekê Teyyar<sup>213</sup>

*(Pîr Binyamîn dibêje:*

*Lutfê kerem e*

---

<sup>213</sup> S.T., r. 46

*Beyawbestê Pîr Remzbar lutfê kerem e*  
*Remzbar sirrbar e gencîneya keremê ye*  
*Dilê wê rihet e ji rihetiyê*  
*Îqrara wê hişk e şertê wê hişk e*  
*Yarên din baqiyên Cema Çilane ne*  
*Bûn şîrîkê wî barî*  
*Heften mewcûd bû û bû şîrîkê wî barî*  
*Binyam û Dawud Pîr Mûsî Remzbar*  
*Mistefa û Êywet Melekê Teyyar)*

Pîr Binyamîn dîsa cih dide sirra Remzbar di vê kelama xwe de her wiha car din diyar dike ku Remzbar şîrîkê barê yaran e. Wê wek efendiyê dinyayê dibîne û dibêje ku xizmetkarê xizmetê ye. Remzbar her çi bêje ji bo wan wek senedek tê qebûlkin û her wiha jê re dibêje ku mehrema sirrê ye û rêya çavê wê vekiriye, ango dikare her tiştî bibîne:

Binyamîn meremû:  
Pîr Remzbar tu remz bar î  
Ew Yaran Yar î şîrîkê bar î  
Xadimê xîdmed mexdûmî şar e  
Tîq zeban î dest kirdar î  
Her çi biwaçî qebz û îqbaz e  
Mehremê raz î rayê 'eynit waz e<sup>214</sup>

---

<sup>214</sup> h.b., r. 60

*(Binyamîn dibêje:*

*Pîr Remzbar tu remz bar î*

*Ji bo Yaran Yarê şîrîkê bar î*

*Xadimê xizmetê yî xwediyê dinyayê yî*

*Zimanê te wek şûr e destê te di kirdarê de ye*

*Her çi bêjî ew belge û sened e*

*Mehremê sîrrê yî rêya çavê te vekiriye)*

Remzbara ku yek ji ferîşteyên *Heften* e jî alîkariya *Heftewan* kiriye û ferîşteyên din jî şahidiya vî tiştî kirine. Sirra Remzbar dîsa di vê kelimê de hatiye gotin. Her wiha Sultan diyar dike ku *Heftewan* bi nûra wî çêbûye:

Sultan meremû:

Binyam bişmare Binyam bişmare

Perî Heftewan guwah bişmare

Îne şertê sîrrê ezel îqrare

Beyawbesê dîn kirdîm izhare

Heftewan ce nûrê vîm kird îşare

Şahidî bider biker exbare

Mirdan bişniwan nuwan înkare

Heftewan destgîr aman pey Yare

.....

Dawud Binyamîn Pîr Mûsî Remzbar

Yarê Zerdebam Mistefa Ruçiyar

Şahidê biyan perî Cemê Yar

Destgîr Heftewan pê şert û îqrar<sup>215</sup>

*(Sultan dibêje:*

*Binyam bijmêre Binyam bijmêre*

*Ji bo tesdîqkirina Heftewan bijmêre*

*Ev e şertê sirrê îqrarê ezel*

*Me beyawbesê (şert) dîn eşkere kir*

*Min Heftewane ji nûrê xwe çêkir wek îşaret*

*Şahidiya vê xeberê bike û bêje*

*Ey xelq seh bikin û înkâr nekin*

*Heftewan ji bo alîkariya Yar hatin*

.....

*Dawud Binyamîn Pîr Mûsî Remzbar*

*Yarê Zerdeba Mistefa Ruçîyar*

*Şahid hatin ji bo Cemê Yar*

*Alîkariya Heftewan kir bi şert û îqrar)*

Li gorî yarsanan, Remzbar di heman demê de yek ji çar lingên textê ezêlî yê Sultan e. Ê sirra her pêncên *Heftan* e. Weku Sultan diyar dike naz û şert her tişt di nav sirra Remzbar de ye. Sultan li ser vê dibêje:

Sultan meremû:

Ew xizmetê pak kirde Pîr Rezbar

Texte ezêliyim payeş hen Çwar

Remzê Pênc Tenî Remzbarim hişyar

---

<sup>215</sup> D.G.H., r. 450

Ew nazê Zerdebam ew şertê Rûçiyar<sup>216</sup>

*(Sultan dibêje:*

*Pîr Rezbar wê xizmeta pak kir*

*Çar pêyên textê min ê ezeli hene*

*Sirra Pênc Ten Remzbar e*

*Ew nazê Zerdebam ew şertê Rûçiyar)*

Sultan di vê kelama xwe de dîsa behsa Remzbar dike û taybetiya wê remzbariyê (sirbarî) tîne zimên û li gorî ku Sultan diyar dike, Remzbar sirrên Sultan jî bar dike. Wekî din cih dide Binyamîn jî û wî hem wek pêşeng hem jî wek Pîrê şertê dibîne, Dawud wek ruhê xwe dibîne û li gorî kevneşopiya yarsanan Dawud rêber e, her wiha Sultan jî wî wek rêberê xwe dibîne. Pîr Mûsiyê wezîrê xwe wek çavê xwe yê rastê pênase dike, ev tê wê wateyê ku wî pîr nêzîkê xwe dibîne û wek defterdarê serdema xwe diyar dike:

Padişah meremû:

Binyamîn Yarê helalin heram nemiwen

Îqrarî kirdim betal newimen

Binyam Pîrê şert hem pêşewamin

Ruhim Dawudin rehnemayê ramîn

Pîr Mûsî Wezîr dîdeyê rasê min

Defterdarî dewr Yarşinasimin

Remzbar remzê barê remzbarimin

Kirdariş piştê barê guruyê Yarimin<sup>217</sup>

---

<sup>216</sup> h.b., r. 691



*(Padişah dibêje:*

*Binyamîn Yarên helal heram nabin*

*Min îqrarek kir betal nabin*

*Binyam Pîrê şert e hem pêşeng e*

*Dawud ruhê min e rênîşanê rêya min e*

*Pîr Mûsî Wezîr e çavê min ê rastê ye*

*Defterdarê dewrê min e Yarşinasê min e*

*Remzbar sirbarê sirrên min e*

*Karê wê barê grûba Yarên min e)*

Sultan Şehak di vê kelama xwe de diyar dike ku her tişt ji bo Remzbar bi hêsanî diyar e, yanî tiştê ku jê veşartî tune ye û her tişt eşkere ye:

Padişah meremû:

Remzbar we asan

Çenit me'lûm bû Remzbar we asan<sup>218</sup>

*(Padişah dibêje:*

*Remzbar bi hêsanî*

*Her tişt diyar e ji bo Remzbar bi hêsanî)*

---

<sup>217</sup> S.T., r. 28

<sup>218</sup> h.b., r. 63

Sultan di vê kelama xwe de girîngiya Remzbar a wek pîvana baş î û xirabiyê diyar dike, her wiha Remzbar wek şertê xwe, Dawud wek delîlê xwe, Pîr Mûsî jî wek defterdar nîşan dide:

Padişah meremû:

Îde min îqrar

Mirdan mirdan e îde min îqrar

Îqrarim Pîr e şertê min Rezbar

Delîl im Dawud Yar Dawud Yar

Mûsî Qelemzen zêrîn Defterdar

Pîre mîzan e xadimin Remzbar <sup>219</sup>

*(Padişah dibêje:*

*Ew e îqrarê min*

*Gel gel e ew e îqrarê min*

*Îqrarê min Pîr e şertê min Remzbar e*

*Delîlê min Dawud e Yar Dawud Yar*

*Mûsî Qelemzenê zêrîn e Defterdar e*

*Pîrê pîvana başî û xirabiyê Remzbar e)*

Dawud di vê kelama xwe de bangî Binyamîn dike û jê re dibêje ku Padişah bixwe îqrar daye, her wiha ew jî behsa Remzbar dike û wek kelama li jor, ew jî Remzbar wek pîvana her tiştî dibîne, vî tiştî jî nîşan dide ku Pîr Mûsî jixwe vê taybetiya Remzbar qeyd kiriye:

---

<sup>219</sup> h.b., rr. 7-8

Dawud meremû:  
Pîre îqrarin  
Pîre Şah vîş îqrar da  
Rastî kirdarin  
Pîr Mûsî mîzanî gird çe Rembzarin  
Naziş rewa ha şerîkê barim  
Menzil baqiyen hedgaş teyar in  
Erkan besteyê Xwawendekarin<sup>220</sup>

*(Dawud dibêje:  
Pîr îqrar e  
Ey Pîr Şah bixwe îqrar da  
Rastî kirin e  
Pîr Mûsî nivisiye Remzbar pîvan e  
Naza Remzbar rewa ye ku şirîkê vê barê ye  
Menzîl baqî ye sirr paqij in  
Erkan girêdayî Xwawendekar in)*

Binyamîn jî girîngiya Remzbar tîne zimên û wê wek şert qebûl dike û di vê kelama xwe de girîngiya ferîşteyên din jî tîne zimên. Dawud wek yar û rêber, Remzbar wek şert, Pîr Mûsî wek sirra xwe û wek bingeha xwe jî Zat yanî Xwedê dibîne:

Binyamîn meremû:  
Ya Şah Dawud min Yar

---

<sup>220</sup> h.b., r. 15

Şertim Remzbarin  
Hedgam Pîr Mûsîyin çî Defterdarin  
Meylim rasiyin kawim îqrarin  
Binyayim tunî Zatit teyarin  
Dawud meharkeş<sup>221</sup> rehnemayê Yarin  
Menzil baqiyen Yar sengînbarin<sup>222</sup>

*(Binyamîn dibêje:*

*Ya Şah Dawud ji bo min Yar e  
Şertê min Remzbar e  
Sirrê min e Pîr Mûsî jî Defterdar e  
Meyla min rastî ye kabeya min îqrar e  
Bingeha min tu yî Zatê min ê pak  
Dawud meharkeşê rêya Yar e  
Menzil baqiyê Yarê barê giran e)*

Di vê kelimê de Feryad behsa çardeh fêkiyan dike ku ev çardeh fêkî temsîla *Heften û Heftewan* e, yê panzdemîn jî Xweda ango Sultan Sehak e. Her wiha peyva "Batin" a ku di kelimê de derbas dibe deftera Pîr Mûsî ye, yanî ev hemû fêkî di deftera Pîr Mûsî de tene tomarkirin:

Feryad meremû:

Remz û Dayrak ni ser xet gîlan  
Ne baxê Yarî şeftalî şêlan

---

<sup>221</sup> "meharkêş", di kerwanê de yê ku serkêşiyê dike.

<sup>222</sup> S.T., rr. 14-15

Lîmû çenî heng nexl û hinarê  
Hencîr û hengwêr bey zerd zarî  
Zeytûn û bayim findûqî şarî  
Serenc û turencê Buxara şarî  
Sêvê mewlayî baxçeyê zer karî  
Çardeh meyweyê pak Batin tûmar  
Panzdeş Xacamin sêvê xansarî<sup>223</sup>

*(Feryad dibêje:*

*Remz û Dayrak li ser xet geriyan*

*Li baxê Yar wek şeftalî û şêlan e*

*Wek lîmon, hingivîn, xurme û hinar e*

*Hejîr û tirî bihê zer*

*Zeytûn û bêv, bindeqê şehre*

*Serenc û turencê şehre Buxara ye*

*Sêvê zer ê baxçeyê zer e*

*Çardeh meyweyê pak li Batin tûmar bûye*

*Panzdemîn Xwedayê (Sultan) sêvê xansarî ye)*

Kelameke Xelîfe Şaşa təkiliya Sultan û Remzbar nîşan dide. Dibêje ku kengî Şah biçe xeybê bi Remzbar re diçe. Yanî her du her gav bi hev re ne, tu car ji hev venaqetin:

Xelîfe Şaşa meremû:

Her gahî Mewlam çe şertê îqrar

<sup>223</sup> D.G.H., rr. 670-671

Çenî Pîr Remzbar şîyan çe pîwar<sup>224</sup>

*(Her gav Mewlam ji şertên îqrar*

*Bi Pîr Remzbar re çûne xeybê)*

Li gorî kevneşopiya yarsanan, di nav wan de Remzbar bi taybetî temsîla paqijî, pakî û avê ye. Wexta ku xwe paqij dikin, ango di ayînên xweşûştinê de şerbika ku tê bikaranîn wek şerbika Remzbar tê zanîn. Her wiha "hawuza kewser" wek hawuza Remzbar tê dîtin, ango wek hawuza paqijiyê ya Remzbar û di kelimê de "hawuza teşarî" dişibîne "hawuza kewser" a Remzbar. Ev bûyera xweşûştinê û şerbika Remzbar di kelama Pîr Mûsî de wiha tê zimên:

Pîr Mûsî meremû:

Miştê Pîr û Padişah Xwawandekarî

Î awe pey niyetê hewzê teşarî

We camê rengînê destê Remzbarî

Memalî çi cameyê pîs û mirdarî<sup>225</sup>

*(Pîr Mûsî dibêje:*

*Miştê Pîr û Padişah Xwawandekarî*

*Ev av ji bo niyeta hawuzê teşarî ye*

*Şûşa rengîn ji destê Remzbar e*

*Cil û bergên qirêj ji xwe ke û bişo)*

---

<sup>224</sup> h.b., r. 447

<sup>225</sup> h.b., r. 684

Ava ku mirî pê têne şuştin dîsa bi ava Remzbar e. Wekî mînak Binyamîn di kelameke xwe de vî tiştî wiha tîne zimên:

Binyamîn meremû:

Pey cam Rezbar pak û dil temîz  
Quslî sifatman da pey cam merîz<sup>226</sup>

*(Binyamîn dibêje:*

*Bi şûşeya Rezbar a pak û dil temîz  
Me bi şûşê av rijand ser sifatan bo paqijiyê)*

Cihê Remzbar di duayê miriyan de jî heye, di vê duayê de Remzbar wek şefaatkara mahşerê tê dîtin, ango wek alîkar. Her wiha di vê duayê de tê nîşandan ku hesab û kitabê her kesekî ji aliyê Pîr Mûsî ve tê tomarkirin û roja hesabê ji bo Sultan tê pêşkêşkirin. Ferîşteyê ku ruh distîne Mistefa ye, ango Kemandar, her wiha tê diyarkirin ku wexta Mistefa ruhê yekî jê distîne bi awayekî baş pê re tevdigere. Duayê ku ji bo miriyan tê xwendin ev e:

Şertê teyar bû şertê teyar bû  
Iqrarid bitûn şertê teyar bû  
Pîrit Binyamîn Pîrê rêyabar bû  
Delîlit Dawud Şayê Kosuwar<sup>227</sup> bû  
Qabiz rûhit baş Kemandar bû  
Hesawit we des Pîrê Defterdar bû  
Hesaw kitawit sef ne tûmar bû

---

<sup>226</sup> *h.b.*, r. 685

<sup>227</sup> siwarê hespê boz

Teslîm we bargehê Şahê Xwawendekar bû

Mistefa çenit we weş reftar bû

Xatûnê mehşerit Daye Remzbar bû

Evvelit Yar bû axirit Yar bû

Evvel û axirit şert û îqrar bû<sup>228</sup>

*(Şertê kamil bû şertê kamil bû*

*Hemû îqrar şertê kamil bû*

*Pîrê Binyamîn Pîrê alîkariyê bû*

*Delîlê te Dawudê Şahê Kosuwar bû*

*Yê ku ruhê te girt Kemandar bû*

*Hesabê te di destê Pîrê Defterdar de bû*

*Hemû hesabê te rêz bi rêz tomar bû*

*Ev hemû teslîmê Şahê Xwawendekar bû*

*Mistefa li hemberî te baş tevgeriya*

*Xatûna mahşerê Dayê Remzbar bû*

*Evvelê te Yar bû axirê te Yar bû*

*Evvel û axirê te şert û îqrar bû)*

Têgeha "Naza Remzbar" di baweriya yarsanan de pir girîng e û gelek kes di kelimên xwe de behsa "Naza Remzbar" dike. Remzbar şefaati dike û bi naza xwe şefaati Sultan jî dike. Ji ber vê di gelek kelaman de derbas dibe û li ser vê naza Remzbar sond tê xwarin. Her wiha alîkariya (reda) Dawud û naza Remzbar di *Deftera Pîr Mûsî* de yek e li gorî Sultan. Di vê kelimê de naza Remzbar û sonda ku li ser tê xwarin tê vegotin:

---

<sup>228</sup> D.G.H., r. 688



Padişah meremû:

We dîdeyê Binyam we nazê Remzbar

We redayê Dawud Mûsî Defterdar

We yektayî vîm we şert û îqrar

Îqrar kirdinim nedarû inkar<sup>229</sup>

*(Padişah dibêje:*

*Bi çavê Binyam bi naza Remzbar*

*Bi alîkariya Dawud Mûsî Defterdar*

*Bi yektayiya xwe bi şert û îqrar*

*Di îqrarkirina min de tune ye înkâr)*

Sultan di vê kelama xwe de behsa ferîşteyên xwe dike û dibêje ku ferîşte êdî bi wî re hatine girêdan, yanî Şah ew hilbijartine ji bo xwe û di dawiya dinyayê de ew ê wek Şah bi wan re be. Her wiha di vê kelimê de Sultan behsa kirdara Remzbar jî dike:

Padişah meremû:

Remzbar ye hedgat e

Ye hed ye hedgayê menzilgatanim

Damê şert û şûnê Heq we patane

We ferdayê baqî Şah we latane

We ehdê îqrar we şertê dûsî

Hem tu hem Binyam Dawud Pîr Mûsî

Mirdanê we hîmmet Remzbar we kirdar

---

<sup>229</sup> S.T., r. 20

Şadin we cemalê Padişahê keremdar <sup>230</sup>

*(Padişah dibêje:*

*Remzbar sînore we ye*

*Ev sînor sînore menzilgaha we ye*

*Dapika şert û merca Heq êdî bi pêyên we ve hatiye girêdan*

*Di dawiya dinyayê de Şah bi we re ye*

*Bi ehdê îqrar bi şertê dostaniyê*

*Hem tu hem Binyam Dawud Pîr Mûsî*

*Gelê bi hîmmet kirdara Remzbar heye*

*Şad in bi cemalê Padişahê keremdar)*

### **2.2.9. Pîr Nazdar Xatûnê Şîrazî**

Li gorî kevneşopiya yarsanan Pîr Nazdar Xatûnê Şîrazî di sedsala 14 û 15mîn a P.Z. de jiyaye. Di serdema Sultan Şehak de jiyaye û ji pîrên heftê û duyan bûye. Li Şîrazê hatiye dinyayê. Di dawiya jiyana xwe de veşeriyaye Şîrazê û li wir jiyana wê bi dawî bûye.<sup>231</sup>

Weku ji Pîr Nazdar xuya dibe, di çanda yarsanan de jin jî dikarin bibin "Pîr". Ev rewş ji bo statuya jinê pîr girîng e, lewre ev yek li cem yarsanan dîsa wekhevîya jin û mêran nîşan dide.

Di edebiyata yarsanan de du beytên wê tenê hene. Li gorî kevneşopiya yarsanan çar şertên yarsaniyê hene û bêyî van her çar şertan mirov nikare bibe yarsan. Pîr Nazdar di vê kelama xwe de behsa van her çar şertan dike û riya rastiye wek riya Heqq nîşan dide:

---

<sup>230</sup> *h.b.*, r. 65

<sup>231</sup> *D.N.Y.*, r. 172

Yaran yaweran rayê Heq rasiyen

Pakî û durûstî û reda û xasiyen<sup>232</sup>

*(Yar û yawer riya Heq riya rastiye ye*

*Pakî û durûstî û reda û xasî ye)*

Pîr Nazdar di vê kelama xwe de dibêje kesê ku wek Muhemmed xwe nas dike, bê guman Mewla jî nas dike:

Her kes wîş nasa Muhemmed asa

Bêşek ew kes e Mewla îş şinasa<sup>233</sup>

*(Her kes xwe bixwe nas kir wek Muhemmed*

*Bê guman ew kes Mewla jî nas dike)*

#### **2.2.10. Nêrgiz Xanim Şahrizûrî**

Li gorî kevneşopiya yarsanan, Nêrgiz Xanim di sedsala 14mîn a P.Z. de jiyaye û li Şahrizûrê hatiye dinyayê. Keça Mela Şukrullah e. Di 18 saliya xwe de bi Abidînî Caf re zewiciye û her çiqas bavê wê hember derkeve jî, wek mêrê xwe, wê jî dînê xwe guheriye û bûye yarsan. Li gundê Şêxan bi cih bûne. Di serdema Sultan de yek ji tenbûrvanên navdar bûye. Kelamên xwe bi zaravayê soranî gotiye.<sup>234</sup>

Nêrgiz Xanim di vê kelama xwe de girîngiya Sultan, dînê wî û Cemê tîne zimên. Li gorî wê, kesên ku ji Sultan bawer nekin û neyên ser dînê wî, ew pûtperest in. Her wiha behsa *deftera* Pîr Mûsî jî dike û dibêje kesên ku ji Sultan û dînê wî

---

<sup>232</sup> h.b., r. 173

<sup>233</sup> h.b.

<sup>234</sup> h.b., rr. 295-296

bawer nekin, çi jî bikin dê kirinên wan di defterê de neyên tomarkirin. Saqiyê ku behs dike Dawud e, ji ber ku li gorî kevneşopiya yarsanan yê ku rêberiya gel dike Dawud e, her du ristên ewil dikare bê famkirin ku Nêrgiz Xanim bi peyvên wek "saqî" û "rêge" behsa Dawud dike. Li gorî kelama Nêrgiz Xanim kesê ku ji bo Yar xwe nekuje û xwîn nerijîne, neçe *Cem* û bi qewlê durûst tevnegere ew kes bê dîn û pûtperest e. Her wiha wisa berdewam dike ku kesê ku li *Cemê* erkan negre û neçe ser dînê Sultan Sehak dê kirinên wî di deftera Pîr Mûsî de neyên tomarkirin:

Saqî le Cem bade dida  
Dersî rêgeyî cade dida  
Mirdan hemû li dewrê padişa  
Peyman dîkin gişt temaşa  
Qewmî be min neybî bawer  
Nayêt bo Cemê yariyê yawer  
Her ke bo Yar xoy nekujê  
Xwînî le rey Yar nerêjê  
Her ke lem dîn yeqîn neka  
Bi dil le Cem amîn neka  
Her ke nekerî qewlî durûst  
Bê dîn ew e wek butperest  
Her ke şekî bibî bi dil  
Bawer neke be Şayê adil  
Her ke le Cem negrî erkan  
Be rast negrî dînî Sultan  
Her ke be yar bida azar  
Kirdeyî naçê bo nav tûmar  
Nergiz her ke bîbe kîne

Bêşek qumra we hem bêdîn e<sup>235</sup>

Nêrgiz Xanim jî di kelama xwe de wek Pîr Nazdar Xatûn, behsa her çar şertên yarsaniyê yên "pakî, nastî, nîstî û reda" dike. Her wiha wisa diyar dike ku tu girîngiya bedenê tune ye, lewre çî jî be ew ê bibe ax, lê belê tiştê girîng ruh e û divê wek av pak be. Behsa roja dawî jî dike, li gorî ku di kelama xwe de diyar dike dê roja dawî jî Sultan bê li ser textê xwe rûne:

Yarim fermûy durûskar bin  
Bo rojê duwayî her zûgar bin  
Eger bigrîn bo Şa xas e  
Ras bin rêgey her rê ras e  
Razî diltan mederkînin  
Hergiz nika xwe binvênin  
Le merg û mîr hîç metirsin  
Em raze le giyan bipirsin  
Leş qalib e û her bo xak e  
Giyan egrî û wek av pak e  
Piyav ebê dil le jîn berda  
Em çar çite ebê ser da  
Pakî û rastî û nîstî û reda  
Bikate rêyê em ro û ferda  
Rojî duwayî Heqqe yaran  
Şam dête ser text wek caran<sup>236</sup>

---

<sup>235</sup> h.b., r. 296

<sup>236</sup> h.b., r. 297

Li gorî kevneşopiya yarsanan, Abîdînê Caf kurdekî sunnî bûye û dijminê yarsanan bûye. Şevê di xewna xwe de Sultan Şehak wek Xwedê dibîne. Ji ber vê êdî ji dînê yarsan bawer dike û ev bûyer di "Defterê Abidîn" de bi awayekî hurgûlî tê behskirin. Di vê kelama xwe de jî diyar dike ku ew ê neçe quncikên mizgeftan û ew ê her di xizmeta Sultan de be:

Yaran nazanim çî me

Em ro wek rojan nîme

Xudeyê heft tebeqe zemîn heft asman

We çavî xom dîme

Dî naxwînim siya xetan

Narom bi kuncî mizgewtan

Erom xidmetî Sultan<sup>237</sup>

Wexta ku Abidîn dixwaze bibe yarsan, îmamekî sunnî Abidîn dide ber îşkenceyê ji ber ku ji dîn derketiye. Nêrgiz Xanim li ser vê îşkencê, wî melayî wek bêdîn nîşan dide û dixwaze şûna Abidîn ew bixwe bê kuştin. Heyfa wê bi nûra Abidîn tê û naxwaze ew nûr wenda bibe, wiha jî tîne zimên ku dibêje we ew qas li me xist em ji hemû gunehên xwe xilas bûn û hatin cihê xwe yê niha:

Melayê bêdîn melayê bêdîn

Werin guydin melayê bêdîn

Emin bikujin li ciyê Abidîn

Heyf e lewdin nûr le cebîn

Her wa dibê mûcîzeyê pak

---

<sup>237</sup> D.P.E, rr. 67-68

Ew le Daritan hîç niyetî bak

Hîç namrî nabî helak

Lew dîwane dîdin quwwet

Bûye emiş heye himmet

Darî êwe nayda eziyet

Eşqî Yarî hinde ziyade bû herduzman Yar ustad e

Êwe hinde datan lê man

Ecrû guneh nema peyman

Kirdeyê qedîm hate rêman

Îse hatin bi ser cêman

Her çî leydin her heq dijî

Bakî niye naheq nayjî

Bo çî êwe xwîn dirjînin

Çavtan kûr e Heq navînin

Çwîne kureyê narî heddad

Qal bûyîn bi dar qewmî şeddad

Wexte Şaliyar bibê destgîr

Biçîn bo pêşî Axayê Emîr

Em felaxe derçî le bîr

Dilman pakên bi eşqî Pîr

Dilxweşîman bika le Cem

Bişadî bî em kureyê qem

Zelal bîyen le toz û tem

Bi eşqî Yar biçîn bo Cem

Her çen welaq leydin bi dar

Ziyatir derwa ew be hewar

Zûter dêxin li kolî bar  
Zêter dînî cemalî Yar  
Ême bar min va le kol e  
Şah diyar e weku şole  
Lem qewle diçin bo ew qewle  
Derçin lem cî teft û şore  
Em cê bede tirş û telx e  
Va le Cem da Padişah belx e  
Behrî Ishaq dida delfe  
Êwe cî tan ten û telx e  
Binyam le Cem bade dida  
Saqî bi sef sade dida  
Dersî rêgeyê cade dida  
Bi camî Heq bade dida  
Mirdan le şer dikin haşa  
Duryan dawê le dewrî Şa  
Peyman dikin gişt temaşa  
Qewmî bêdîn hîç namêwe  
Biçîn bo Cem ême buwê  
Wa dizanîn dîman xewê  
Qewmî bi min nebî bawer  
Nîye bo Cem Yarî Yawer  
Layê min wekî to kêy sawar  
Îtir Abidîn medin azar  
Beşî ewiş bi min kin bar  
Ta le axir bibim restigar



Werne biçîn bo Cemî Heq  
Şikat bikên bo Şayî Mutheq  
Giyanitan fena halitan bî şeq  
Ye ber leb û cîfeyê dinya  
Xoy be kuştin qeza dida  
Eme bezmî dînî Heq e  
Dar û zerb e rêgeyê eşq e  
Kuştin bo eşq zor layiq e  
Padişam em xwîniye layiq e  
Her ke bo Yar xoy nekuje  
Kirde li Cem Yar nerêje  
Binyam ricay boy navêje  
Her ke be Şam yeqîn neka  
Bedil li Cem amîn neke  
Mewlam ewe ba dîn nika  
Her ke bibê kifr û kîne  
Be Yar neywê ew yeqîne  
Xarî Cemî Binyamîn e  
Her ke negrê qewlî dirûst  
Bê dîn dibê wek pûtperest  
Mehrûm dibê ew le cennet  
Her ke şikî bibê bi dil  
Bawer nika be Şayê Adil  
Kirdê neqdî dibê batil  
Her ke li Cem negrî erkan  
Be rast negrî dînî Sultan

Axir dibê ew peşîman  
Her ke edeb neyrî bi ca  
Rojî hezar temen bika  
Giştî wek toz her ba diba  
Rojî baqî dîwan bibe  
Binyam saqî pêywan dibe  
Abidîn bo tan zalim bibe  
Binyam qasî hakim bibe  
De'waya alem bibe  
Ba tan ba we şîwên bibe  
Bo Yar dibê kird û kerem  
Şadiyê mirdan Şayê lacerem  
Xaran şeq bî gişt le verem  
Rêge nada Sultan le Cem  
Her ke bi Yar bida azar  
Kirde naçî bi nav tûmar  
Le nav xav da nabî bîdar  
Hiç der naçî li tem û tar  
Qewl her qewlî dînî Yar e  
Mewlam îmdad geyî hejar e  
Ehlî kuffar her kuffar e<sup>238</sup>

Piştî ku Abidîn azad dibe, Nêrgiz Xanim vê kalamê dibêje li ser:

---

<sup>238</sup> D.G.H., rr. 525-528

Abidîn xweş hatî ey rewşeniyê eynim  
Zewq be xulaman derî yawerî du bînim  
E tu bi çwar mamur encax ke bîdar bûy  
Ez bebî mamur bi şewq ku te berî zînim  
Boye le pêşî tu zû hatim bi bêdeng  
Şad bûm bi Cemî mirdan Xacayî koneynim  
Şaliyar le gelim bû ta heynamiye Cem  
Boye Şerîf kerdîwe lêm qapî rastînim  
Dengî nekird le min we hurmetî gird  
Bo kurey Rezbar sur ewe bo têynim<sup>239</sup>

Nêrgiz Xanim di vê kelama xwe de behsa dînen xwe, Kakê Ehmed (ihtimaleke mezin Baba Yadigar e) û Abidîn Caf ên serdema Şah Fezl dike. Tenê yên ku xwedî Zat in dikarin dînen xwe yên berê bînin bîra xwe li gorî yarsanan, yanî her kes nikare bi bîr bîne. Heta ku ew kes nebe Zatdar (xwediyê Zat) nikare dema berê û qalibên xwe yên berê bîne bîra xwe. Nêrgiz Xanim diyar dike ku di wê serdemê de li çengê dida di nav çil kesan de û navê wê Suduq bû. Behsa demeke wisa dike ku bi xwe li çengê dida û Abidîn jî borîjen bû:

Nêrgiz meremû:

Kakê Ehmed Funduq Kakê Ehmed Funduq

Dinya gêj dixwa lem qapî Funduq

Emrê azîz e hel çînîn tabûq<sup>240</sup>

---

<sup>239</sup> *h.b.*, r. 567

Yurte Padişam le şarî Demişq  
Navî Fezîlî bû Şahê Sahib Nutuq  
Çil çengjenî bû ez navim Sunuq  
Kak Abidîn le wey navî bû Menduq  
Teblijenî bû li pêş sipah û tewq  
Etuîş le wey da navit bû Mezruq  
Neqareçî buyt lew gerê nav buq<sup>241</sup>

Nêrgiz meremû:

Kakê Ehmed Barek Kakê Ehmed Barek  
Wusa Padişam bû lew şehri Barek<sup>242</sup>  
Navî Menşûr bû min cîyem xwarek  
Ustad zerger bû sahibi tedarik  
Ez xom qulî bûm navim Mubarek  
Du Heften le lay mewcud bû şarek  
Çiltên ne qeyb da dîkird tebarek  
Etuîş le wey da navit bû Zarek  
Ustad qemiş bû avî bo arek  
Va lê re derçûn gişt le Şuwarek<sup>243</sup>

Şuwarek li başurê Kurdistanê navê gundekî ye û ev gund ji aliyê rejîma Baas ve hatiye talankirin. Wek Şuware jî tê zanîn.<sup>244</sup>

---

<sup>240</sup> "Tabûq" kevneşopiyeye mogolîyan e. Wexta ku yek tê ber Sultan, şewqê xwe derdixe, serê xwe ditewîne û guhê xwe digre, ev tevger wek "tabûq" tê binavkirin. Ji bo zêdetir agahî bnr: <http://parsî.wiki/dekhodaworddetail-8a7b93a3850f4aaabffadb318adffdf9-fa.html>

<sup>241</sup> *D.G.H.*, r. 590

<sup>242</sup> "Barek" erdnîgariyek mîtolojîk e, ne diyar e li ku ye. Dibe ku berê wek bajarek hebû lê niha tune ye.

<sup>243</sup> *D.G.H.*, r. 591

<sup>244</sup> Hejar, *Henbane Borîne, Ferhengî Kurdî Farisî*, Entesaratt: Soruş, Tehran, 1990, r. 475

Nêrgiz Xanim di kelimên xwe de behsa dînen xwe yên cuda dike. Wisa dibêje ku wexta Sultan Sehak di serdemên cuda de zuhûr dikir, ew jî bi navên cuda dijiya. Di hin serdeman de wek firoşkerê deveyan bi navê Çadir<sup>245</sup>, di hin serdeman de jî wek kiryarê şerbikan bi navê Namiq bûye.<sup>246</sup> Armanca vê kiryariya şerbikan jî ev e ku Sultan di wan deman de şeraba rûhanî çêdikir û ew bi xwe jî van şeraban dikirî. Serdemekê wexta ku Sultan li Mehabadê bû, wisa diyar dike ku ew bi xwe jî bi navê Bîdax dijiya.<sup>247</sup> Dibêje wexta ku Padişah li Kabîlê bû, ew bi xwe jî wek dergevanê Padişah bi navê Davîl<sup>248</sup>, wexta ku Padişah li Sudaşê<sup>249</sup> bû bi xwe baxçevanek bi navê Feryaş dijiya.<sup>250</sup> Her wiha dibêje wexta ku Padişah li Çiyayê Kafê, bû bi xwe jî xezînedarekî bi navê Beklaf bû. Wexta ku Padişah li bajarê Dudu<sup>251</sup> bû bi xwe jineke pîr bû bi navê Zîxo.<sup>252</sup> Wexta ku Padişah li Semsûnê bû bi xwe bi navê Zerxûn dijiya.<sup>253</sup> Padişah dema ku li bajarê Pute bû bi xwe xelîfeyek bi navê Cemîl bû.<sup>254</sup> Her wiha dibêje dema ku Padişah li bajarê Lac<sup>255</sup> bû ew bi navê Ecac jiyaye.<sup>256</sup> Ev bajarên ku tene behskirin dibe ku wêran bibin an jî dibe ku ji aliyê rejîma Baasê ve hatibin hilweşandin jî.

### 2.2.11. Xatûn Zer Banû Derziyanî

Li gorî kevneşopiya yarsanan Xatûn Zer Banû di sedsala 16mîn de jiyaye û li gundê Derziyan hatiye dinyayê. Diya Şah Wesqolî ye. Di serdema xwe de hem kelambêj hem jî tenbûrvan bûye.<sup>257</sup>

<sup>245</sup> *D.G.H.*, r. 592

<sup>246</sup> *h.b.*, r. 593

<sup>247</sup> *h.b.*, r. 595

<sup>248</sup> *h.b.*, r. 596

<sup>249</sup> Hejar, *h.b.*, r. 425

<sup>250</sup> *D.G.H.*, r. 597

<sup>251</sup> "Dudu" niha li başûrê Îranê navê gundekî ye. Lê belê bajarê ku tê behskirin heman bajar e an na nayê zanîn. Ji bo zêdetir agahî bnr: <http://parsî.wiki/dekhodaworddetail-9a757f1753794e67bc7e09db0d40489e-fa.html>

<sup>252</sup> *D.G.H.*, r. 599

<sup>253</sup> *h.b.*, r. 600

<sup>254</sup> *h.b.*, r. 601

<sup>255</sup> "Lac" îro li Xorasanê navê bajarekî ye. Ji bo zêdetir agahî bnr:

<http://parsî.wiki/dekhodaworddetail-00c72f2f16f14ac18c21e521ab24da03-fa.html>

<sup>256</sup> *D.G.H.*, r. 602

<sup>257</sup> *D.N.Y.*, rr. 303-304

Li gorî kevneşopiya yarsanan Perdîwer cihê zahirbûna alema veşartî ye ku kes nizanibû li kû ye û Xatûn Zer Banû behsa vê alema veşartî dike:

Gird bîn rizwan gird bîn rizwan  
Karxaneyî Xwacam gird bîn rizwan  
Îd ew suwar in şetiş kird Xezan  
Ne Perdîwer da west ev kuye kes nizan<sup>258</sup>

*(Her kes saf girt*

*Hemû afirîdeyên Xwedê saf girt*

*Niha ew suwar e ku Xezan dîn kir*

*Kes nizane Perdîwer li kû ye)*

### **2.2.12. Semen Xanimê Dewdanî**

Li gorî kevneşopiya yarsanan Semen Xanim di sedsala 16mîn de jiyaye. Yek ji nêzikê Baba Celîlê Dewdanî ye. Li ser jiyana wê tu agahî tune. Tenê ev tişt tê zanîn ku weliyeke serdema Baba Celîl bûye.<sup>259</sup> Çend kelimên Semen Xanimê hene.

Weku tê zanîn duldul hespê Elî ye û zulfîqar jî şûrê wî ye. Semen Xanim di vê kelama xwe de Sultan wek sahibê duldul û zulfîqar nîşan dide û sifata Xwedê ya Cebbar bi kar tîne ji bo wî.

Ya duldul suwar ya duldul suwar

Amanin aman sahibê zulfîqar

We nazê ew wext to şît ne Cebbar

---

<sup>258</sup> *h.b.*, r. 304

<sup>259</sup> *h.b.*, r. 316

Binemane Remzî Baqî aşîkar<sup>260</sup>

*(Ya suwarê duldul  
Amanin aman sahibê zulfîqar  
Sond dixwim bi wê rojê ku tu Cebbar î  
Sirra Baqî eşkere ke)*

Xatûn Zer Banû di vê kelama xwe de Sultan wek hêvî û xwediyê xwe dibîne:

Ewzarit binema ewzarit binema  
Tu omîdê min î ewzarit binema  
Ha fire kes hen kirdiniş tema  
Min kesim niye to menî zema<sup>261</sup>

*(Hêza xwe nîşan de  
Tu hêviya min î hêza xwe nîşan de  
Gelek kes hene ku tema dikin  
Kesekî min tuneye, yê ku li Heq digirim tu yî)*

---

<sup>260</sup> h.b.

<sup>261</sup> h.b.

## ENCAM

Edebiyata kurdî demeke dirêj maye di bin serweriya dewletên dagirker de. Kurd ji her çar dewletan jî zordestiyeke mezin dîtiye, hem ji aliyê zimanê xwe ve, hem jî ji aliyê çanda xwe ve. Ji ber vê, pêşveçûnek xurt pêk nehatiye, heta edebiyata ku saz kirine jî bi demê re zêf bûye. Jixwe ji aliyê edebiyata nivîskî ve kurd pir dereng ketine. Tiştê ku hem edebiyat, hem ziman hem jî çandan li ser piyan hiştiye edebiyata devkî ye. Edebiyata yarsanan, hem ji ber baweriya xwe hem jî ji ber çanda xwe ya veşartî, demeke dirêj bi awayekî devkî hebûna xwe parastiye.

Edebiyata pîroz a yarsanan, yanî kelimên ku ji gotinên kesayetên pîroz ên yarsan pêk hatine, heta sedsala 15mîn bi devkî, nîfş bi nîfş tomar bûye. Di hemû ayînen dînî, cejn û taziyeyan de hatiye xwendin û ev çand hê jî berdewam dike. Li gorî yarsanan, di sedsala 15mîn de, ev edebiyata devkî, ji aliyê nivîsevanê Sultan Sehak ve, yanî ji aliyê Pîr Mûsî ve hatine qeydkirin. Pîr Mûsî kelimên serdema xwe û yên beriya serdema xwe, di defterê de qeyd kirine. Ji ber vê ye ku ev kelam heta roja me hatine.

Wexta ku em vê lêkolînê dikin, em dibînin ku di pêkhatina vê edebiyata pîroz û dînî de jin jî xwedî cihêkî pir taybet in. Lewre jin jî bi awayekî azad kelimên xwe yên pîroz gotine û di ayînan de ji bo kelimên wan cih tê dayîn, bi taybetî cihê Remzbara diya Sultan Sehak pir girîng e li cem yarsanan, heta hê jî li *Cemxaneyan* wek ferîşte cihê wê tê zanîn. Her wiha taybetiyeke din a jinên yarsanî ew e ku, ew jî dikarin wek mêran, di kelimên xwe de behsa mijarên pîroz ên wek bawerî bikin. Ji aliyekî din ve jî heke em lê binêrin, di nav yarsanan de "Pîr"ên jin ên wek Pîr Nazdar jî hene ku rêzek mezin li ber wan tê girtin. Yanî yên ku gihastine mertebeya "Pîr"iyê ne tenê mêr in. Ji ber vê ye ku ji aliyê pîroziyê ve cihê mêr û jinan û kelimên wan wekhev tê dîtin di çanda yarsanan de.

Edebiyata yarsanan ji bo edebiyata kurdî xwedî cihêkî girîng e. Lewre bingeha wê digihîje çend sedsalan û hê jî di ayînan de tê xwendin. Ji aliyê baweriyê ve wateyeke wê ya pir kûr heye, her wiha bi saya vê edebiyatê mirov dikare çand, kevneşopî û baweriya yarsanan fêhm bike. Ji aliyekî ve jî, edebiyata yarsanan xwedî dewlemendiyeke peyv û têgehyan e. Bi saya xebatên li ser çand, bawerî û kelimên



yarsanan, em dikarin peyv û têgehên dînî û felsefî yê wek "dûnadûn", "Cewherê Îlahî", "Cem", "Cemxane" û hwd. têxin kurdiya rojane.

Ji ber vê yekê, armanca me ya vê xebatê ew bû ku em edebiyata yarsanan bi xwendevanên kurmanç bidin nasîn û cihê bidin jinên xwedî kelamên yarsan ku di nav xebatên kurdî de jinên yarsan bi gelemperî nehatine lêkolînkirin. Me cihê da dozdeh jinên xwedî kelam, me hewl da ku kelamên wan ji aliyê mijaran ve rêz bikin û pê re jî me hewl da ku em van kelaman şîrove bikin. Her wiha me dît ku mijara van kelaman ji bawerî, çand, jiyana û civaka yarsanan pêk tê. Ev kelam hem bi awayekî monolog hatine gotin ku hestên xwe, baweriya xwe û girêdana xwe ya li hemberî Xwedê anîne zimên, hem jî bi awayekî diyalog hatine gotin ku cihê dane axaftina xwe ya bi kesên din re.

Ji ber ku armanca me ya pêşîn cihdayîna jinên xwedî kelamên bû, em li ser bîr û baweriya yarsanan jî sekinîn da ku em karibin kelaman bêtir fam bikin. Ji ber vê yekê em di beşa yekemîn de li ser cewherê îlahî, tecellî, dûnadûn, edebiyata pîroz a yarsanan û girîngiya tenbûrê sekinîn. Armanca me ya dayîna girîngiya tenbûrê jî ew bû ku, di nav van jinan de tenbûrvanên girîng jî hene.

Ji bo ku ev bawerî û çanda ku parçeyeke girîng a kurdan e, wenda nebe, divê xebatên kûr û hûr li ser bîr û kirin, bi taybetî jî li ser kelamên pîroz. Ji aliyekî din ve jî, heke ev xebat bîr û kirin, kurdên ku hêza wan ji vê çand û baweriyê tunene, dê karibin parçeyeke din a netewa xwe nas bikin.

## ÇAVKANÎ

### Çavkaniyên Çapnebûyî (Nusxeyên Destxetî)

Defterî Perdîwerî Elîmîr Derwîşî

Kelamê Hezretê Şah Teymûr, amd. Seyîd Mehrdad Muşeseî û Seyîd Daryûş Mîrebeygî

Serencam Beyanul Heq, nusxeyê Qadir Tehmasibî

Xan Elmas, *Dîwân*, Seyîd Xelîl Elînecad

### Çavkaniyên Çapbûyî

Adak, Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Nûbihar, Stenbol, 2013

Attar, Feridüddin, *Mantiku't Tayr, Kuş Dili*, çev. Ayhan Yıldırım, Ataç, 3. Baskı, 2015

Amir-Moezzi, M.A., Jambet. C., *Qu'est-ce que le shî'isme?*, Fayard, 2004

Bois, Thomas, *The Kurds*, Khayats, Beirut, 1966

Boyle, K., Sheen, J. (ed), *Freedom of Religion and Belief, A World Report*, Routledge, London, 1997

van Bruinessen, Martin, *Kürtlük, Türklük, Alevîlik - Etnik ve Dinsel Kimlik Mücadeleleri*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2008

Chaman Ara, Behrooz, *The Kurdish Sâhnâmâ and Its Literary and Religious Implications*, Copyright, Behrooz Chaman Ara, 2015

During, Jean, "Notes Sur L'Angéologie Ahl-e Haqq", dans *Syncretismes et Hérésies Dans l'Orient Seldjoukide et Ottoman (XIVe-XVIIIe Siecles)*, Actes du Colloque du

College de France, octobre 2001, Sous la direction de Gilles Veinstein, Peeters, 2005, Paris

Ergani Madenli Y.C, "Kürtlerde Kadın Meselesi", di *Rojî Kurd* de, İstanbul, 2013

Hamzeh'ee, M. Reza, *Yaresan (Ehl-i Hak)*, çev. Ergin Öpengin, Avesta Yayınları, İstanbul, 2008

- Hansen, Henny Harald, *The Kurdish Woman's Life*, Nationalmuseet-Kobenhavn, 1961
- Hejar, *Henbane Borîne, Ferhengî Kurdî Farisî*, Entesarat: Soruş, Tehran, 1990
- Hoseynî, S. M., *Dîwana Gewre, Entesaratê Bâghê Ney*, Kermansah, 1382/2003
- Jwaideh, Wadie, *The Kurdish Nationalist Movement: Its Origins and Development*, Syracuse University Press, Newyork, 2006
- Kreyenbroek, Philip G., "Religion and Religions in Kurdistan", in *Kurdish Culture and Identity*, edited by, Philip Kreyenbroek&Christine Allison, Zed Books Ltd, London and New Jersey, USA, 1996
- Mackenzie, D.N., *A Concise Pahlavi Dictionary*, Londra, 1970
- Minorsky, Vladimir, "Ahl-i Hakk", *The Encyclopaedia of Islam*, Prepared by a number of leading orientalis, New Edition, Leiden, E.J. Brill, 1986
- Minorsky, Vladimir, "The Sect of the Ahl-i Hakk", in *Iranica, Twenty Articles*, Publication of the University of Tehran, vol. 775, 1964
- Mir-Hosseini, Ziba, "Inner Truth Outer History: The Two Worlds of the Ahl-i Haqq of Kurdistan", in *International Journal of Middle East Studies*, Vol. 26, no. 2, (May, 1994), Cambridge University Press, 2014
- Mir-Hosseini, Ziba, "Redefining the Truth: Ahl-i Haqq and the Islamic Republic of Iran", in *British Journal of Middle Eastern Studies*, Vol. 21, no., 2 (1994), published by: Taylor&Francis, Ltd., 2014
- Mokri, Mohammad, *La Grande Assemblée Des Fidèles de Vérité au tribunal sur le Mont Zagros en Iran (Dawra-y Dîwâna Gawra)*, Livre Sacré et Inédit en Gourani Ancien, Texte Critique, Traduction, Introduction et Commentaires avec des Notes Linguistiques et Glossaire, Etudes d'Hérésiologie Islamique et de Thèmes Mythico-Religieux Iraniens, Librairie Klincksieck, Paris, 1977
- Mokri, Mohammad, *Le Chasseur de Dieu et le mythe du Roi-Aigle (Dawra-y Dâmyârî)*, Otto Harrassowitz, Wiesbaden, 1967
- Mokri, Mohammad, "Le Kalâm Gourani sur Le Cavalier au Coursier Gris, Le Dompteur du Vent", Extrait du *JA*, 1974
- Mokri, Mohammad, *L'idée de l'incarnation chez les Ahl-i Haqq*, Akten Des Vierundzwanzigsten Internationalen Orientalisten-Kongresses, München, 28. August Bis 4. September 1957
- Mokri, Mohammad, "Mythe Historisé de L'Epoque Islamique au Luristan, La Geste du Roi Khôchîn, le Cavalier de la Montagne, Etude d'ethno-lexicologie (deuxieme partie), Extrait du *JA*, Tome 287. 1(1999), Paris, 1995

Moosa, Matti, *Extremist Shiites, The Ghulat Sects*, Syracuse University Press, New York, 1988

Omarkhali, Khanna (Haz), *Kürdistan'da Dini Azınlıklar*, çev. İbrahim Bingöl, Avesta Yayınları, İstanbul, 2014

Pertev, Ramazan (Amd), *Edebiyata Kurdi ya Gelêrî, Dîrok- Teorî- Rêbaz- Lîteratur-Berawirdî-1*, Avesta, İstanbul, 2015

Safîzadeh, S., *Daneşnameyê Namaveranê Yarsan, Ehval ve Asarê Meşahîr, Tarîx, Ketab ha ve Estelahaê Erfanî*, Entesaratê Hîrmand, Tehran, 1376/1997

Safîzadeh, Sedîq, *Nameyê Serencam*, Entesarat Hîrmand, Tehran, 1996

Sinanoğlu, Mustafa, "Tecellî", *İslam Ansiklopedisi*, cilt. 40, 2011

Şoşîkî, Mela Muhammedê, *Tefsîra Qur'anê Nûra Qelban-2*, Mela Muhammedê Bêrkevanî (Amd.), Çapa Yekem, Nûbihar, Stenbol, 2011

Tahirî, Teyyîb, *Tarîx ve Felsefeyê Serencam*, Dezgayê Tojînewe û Belavkirdinewey Mukriyanî, Hewlêr, 2009

Vali, Shahab, "La littérature religieuse des Kurdes Yarsan", dans *Etudes Kurdes no 11: La Littérature Kurde*, Ed. Harmattan, Paris, mars 2012

Vali, Shahab, *Les Yârsâns, Aspects Mythologiques- Aspects Doctrinaux*, Editions universitaires européens, Saarbrücken, 2011

Vali, Shahab, "Yarsan ve Yezidi Kürtlerin Yazılı Edebiyatı" *Kürt Tarihi*, sayı 11, Şubat-Mart 2014

### **Çavkaniyên Dîjîtal**

<http://www.larousse.fr/dictionnaires/francais/th%C3%A9ophanie/77722>

<http://parsî.wîkî/dehkhodaworddetail-8a7b93a3850f4aaabffadb318adffdf9-fa.html>

<http://www.iranica.com/newsite>



T.C.  
Mardin Artuklu Üniversitesi  
Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü  
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans

## **YARSAN EDEBİYATINDA KADIN ŞAİRLER**

Sevda ORAK REŞİTOĞLU  
13711014

Danışman  
Yrd. Doç. Shahab VALI

Mardin 2016